



## **NAVEROK**

### **Sernivîsar**

Bi berhemên nû û kevnar, r. 2

### **Husein Muhammed**

Rengdêr û bikaranîna wan, r. 3

### **Ferhenga zaravên teknîkî**

bi kurdî – tirkî – inglîzî, r. 18

### **Elî Şahmuhemmedî**

Gorrîn û qirtandin le zaraway kurdîy kirmaşanî, r. 20

### **Seîd Veroj**

Vacêkerdena zazakî û kurmancî, r. 23

### **Nasandin**

Ferhengeke kurdî ji sala 1884, r. 51

### **Ziman û cins**

Cinsê rêzimanî, r. 53

### **Cemal Nebez**

Birakujîy zimanî, r. 64

### **Deham Ebdulfettah**

Lêker di zimanê kurdî de, r. 72

### **Tesîra lerzê**

li ser guherîna deng, r. 124

### **Mehmet Şerif Derince & Ergin Opendin**

Background information on Kurdish, r. 131

### **Zarname**

Ferhengoka zimannasî, r. 144

### **Em wiha dinivîsin**

Kurterêbera rastnivîsînê, r. 162

## Sernivîsar

### Bi berhemên nû û yên kevnar

Kerem bikin dîsa hejmareke nû ji kovara zimanê kurdî Kanîzarê, xwandevevanên hêja. Di vê hejmarê de em çendîn berhemên nû û çend vekolînên li ser zimanê kurdî bi kurmancî, soranî, zazakî û inglîzî pêşkêşî we yên hêja dikin.

Di vê hejmarê de em dest bi belavkirina vekolîna **Husein Muhammedî** ya li ser rengdêrên (sifet, adjective) kurdî û bikaranîna wan dikin. Ev vekolîn dê di hejmarên bê de jî berdewam be. Nivîsarên wî yên din di hejmarê de li ser cinsê rêzimanî (mê û nêr) û tesîra lertzê li ser guherîna dengên in.

Rêzevekolîna me ya din ji **Deham Ebdulfettah** e û xebata wî ya dûr û dirêj ya li ser lêkerên (fiil, verb) kurdî ye. Ev vekolîn jî dê di hejmarên bê de jî bidome.

Vekolîna me ya dirêj ya bi zazakî nivîsara **Seîd Verojî** ya li ser berhevdan anku miqayesekirina zimannasî ya navbera kurmancî û zazakî ye.

Bi soranî **Cemal Nebez** li ser "birakujiya zimanî" anku neheqîkirina li lehceyên din yên kurdî dinivîse. Nivîsara din ya bi soranî derbarê guherîn û ketina dengên di kurdiya kirmaşanî de ye û ji kekê me yê hêja **Elî Şahmuhemedî** ye.

Bi inglîzî **Mehmet Şerif Derince** û **Ergin Opengin** agahiyên bingehîn li ser kurdî (bi taybetî kurmancî) pêşkêşî dikin û berhemên girîng bo hînbûna kurmancî û vekolînên zimanê kurdî rêz dikin.

Di vê hejmarê de jî em du kitêban – yeke nû û yeke kevn – didin nasîn. Yek jê *Ferhenga Zaravên Teknîkî* ya bi kurdî – tirkî – inglîzî ye. Ya din jî ferhengokeke kurdî ya ji sala 1884 e. Em van herdu berheman bi temamî belav dikin û dixin xizmeta xwandevevanên xwe û vekolînên li ser zimanê kurdî.

Kerem bikin kovara xwe bixwînin û bo me binivîsin:

[kovarakanizar@gmail.com](mailto:kovarakanizar@gmail.com)

# RENGDÊR Û BIKARANÎNA WAN

**Husein Muhammed**

## 1. MIJAR Û PEYVNASIYA WÊ

Di zimannasî û rêzimanê de **rengdêr** (sifet, hevalnav, bi inglîzî *adjective*) ew peyv in ku behsa çawaniya kesekî, tişteki yan rewşekê dikin. Bo nimûne (rengdêr hatiye *xwehkirin*):

- hevalên *baş*.
- Îro hewa *sar* e.
- Birayê *biçûk* û yê *mezin*.
- Ew *binamûs* e lê ev *bênamûs* e.
- Tu ji wî *mezintir* î.
- Gelo *dirêjtirîn* çemê dinyayê kîjan e?

Wek navê xwe, rengdêr "rengêkî" yan "rengan" didin kesan, tiştan an rewşan. Li vê derê mebest ji peyva "reng" berfireh e: rewş, şikil, awa, şêwe...

Rengdêr çawaniya navdêran diyar dikin anku rengdêr navdêran *rave dikin*. Loma di rêzimanê de rengdêr **ravekerên** (bi inglîzî *modifier*) navdêran in û navdêr jî **raveberên** (*modified*) rengdêran in anku bi rengdêran tên ravekirin.

Piraniya rengdêran **berhevbar** anku *miqayesebar* (bi inglîzî *comparable*) in yanî bi wan navdêr dikarin bîn **berhevdan** anku *miqayesekirin* (*comparison, comparing*). Mebest ji berhevdanê ew e ku mirov dikare bibêje ku çawaniya tişteki ji ya tişteki din bihêztir e, xurttir e, mezintir e û hwd. Bo nimûne, "ev kitêb ji wê kitêbê *xweştir* e" yan "ev *xweştirîn* kitêb e."

## 2. BIRREKE SERBIXWE YAN BEŞEK JI NAVDÊRAN?

Gelo rengdêr birreke an komeke peyvan ya serbixwe ye yan jî beşek ji birreke din ya peyvan e?

Wek navdêran, rengdêr komeke vekirî ya peyvan pêk tînin. Mebest ji "koma vekirî" ew e ku rengdêrên nû bi hêsanî li vê komê zêde dibin. Zêdebûn dikare bi peyvsaziyê be anku peyvên nû bîn çêkirin. Lê zêdebûn herwiha dikare bi wergirtina peyvan ji zimanên din be. Em ê li van herdu awayên zêdebûna rengdêran di beşa rengdêrsaziyê de kûr bibin.

Li aliyekî din, rengdêr bi çendîn awayan ji navdêran cuda ne. Hinek ji van cudahiyan di hemû ziman û zaravayan de, hinek jî tenê di hinek ziman an zaravayan de diyar dibin. Li vê derê, em ê van cudahiyan li gor kurmancî diyar bikin. Di beşên din de em ê cudahiya navbera ziman û zaravayan di vê meseleyê de behs bikin.

### 2.1. Wateya rengdêran rêjeyî, dilînî yan berfireh e

Cudahiya serekî ya navbera navdêr û rengdêran de di hemû zimanan de watenasî ye anku cudahiyên wate û maneya peyvên navdêr û ya peyvên rengdêr e.

Bo nimûne, kerem bikin em peyva "sêv" ya navdêr û peyva "xweş" ya rengdêr bidin ber hev. Mirov dikare bi ihtimaleke pir mezin bi objektîvî û bêyî dudilî bibêje ka filan fêkî anku mêwe sêv e yan na. Lê mirov nikare bi objektîvî bibêje ku filan tişt xweş e yan ne. Herdem dê hin kes hebin ku heta ji tiştên herî xweş re bibêjin ku ev tişt ne xweş e. Mirov dikare bi objektîvî bibêje filan fêkî "sêv" e yan ne sêv e lê ne mimkin e mirov her kesî qanî bike ku ew "xweş" e.

Anku maneya sêva navdêrê sabit e lê peyva xweş ya rengdêr tiştêkî dilînî yan keyfî diyar dike.

Li aliyekî din, mirov dikare peyva "sêv" ya navdêr – wek piraniya peyvên navdêr – bo tenê hejmareke bisinor ya tiştên ji hev cuda bi kar bîne. Anku amajeya navdêran bi piranî berteng e. Lê mirov dikare bi peyva "xweş" ya rengdêr amaje bi gelek tiştên pir ji hev cuda bike: ne tenê sêv lê herwiha xox û pirteqal, şîv û firavîn, stran û helbest, kitêb û kompûter, şev û roj û bi hezaran tiştên din jî xweş bin.

Bi gotineke din, wateya rengdêran bi piranî gelek berfireh e.

Wateya rengdêran ne tenê berfireh û dilînî ye lê herwiha rêjeyî anku nisbî ye jî. Bo nimûne, em bi objektîvî bêguman dizanin ku "50 sentîmetre" ji "30 sentîmetre" dirêjtir e. Lê dîsa jî eger em li nav daristanê dareke şên ya 50-sentîmetreyî bibînin, em ê bibêjin ew dareke "kurt" e lê eger em qelemekî 30-sentîmetreyî bibînin, em ê bibêjin ku ew qelemekî "dirêj" e.

Bi gotineke din, peyvên "dirêj" û "kurt" ne sabit in lê rêjeyî û nisbî ne. Tiştêk di nav hevçûreyên xwe de "kurt" be û bi vê rengdêrê were nasîn tevî ku ew gelek ji tiştên ji cûreyeke din dirêjtir be.

## 2.2. Rengdêr bêcins in

Di kurmancî û gelek zimanên din de jî – lê ne di hemû zimanan de û ne di hemû lehceyên kurdî de jî – navdêran du yan zêdetir cinsên (zayendên) rêzimanî hene. Bo nimûne, di kurmancî, erebî û fransî de du cinsên rêzimanî hene: nêr û mê. Di almanî, rûsî û avestayî de sê cinsên rêzimanî hene/hebûn: nêr, mê û nêtar/notr.

Bo nimûne, ji navdêran peyva "av" di kurmancî de mê ye û peyva "agir" nêr e. Peyva "av" di kurmancî de herdem mê ye û ti caran nabe nêr. Peyva "agir" jî dîsa di kurmancî de herdem nêr e û ti caran wek mê nayê xebitandin (ji bilî şaşîkirinê ji aliyê hin kesan ve).

Berevajî navdêran, rengdêran ti cinsê rêzimanî yê sabit nîne. Bo nimûne, "biçûk, mezin, kurt, dirêj, nizm, bilind" bi xwe ne mê yan jî nêr in.

Di kurmancî û gelek zimanên din de jî (bo nimûne di inglîzî û tirkî de) heman forma rengdêran dikare li gel nêr û mêyan û yekhejmar û pirhejmaran were bikaranîn. Bo nimûne:

- kurê baş (nêr, yekhejmar)



- keça baş (mê, yekhejmar)
- kurên baş, keçên baş (pirhejmar)

Di hin zimanan û zaravayan de (bo nimûne di zazakî, erebî û fransî de) formên cuda yên rengdêran li gel cins û hejmarên rêzimanî yên cuda tên bikaranîn. Bo nimûne, di zazakî de sê formên rengdêran hene (nêr, mê, pirhejmar) û di fransî de çar (yekhejmara nêr, yekhejmara mê, pirhejmara nêr û pirhejmara mê). Em li nimûneyan binêrin:

Zazakî:<sup>1</sup>

- nêr: daro *derg* (darê *dirêj*)
- mê: dara *derge* (dara *dirêj*)
- pirhejmar: darê *dergî* (darên *dirêj*)

Fransî:

- yekhejmara nêr: *bon fils* (kurê *baş*)
- yekhejmara mê: *bonne fille* (keça *baş*)
- pirhejmara nêr: *bons fils* (kurên *baş*)
- pirhejmara mê: *bonnes filles* (keçên *baş*)

Lê dîsa jî hevwatera "dirêj" bi zazakî yan jî hevwatera "baş" bi fransî bi xwe ne nêr an mê ne. Wan tenê formên cuda bo bikaranîna li gel navdêrên bi cins û hejmarên rêzimanî yên cuda hene.

### 2.3. Rengdêr di kurmancî de naçemin

Cudahiyêke din jî ya bingehîn di navbera rengdêr û navdêran û rengdêr û cînavan de jî ew e ku navdêr û cînav di rewşa ravekeriyê de adeten diçemin anku ditewin lê rengdêr naçemin. Bo nimûne:

- mal + ez → mala min (ne "mala ez")
- mal + Gulistan → mala Gulistanê

---

Nimûne ji Roşan Lezgîn *Gramera Kirdkî (Zazakî)*, r. 62.1

- mal + Osman → mala Osmanî / Osmên

Lê rengdêr her wek xwe dimîne anku naçemin:

- mal + xweş → mala xweş (ne "mala xweşê / xweşî")<sup>2</sup>
- bar + giran → barê giran (ne "barê giranê / giranê")

Meseleya çemîn an neçemîna rengdêran di lehceyên din yê kurdî de, bo nimûne di soranî û zazakî de, dê dûv re di berhevdana cudahiyên bikaranîna rengdêran di zaravayên kurdî de were behskirin.

## 2.4. Rengdêr tên berhevdan

Di kurdî û piraniya zimanên din de jî rengdêr dikarin bên berhevdan anku miqayesekirin. Di kurdî de ew bi piranî bi paşgirên "-tir" û "-tirîn" tên berhevdan. Bo nimûne:

- mezin → mezintir → mezintirîn
- geş → geştir → geştirîn

Lê navdêr, lêker, cînav, hejmar û hwd. wiha nayên berhevdan.<sup>3</sup>

---

Di frazên wek "mala ciwanê" de nayê wê maneyê ku rengdêr diçeme lê di nimûneyên wiha de pêşî rengdêr bi 2 guhastinê (*conversion*) bûye navdêr û paşî çemiyaye. Dûv re em ê behsa guhastinê di navbera rengdêr û navdêran de bikin.

Hin navdêr jî dikarin wiha bên berhevdan eger ew wek rengdêran bên bikaranîn, bo nimûne "ker → kertir, kertirîn" 3 bi maneya "bêaqil, bêhiş".

### 3. RENG DÊRÊN ME ÇAWAN IN Û ÇAWA ÇÊBÛNE?

Rengdêrên kurdî hinek jê peyvên xwerû ne, hinek dariştî ne (bi peyveke xwerû li gel pêşgir an paşgirekê) û hinek jê pêkhatî ne (ji du yan çend peyvên her yek serbixwe). Hinek jî di bingeh de navdêr in lê wek rengdêr tên bikaranîn.

Li vê derê em ê her yekê ji van cûrên rengdêran bi kurtî bidin nasîn.

#### 3.1. Rengdêrên xwerû

Mebest ji rengdêrên xwerû li vê derê ew rengdêr in ku mirov nikare êdî ti parçeyekê jê veke bêyî ku ew bibe peyveke bêwate yan jî peyveke ku di rastiyê de ti têkilî bi wê rengdêrê ve nîne.

Rengdêrên xwerû yên ku di kurdî de tên biakranîn bi piranî yekkîteyî ne lê herwiha rengdêrên xwerû yên dukîteyî jî di kurdî de peyda dibin. Bo nimûne:

- yekkîteyî: kurt, qenc, baş, sist...
- dukîteyî: dirêj, zîrek, mezin...

Kurttirîn rengdêrên xwerû yên yekkîteyî dudengî yan duherfî ne, bo nimûne:

- nû, çê, zû<sup>4</sup>...

Dirêjtirîn rengdêrên xwerû yên yekkîteyî şeşdengî yan şeşherfî ne, bo nimûne:

- bilind, dereng/direng, qalind...

---

<sup>4</sup>"Zû" bi piranî wek hoker (adverb, zêrf) tê bikaranîn lê dîsa wek rengdêr jî li kar e, bo nimûne "niha zû ye".<sup>4</sup>



Lê piraniya rengdêrên kurdî yên xwerû sêdengî/sêherfî û çarherfî ne.

Hinek ji rengdêrên ku niha xwerû tên hesabandin, tarîxiyên ne xwerû lê dariştî bûn, bo nimûne:

- "zîr-ek" (bidin ber rengdêra "jîr" û paşgira "-ek" wek di "wêr-ek, pars-ek..." de)
- "zeng-în" (bidin ber rengdêrên "reng-în, şîr-în, agir-în"...)
- "mez-in" (bidin ber forma "mes-tir")
- "bil-ind" (bidin ber "bala")

Ji aliyê etîmolojî ve rengdêrên kurdî yên xwerû ji rehên cuda-cuda hatine:s

Etîmolojiya hinek rengdêrên me yên xwerû digihe makezimanê proto-hindûewropî, bo nimûne:

- dirêj, kurt, mezin, teng...

Rehê hinek rengdêrên me yên di di zimanên din jî yên îranî de heye anku ew peyvên îranî ne, bo nimûne:

- azad, sist, xweş...

Hinek ji erebî hatine wergirtin, bo nimûne:

- bedew, kal, xirab...

Hinek ji tirkî hatine, bo nimûne:

- belî, genc, qalind, qenc, qilêr...

Hinek jî vê dawiyê ji zimanên cuda-cuda yên ewropî hatine, bo nimûne:

- sûper, normal, barbar, notir, nazî, faşî(st)...<sup>6</sup>

---

Bo etîmolojiya her nimûneya li vê derê hatî dan, binêrin *Rehnas – ferhenga etîmolojî ya kurdî*: 5

<https://zimannas.wordpress.com/2016/11/02/3073/>

Hinek ji van peyvên (bo nimûne "norm-al, bar-bar") di zimanê jêder de ne xwerû ne lê di kurdî û zimanên din yên <sup>6</sup> wergir de ew êdî bûne peyvên xwerû.

### 3.2. Rengdêrên dariştî

Mebest ji rengdêrên dariştî ew rengdêr in ku bi alîkariya gireyan (pêşgiran an paşgiran) ji hin peyvên din hatine çêkirin. Bo nimûne:

- bêav (bê+av)
- bîaqil (bî+aqil)
- hişyar (hiş+yar)

Pêşgirên rengdêrsaz yê serekî ev in:

- bê-: bêxwê, bêkes, bêmal, bêdidan, bênav...
- bi-: bihêvî, binamûs, bicuret, bişeref...
- ne-: nexweş, nenas, nedîtî...

Paşgirên serekî jî yê rengdêrsaziyê ev in:<sup>7</sup>

- -î: avî, axî, gundî, kurdî...<sup>8</sup>
- -dar: birîndar, çekdar, hêvîdar...
- -în: agirîn, şîrîn...
- -ok: tirsok, livok, hejhejok...
- -ane: mehane, rojane, salane...

Pêşgir û paşgirên xwemalî hem dikarin peyvên bi eslê xwe xwemalî û hem jî peyvên bi eslê xwe biyanî bigirin. Lê paşgirên biyanî (bi taybetî yê ji zimanên ewropî, wek -al, -îk) tenê li gel peyvên biyanî tên bikaranîn:

- normal, notral / neutral (ji norm+al, notr+al)
- otonomatîk, demokratîk (ji otomat+îk, demokrat+îk)

---

Bo hemû pêşgir û paşgirên rengdêrsaz binêrin: *Husein Muhammed: Peyvsazî di zimanê kurdî de* <sup>7</sup>  
<https://zimannas.files.wordpress.com/2016/08/peyvsazi-kiteb1.pdf>

<sup>8</sup>"Gundî, kurdî" û peyvên wisa di eslê xwe de rengdêr in lê herwiha wek navdêr jî tên bikaranîn.

Hin ji rengdêran niha wek rengdêrên xwerû tèn hesibandin lê bi eslê xwe rengdêrên dariştî ne. Bo nimûne:

- şîrîn (bi eslê xwe ji "şîr+în" lê têkiliya "şîrîn" ji peyva "şîr" veqetiye û êdî "şîrîn" wek peyveke ne ji "şîr" çêbûyî tê fehmkirin)
- mezin (ji "mez-in", bidin ber "mes-tir" ji "mez+tir")

### 3.3. Rengdêrên pêkhatî

Mebest ji rengdêrên pêkhatî ew rengdêr in ku ji du yan çend peyvên serbixwe pêk tèn anku ew peyvên serbixwe digihin hev û dibin rengdêrek. Bo nimûne:

- serbilind (ser+bilind)
- dilbixwîn (dil+bi+xwîn)
- giregir (gir+e+gir)

### 3.4. Navdêrên rengdêrkirî

Hin peyv bi eslê xwe navdêr in û maneya wan ya bingehîn niha jî navdêr e lê ew carinan bi mecazî wek rengdêr tèn bikaranîn. Bi taybetî navên hin heywanan wek rengdêr tê xebitandin.<sup>9</sup> Bo nimûne:

- ker (bi wateya "bêaqil, bêhiş, nezan")
- şêr (bi maneya "wêrek" yan "zîrek")

Hin peyvên ku di kurdî de rengdêr in, ji erebî yan zimanekî din hatine wergirtin û di wan zimanan de ne rengdêr lê navdêr in. Bo nimûne, peyva "xirab" yan "xerab" di kurdî de rengdêr e û wateya

---

Bo bikaranîna navên heywanan bi mecazî, binêrin: <https://zimannas.wordpress.com/2016/04/07/heywan-bi-9-mecazi/>

"nebaş" dide. Ew bi eslê xwe ji erebî "xerab" e ku di erebî de ne rengdêr e lê navdêr e û wateya "wêranî, kaviî, xirabbûn, herifîn, hilweşîn, ruxîn" dide.

## 4. Berhevdana rengdêran

Mebest ji "berhevdana rengdêran" (an "miqayesekirina rengdêran") an jî hê deqîqtir "pileyên berhevdana rengdêran" (dereceyên miqayesekirina rengdêran) ew e ku heman çawaniya du yan zêdetir tiştan an kesan tê berhevdan. Bo nimûne:

- Hesp ji keran mezintir in.

Di nimûneya me "mezinahiya" hesp û keran hatiye berhevdan û hatiye diyarkirina ku mezinahiya hespan ji mezinahiya keran zêdetir e.

Di kurdî de sê pileyên anku dereceyên rengdêran hene: pileya sade, pileya berhevder û pileya jorîn.

### 4.1. Pileya sade ya rengdêran

Mebest ji pileya sade ya rengdêran rengdêr bi forma xwe ya sade ne. Di bikaranîna wan de çawaniya yek yan zêdetir tiştan tê diyarkirin bêyî ku ew heman çawanî di navbera du tiştan de were berhevdan. Bo nimûne:

- kitêba *kevn*
- guldanka *şîn* ya li ser maseyê
- Ev sêv *geş* in.
- Ez bi te *serbilind* im.

Wek ku tê dîtin, rengdêr bi şiklê xwe yê ferhengî ne û ti pêşgir an paşgir pê ve nînin.

#### 4.2. Pileya berhevder ya rengdêran

Pileya berhevder an miqayeseker (komparatîv) ew rewşa rengdêran e ku pê berhevdan di navbera eynî taybetmendiya yan çawaniya du yan zêdetir tiştan an kesan de tê kirin. Bo nimûne:

- Tu ji wî *dirêjtir* î.
- Zebeş ji sêvan xwe *mezintir* e.

Wek ku tê dîtin, rengdêr paşgira "-tir" werdigirin. Herwiha hêjayî gotinê ye ku tiştên an kesên tîn berhevdan bi daçeka "ji" ji hev tîn veqetandin û tiştên yan kesên yekem neçemandî ne (di nimûneyên me de "tu" û "zebeş") lê yên duyem çemandî anku tewandî ne (di nimûneyên me de "wî" û "sêvan").

Paşgira "-tir" bi eslê xwe kurdî ye û hevrehê wê di soranî de "-tir", di farisî de "-ter" û di zazakî de "-êr" e (bi guherîna "\*-ter → \*-der → \*-yer → -êr).

Ji bilî paşgira "-tir", di kurmançî de (û herwiha di zazakî de jî) bo avakirina pileya berhevder yan rengdêran li gelek deveran li şûna paşgira "-tir" peyvika "**deha**" (carinan "diha" yan "daha") tê bikaranîn:

- deha mezin (mezintir, hê mezintir)
- deha biçûk (biçûktir, hê jî biçûktir)

Ev "deha" û varyantên wê "daha, diha" bi eslê xwe ji tirkî "daha" ne. Ev bikaranîn bi taybetî li Bakurê Kurdistanê berbelav e lê li hin deverên Rojavaya Kurdistanê jî heye û di axiftina kurdên Kafkasyayê de jî tê bihîstin. Ev jî nîşana wê yekê ye ku bikaranîna vê peyvikê ne vê dawiyê lê ji mêj ve ji tirkî derbazî kurmançî û zazakî bûye. Lê bikaranîna wê negihîştîye Başûr û Rojhilata Kurdistanê.

Pileya berhevder ya rengdêran dikare herwiha dikare bi yek ji van hokeran jî were xurttirkirin:

- hê: Ev hê ji wê mezintir e / Ev ji wê hê mezintir e.
- hê jî: Ev hê jî ji wê mezintir e / Ev ji wê hê jî mezintir e.
- hêj: Ev hê jî ji wê mezintir e / Ev ji wê hê jî mezintir e.

- hêšta: Ev hêšta ji wê mezintir e / Ev ji wê hêšta mezintir e.<sup>10</sup>
- hîn: Ev hîn ji wê mezintir e / Ev ji wê hîn mezintir e.
- hîn jî: Ev hîn jî ji wê mezintir e / Ev ji wê hîn jî mezintir e.
- hîna: Ev hîna ji wê mezintir e / Ev ji wê hîna mezintir e.
- hîna jî: Ev hîn jî ji wê mezintir e / Ev ji wê hîna jî mezintir e.

Adeten di pileya berhevdanê ya rengdêran de ji bilî zêdebûna paşgira "-tir" (yan peyvika "deha" û varyantên wê) ti guherîn di forma sade ya rengdêrê de peyda nabin anku tenê paşgira "-tir" yan peyvika "deha" lê zêde dibe. Bo nimûne:

- xweş → xweştir
- spî → spîtir
- kevn → kevtir

Di zimanê nivîskî de bi piranî ti guherandinên din li rengdêrê nayên kirin. Lê di axiftinê de – û carinan di hin nivîsan de jî – eger rehê rengdêrê bi D yan T bi dawî were, hingê D yan T-ya rengdêra sade cihê xwe dide T-ya paşgira "-tir". Bo nimûne:

- bilind+tir → bilintir
- xurt+tir → xurttir
- (bi soranî): ziyad (zêde) + tir → ziyatir (zêdetir)

Lê di zimanê nivîskî de adeten herdu T yan jî D û T tîr parastin û tercîhkirin. Bo nimûne:

- bilind+tir → bilindtir
- xurt+tir → xurttir

Lê di soranî de forma standard ji "ziyad+tir" varyanta "ziyatir" e, ne "ziyadtir".

Rengdêra "mezin" du formên pileya berhevder hene:

- mezintir
- mestir

Ji van herduyan "mezintir" zêdetir di zimanê nivîskî de û "mestir" jî di zimanê devkî de tê xebitandin lê herdu jî di herdu awayên zimanî de li kar in. S-ya peyva "mestir" ji ber tesîra dengê T ye ji ber ku

---

<sup>10</sup>"Hêšta" li hin deverên kurmanciya rojhilatî tê bikaranîn, bi taybetî li Dihokê.



di kurdî de adeten komdengê ST heye û ZT tine ye (bo nimûne "bîst, dest, mist, dost...", ne "\*bîzt, \*dezt, \*mizt, \*dozt...").

Rengdêra pileya berhevder "pêtir" û varyantên wê "bêtir, bêhtir, bihtir, pêhtir, pitir..." di kurdî de pileya xwe ya sade nîne yan jî winda kiriye. Carinan ew bi rengdêra / hokera "pirr" (gelek, zehf) ve tê girêdan lê ji aliyê etîmolojî ve ne ji wê peyda bûye.

Rengdêra pileya berhevder "çêtir" di piraniya devokên kurmancî de wek hevwatera "baştir, qenctir, rindtir" peyda dibe. Forma wê ya pileya sade "çê" di hin devokan de heye (bi taybetî di devokên kurmanciya navendî de) lê di hin devokan de jî nîne yan nemaye (xaseten di kurmanciya rojhilatî de) tevî ku forma "çêtir" di van devokan de jî tê bikaranîn.

#### 4.3. Pileya jorîn ya rengdêran

Bi pileya jorîn ya rengdêran (superlatîv) mirov diyar dike ku tiştek di taybemendiyeke yan çawaniyeke xwe de di ser hemû tiştên din re ye.

Di kurmancî de superlatîv bi çend awayên ji hev cuda tê diyarkirin:

- bi paşgira "-tirîn"
- bi qalibê "ji hemûyan ...tir"
- bi hokera "herî"
- bi hokera "tewr"
- bi hokera "en"
- bi çend rengdêrên ji erebî

##### **Bi paşgira "-tirîn"**

Paşgira "-tirîn" yekser dikeve pey forma sade ya rengdêran û wan dike pileya jorîn:

- xweş → xweştirîn (ji hemûyan xweştir)
- bilindtirîn (ji hemûyan bilindtir)
- biçûktirîn (ji hemûyan biçûktir)

Bo nimûne:

- xweştirîn kitêb / kitêba xweştirîn
- bilindtirîn avahî / avahiyê bilindtirîn
- biçûktirîn mal / mala biçûktirîn

Wek ku tê dîtîn, rengdêr di forma xwe ya pileya jorîn de dikare bikeve berî navdêran (bo nimûne "bilindtirîn avahî") yan jî dûv navdêran (wek mînak "avahiyê bilindtirîn"). Di pileyên din yê rengdêran de di kurdî de rengdêr adeten dikevin dûv navdêran, bo nimûne "avahiyê bilind" (ne "\*bilind avahî") û "avahiyê bilindtir" (ne "\*bilindtir avahî").

### **Bi qalibê "ji hemûyan ...tir"**

Di kurmanciya devkî de berbelavtirîn forma pileya jorîn ya rengdêran bi peyvên "ji hemûyan" û pileya berhevder ya rengdêran e:

- ji hemûyan mezintir (= mezintirîn)
- ji hemûyan bilindtir (= bilindtirîn)
- ji hemûyan biçûktir (= biçûktirîn)

Qalibê "ji hemûyan ...tir" dikeve dûv navdêrên ku rave dike:

- avahiyê ji hemûyan bilindtir (ne "\*ji hemûyan bilindtir avahî")
- mala ji hemûyan biçûktir (ne "\*ji hemûyan biçûktir mal")

Li şûna "ji hemûyan" dikare "ji hemû" + navdêrek an çend navdêr hebin. Bo nimûne:

- avahiyê ji hemû avahiyên mezintir
- mala ji hemû mal û xaniyên din biçûktir

Eger li şûna navdêran, cînavêk an çend cînavêk an çend cînav hebin, hingê ew dikevin dûv "ji" lê berî "hemûyan". Bo nimûne:

- ew ji me hemûyan mezintir e
- ez ji we û wan hemûyan kurttir im

### **Bi hokera "herî" yan "here"**

Pileya superlatîv ya rengdêran herwiha bi hokera "herî" (yan bi varyanta wê "here", pir kêr "helî" yan "hele") jî tê çêkirin. "Herî" yan varyanteke wê dikeve pêş rengdêra bi forma sade û wisa pileya jorîn ya rengdêran tê sazîkirin. Bo nimûne:

- herî baş (baştirîn, ji hemûyan baştir)
- herî xirab (xirabtirîn, ji hemûyan xirabtir)
- herî xweş (xweştirîn, ji hemûyan xweştir)

Pileya jorîn ya rengdêran ya wiha avakirî herdem dikeve dûr navdêrê ku rave dike. Bo nimûne:

- kitêba herî xweş (ne "\*herî xweş kitêb")
- mirovên herî baş (ne "\*herî baş mirov")
- avahiyên herî bilind (ne "\*herî bilind avahî")

### **Bi hokera "tewr"**

Li hin deverên nêzîkî zazakî, di kurmançî de jî wek di zazakî de hokera "tewr" bo çêkirina pileya jorîn ya rengdêran tê xebitandin. Bo nimûne:

- kitêba tewr rind (baştirîn kitêb, kitêba herî baş, kitêba ji hemûyan baştir)
- merivên tewr qenc (qenctirîn mirov, mirovên herî qenc, mirovên ji hemûyan qenctir)

### **Bi hokera "en"**

Li hin deverên Bakurê Kurdistanê li şûna paşgira "-tirîn" yan hokera "herî" (here) peyvika "en" ya ji tirkî wergirtî bo çêkirina superlatîviya rengdêran tê gotin. Bo nimûne:

- kitêba en baş (baştirîn kitêb, kitêba herî baş, kitêba ji hemûyan baştir)
- merivên en qenc (qenctirîn mirov, mirovên herî qenc, mirovên ji hemûyan qenctir)

### **Bi hin rengdêrên ji erebî**

Bi taybetî li Başûrê Kurdistanê çend rengdêrên ji erebî wergirtî bi forma xwe ya superlatîv tîn bikaranîn. Yê herî berbelav "ekber" (mezintirîn) û "ehsen" (baştirîn) in:

- Ew ekber şeytan e. (Ew şeytanê herî mezin e / Ew mezintirîn şeytan e.)
- Ew ehzen mirov e. (Ew baştirîn mirov e / Ew mirovê herî baş e.)

**Dê bidome.**

## ferhengeke kurdî-tirkî-inglîzî

### FERHENGA ZARAVÊN TEKNÎKÎ



*Ferhenga zaravên teknîkî* ferhengeke peyvên teknîkî ya kurdî (kurmancî) – tirkî – inglîzî ye. Ferheng ji 180 rûpelan pêk tê û ji aliyê Yekîtiya Mihendis û Mîmarên Tirkîyê hatiye amade- û çapkirin.

Di ferhengê de nêzîkî 5 000 serpeyvên kurdî hene. Serpeyvên kurdî hem li tirkî û inglîzî hatine wergerandin û hem jî piraniya wan bi kurdî hatine şirovekirin.

Ji ber ku mijar teknîk û teknoloji ye, di ferhengê de ji birrên rêzimanî yên peyvan bi piranî tenê navdêr hene, birrên din peyda nabin an pirr kêmin. Hin ji serpeyvên ferhengê peyvên di kurdî de heyî ne. Lê hejmareke mezin ji serpeyvan jî peyvên li ber tirkî yan zimanên din çêkirî ne.

Ji ber ku kurdî wek zimanê zanist û teknîkê hê jî baş pêş neketiye, sazkirina peyvên teknîkî li ber zimanên din jî divê ne wek tişteki "heram" were dîtin. Lê divê di peyvsaziyê de mirov baş guh bide qeyd û bendên peyvsaziyê di zimanê kurdî de.

Ferhenga zaravên teknîkî ji aliyê lijneyeke çend kesî ve hatiye amadekirin. Piraniya peyvên wê yên berhevkirî û heta yên nûçêkirî jî biserketî ne.

Di bikaranîna ferhengê de dê baş bûya ku beşên tirkî-kurdî û inglîzî-kurdî jî hebûna ji ber ku wergêr gelek hewceyî wan in di wergerandina berhemên teknîkî de. Bikarînerên vê ferhengê wek kitêbeke çapkirî nikarin li peyvên tirkî yan inglîzî – yên ku ew kurdiya wan meraq dikin – bigerin.

Lê çapa orijînal, mirov dikare bi lêgerîna li dosyeyê li peyvên tirkî û inglîzî jî bigere û kurdiya wan bibîne.

Kovara Kanîzar bi şanazî tevahiya vê ferhengê pêşkêşî xwandevarên xwe dike:

<https://zimannas.files.wordpress.com/2017/03/ferhenga-zaraven-tekniki.pdf>



## Gorrîn û Qirtandin le zaraway kurdîy kirmaşanî

*Elî Şahmuhemmedî*

Lem zaraweda sê cûr gorrîn bedî dekirêt.

### 1. Gorrînî Fonolocî

Ew gorrîneye ke be dirêjayî rojgar rûdedat û hoyekî serekîye le hoyekanî dirust bûnî zar le zimanêkda . Em gorrîne mêjûyî û kone bem core

- Dengî (B) bûwe be dengî (w) .

Behar → Wehar

Ba → Wa

Baran → Waran

Xiyaban → Xiyawan

- Dendî (T) le paşgirî wişekan bûwe be dengî (D) .

Birat → Birad

Malltan → Mallidan

Desit → Desid

Kurrit → Kurrid

- Dendî (O) ke zortir le zarê Soranîda bekar decê bûwe be dengî (Û) .

Aso → Asû

Ako → Akû

Goranî → Gûranî

Roj → Rûj

## 2. Gorrînî Morfolocî

Ew gorrîneye ke rûdedat le encamî kartêkirdnî dengêk leser dengêkî tir , be hoy nizîkîyewe , wek

- Desşûr = Deşûr
- Bedtir = Bettir

## 3. Gorrînî tîkellbûn

Lem gorrînedat dû deng tîkell debîn û dengêkî ciyawaz dirust deken , wek

- Heft de = Hevde
- Hesên beg = Hesemeg ( N , B pêkewe bûnete M)
- Kar we bîlege bike = Kar pî bike

Qirtandin lêre wate go nekirdinî dengêk yan çen deng le awxatinda. Le zarî Kirmaşanî em denganey xwarewe le qisekirdinda deqirtên

1. (T) em denge be giştî , eger dûwa deng bû deqirtêt be mercêk nebête hoy gorrînî wata û çeşnî wişe , yan nehêştinî wata û çeşnî wişe . bo nimûne
  - Keft : Nabête keft ! , çonke wata û çeşnî wişe degorrêt .
  - Çef : Nabête çef ! , çonke wata û çeşnî wişe le naw debat.

Bellam detwanîn (T) le (Dest) biqirtênîn , çonke ne wata û ne çeşnî wişe degorrêt yan

- Le nawî debat : Des !
- Le nawewe deqirtêt : Nesteq → Neseq

Desşûr → Desşûr

2. Dengî (D) , em denge le nawewe û le dûwawe deqirtêt

- Le nawewe : Mendelî → Menelî
- Çermewendî → Çermewenî

Le go kirdinda , em denge qirtwe çonke ew dengey le pêşîyewe dêt dû beramber (tez'îf)  
dekirêt û be remz bem core denûsrêt

Minelî = m n n e l î

Çermewenî = ç e r m e w e n n î

- Le dûway wişewe : Billind → Billin

Herwekû le pêşewe basiman kird, dengî pêş dengî qirtênraw dirêj dekirêtewe le qise kirdinda  
û ew rastiye derdexat ke cêgay dengêkî qirtênraw degirêt .

### 3. Carê wa heye em denge (D) degorrêt be (Y) .wek

Mirad = Miray

Xwida bed neyed = Xwida bey ney

### 4. (B) em denge le nawewe deqirtêntêt , betaybetî le darriştinî inşanî , bo nimûne

Bikirdyam – Bikirdam

Bimirdyam – Bimirdam

Batyan – Banat

### 5. Dengî (w) , em denge dîsan deqirtêt le hendêk halledta

Aman bîye we şûwan      ~~Aman bîyese we şûwan~~      ~~Aman bîyese w şûwan~~

### Serçawekan:

- 1) Gerdnîş le kurdî Kirmaşanî - Rizgar Behadur
- 2) Rêzmanî Kurdî Kellhurrî - Nî'met Elî Saye
- 3) آموزش زبان کردی - سیدمحمدسینا احمدی
- 4) آواشناسی و دستور زبان کردی - دکتر علی رخزادی
- 5) گاهنامه‌ی ادبی، فرهنگی، اجتماعی کرماشان . "واجنویسی زبان کردی"
- 6) Bîkarsazî le kurdî Kirmaşanî - Rizgar Behadur

## Veracêkerdena zazakî û kurmancî

### Seîd Veroj

Xebata der heqê ziwani de, nîzdî 400 seran V. Z. ra bi xebatandê ziwanzan Panînî yê Hindî dest pê kerda. Labelê xebatê lînguîstîkî anca peynîya seserra 19. de dekewtî çarçeweyêka ziwanzanistîye û xebatê dîyalektolojî zî hîna vêşî bîyê. Bîlhesa hetê sîyasî ra merkezîbîyayîşê dewletan yan zî peydabîyayîşê dewleta modern, mesela standardbîyayîşê ziwani vet meydan û ey zî bi xo wa problemê dîyalektandê cîyayî ardî meydan. Çimkî wexto ke ma bala xo bidê xebatandê dîyalektolojî, dîyar beno ke enê tewir xebatî, peynîya seserra 19. de hîna vêşî bîyê.

Mesela ziwani û dîyalektan, yew meseleya zaf mûhîm û kehan a xebata zanistîya lînguîstîk a. Gama ke behsê ziwani bibo, hawayê cîyayê ziwaniyan ê ke sey dîyalekt yan lehçe yenê namekerdiş zî vejîyenê vera ma. Heta ewro ena mesela ser o munaqeseyî bîyê, eno derheq de tarîfê cîya-cîyayî bîyê, labelê yew tarîf û îzehato maqul o ke her kes ser o hemfikir bo nêbîyo. Peydabîyayîşê ziwani û dîyalektan ser o, bêj bi bêj teorî ameyê pêşkêşkerdene.

Peydabîyayîşê cîyayî (ferq) û bedêlîyayîşê ziwani, xusûsiyetêk tarîxî û esasî yê ziwani yo. Çimkî ziwani zî sey çîdê ganî yo, zemanî mîyan de bedêlîyeno. Rojgaro ke ziwani peyda bîyê û heta ewro, her bêj têkilîyê komeyanê mêrdiman bîyê sebebê bedêlîyayîşê ziwaniyan, peydabîyayîşê dîyalektan, kom û komikanê kulturî yê cîya-cîyayan. Eynî wext de têkilîyê komeyanê merdîman; têkilîya ênan a pêwa ciwîyayîşî, dînî, tarîxî, sîyasî, îqtîsadî, kulturî, qewimîyayîşê hedîseyandê xozayî û komelî zî bîyê sebebê dayîş û girewtîşî û bedêlîyayîşê ziwani û kulturandê cîyayan. Peynîya enê têkilîyan de, hem ziwani welatandê cîya-cîyayan û hem zî goreyê ca û herêman, ziwani xo mîyan de bedêlîyeno. Seke ziwanzano namdar **Ferdinand De Saussure** zî vano: "Zemanî mîyan de bedêlîyayîşê ziwani, bîyo sebebê peydabîyayîşê dîyalektandê cîyayan."<sup>[1]</sup> Têkilîya ziwaniyan de, verê heme çî vate û tayê şeweyê vatişê ênan bedêlîyenê. Ray ray eno bedêlîyayîş hende gird beno ke qisekerdoxê eynî ziwani zî zor yewbine fehm kenê yan zî nişênê yewbine fehm bikê. Goreyê ca û warandê cîyayan, bi eno hawa bedêlîyayîşê yew ziwani ra vajîyeno *dîyalekte (lehçe)*. Labelê çarçoweyeka dîyar û tarîfêko standard ê dîyalekte çinî yo.

Ziwanzano almanij **Ludwig Paul** vano “bêntarê ‘ziwan’ û ‘dîyalekte’ de hîç sînoreko qethî û ‘xozayî’ çinî yo. Kes şêno di şeweyanê cîyayan yê yew ziwanî hetê kulturî ra sey dîyalekte, sewbî hetana zî sey di ziwanê cîyayan tarîf biko. Mesela “ziwan û dîyalekte”, goreyê tarîfkerdiş û xusûsiyetê ênan, mimkun o ke hetana yew dereca keyfî bo zî.” [2] **John Loyns** zî vano: “Mabeynê dîyalektandê yew ziwanî de yan zî mabeynê dîyalektandê ziwananê hemberyanê yewbine de dîyarkerdişê sînoreko mutleq mimkun nîyo” [3] Tayê ziwanzanî zî dîyalekte, sey “şeweyêk qisekerdiş”ê ziwanî tarîf kenê.

Bi kilmîye ma şênê vajê ke tarîfê “dîyalekte” ser o, yew çarçeweya dîyarkerde û sînoreko mutleq çinî yo. Gelek ziwanzanî enê sînor û tarîfî, goreyê fikir û ewniyayîşdê xo îzah kenê.

Sey ziwanandê bînan, *koma ziwanê kurdî* de zî tayê şewe û dîyalektê cîya-cîyayî estî. Bêguman sebebê tarîxî, sosyal, ekonomîk û siyasî yê peydabîyayîşê nê dîyalektan estî. Etiya de ma do yew bi yew nê sebebên ser o nêvinderê.

Rojgaro verên ra hetana ewro koma ziwanê kurdî zî xo mîyan de gelek bedêlîyaya, tira dîyalektî û şeweyê cîya-cîyayî peyda bîyê. Gerek ma naye bizanê ke peydabîyayîş û bîyayena dîyalektanê cîyayan, rastîyêka tarîxî ya heme ziwanan a. Koma ziwanê Kurdî zî enê ziwanan ra yew a, ziwan û abirrîyayîşê dîyalektanê kurdî ser o zî fikrê cîya-cîyayî estî. Ferqê cîyabîyayena enê fikran çîyo? Ma do dewamê enê nûşteyî de, fikrê cîya yê ke der heqê ena babete de ameyê vatiş dîyar bikê û ciwabê persê cîyayey û nîzdîyeya dîyalektandê kurdî bigeyrê.

Peydabîyayîşê dîyalektan û şeweyanê cîya yê yew ziwanî, tena bi qaydeyandê lînguîstîkî îzah nêbenê. Bi xusûsiyetê lînguîstîkî wa, tarîx, kultur, folklor, adet û toreyê yew komelgayî zî dîyarkerdişê ziwan û lehçeyê ênan de unsûrê esasî yî.

Ziwanê ke dinya de peyda bîyê; wazenê wa merde yan zî ganî bibê, goreyê xusûsiyetê ênan ê xomîyan û pêroyî, kome bi kome cêra aqitnayene yan zî tesnîfkerdena ênan, mewzûyê lînguîstîkî yo. *Tesnîfkerdena ziwanan, yan goreyê xusûsiyetê gramerê ênan yan zî goreyê mêrdimayîya ênan a tarîxî yena dîyarkerdiş.* Ziwanê kurdî zî bi dîyalektanê xo ra, berhemê têkilîya tarîxî ya kome û komikandê komelgeha kurdî yo.

Ziwanê kurdî bi dîyalektandê xo ra, koma ziwanandê hind-awrupayî mîyan de ca gêno. Ziwanê hind-awrupayî xo mîyan de benê di şaxî: 1- Şaxê Hînd-Awrupayî, 2- Şaxê Asyayî. Ziwanê asyayî zî xo mîyan de benê di şaxî; ziwanê hindî û ziwanê *arî* (*aryanî-îranî*). Ziwanê tewr verên ê ena grûbe, ziwanê Avesta yo. Ziwanê grûba *arî*, goreyê sazbiyayîşê gramerê xo, xo mîyan de benê çehar şaxî: 1- Grûba bakûr, 2- Grûba başûr, 3- Grûba rojhelat û 4- Grûba rojawayî.

Goreyê enê tesnîfkerdişî, **kurdî**, dekwena mîyandê grûba rojawanê vakurê Îranî û farisî zî dekwene mîyandê grûba rojawanê başûrê Îranî. Ena grube mîyan de zî kurdî û dîyalektê xo, pehlewî û farisîya verên û farisîya newa, peştûnî, belûcî, osetî... ca gênê.[4] Grûba ziwanandê rojawanê vakurê Îranî mîyan de **kurdî**[5]; bi dîyalektanê xo ra ziwanêk xoser o, xusûsiyetê ayê xas û tarîxêk ayê kehên esto. Ne şiklêkê herimîyaye yê ziwanê farisî û ne zî yew dîyalekta farisî ya. “Çimkî senî ke her ziwanê germanî, almanî nîyo, her ziwanê îranî jî farisî nîyo.”[6]

Seke cor de zî ameyo vatiş, grûba ziwanê *Hindî-Arî* mîyan de sanskrîtî, avestayî, pehlewî û farisîya newa, kurdîya kehên û dîyalektê xo, peştûnî, belûcî û dêrî ca gênê. Sanskrîtî û avestayî, na grube mîyan de ziwanê tewr qedîmî yê. Ziwanzan û cêgêrayoxî, *ziwanê avestayî û pehlewî*, sey di çimeyê kevnare yê farisî û kurdî qebûl kenê. Labelê çimeyê kevnare yê nê her di ziwanan yew bo zî, ewro farisî û kurdî di ziwanê xoser ê cîya yî.

## 2. Vateyê zaza û zazakî, dimilî û dimilî, kird û kirdî,

### kirmanc û kirmancî kamcin mana de ameyê gurênayîş?

Wexto ke ma bala xo bidê belge û nûsteyandê tarîxî, seba zazakî/ dimilî/ kirdî/ kirmancî û qiseykerdoxandê zazakî rê, hem xo mîyan de û hem zî terefdê şarê xerîbî ra vate û kelîmeyê cîya cîyayî ameyê nûstiş û telafûzkerdiş. Ewro roj qisekerdoxê zazakî, ca bi ca xo bi nameyê “zaza”, “dimilî”, “kird” û “kirmanc” tarîf kenê, ziwan û dîyalekta xo zî bi nameyê “zazakî”, “kirdî”, “dimilî” yan zî “kirmancî” danê şinasnayîş. Eno derheq de **Zîya Gokalp** vano: “Qewmanê kurdan nameyê cîya-cîyayî nayê xo ra û yewbina. Mîsal; êyê ke kurmancî qisey kenê xo ra nêvanê “kurd”, vanê ma “kurmanc” î û zazayana zî vanê “dûnbûlî”. Ay ke zî zazakî qisey kenê xo ra vanê “kird” û kurmancan ra zî vanê “kirdas”. Tirkî zî, “kurmanc” an ra vanê “kurd” û “dunbulî” yan ra zî vanê “zaza”. Bîzatîhî ne qisekerdoxê zazakî û ne zî ê kurmancî bi xo kelîma “zaza” nêxebitnenê.[7] Erebî kurdan ra vanê “ekrad” û tirkan ra zî vanê “etrak”.



Wexto ke ma bala xo bidê nûsteyandê verênan yê “zazakî”, na tespîta Zîya Gokalp û sewbî kesê ke winî vanê raşt vejîyena. Hem materyalandê P. Lerchî de û hem zî *Mewlûdê Mela Ehmedê Xasî* de, seba xo sinasnayîş dayene kelîma “kirdî” ameya xebitnayîş. Xoceyê Xasî peynîya *Mewlûdê* xo de winî vano: “*Temam bi viraştîşê **Mewlûdê kirdî**, bi yardimê Xaliqî û bereketê pêxemberê ma*”.<sup>[8]</sup>

Yew qismê dêrsimij ê ke bi dîyalekta dimilî qisey kenê xo ra vanê “kirmanc”, bi umûmî kurmancan ra zî vanê “kirdas” û dîyalekta ênan ra zî vanê “kirdasî” yan zî “kirdaskî”.<sup>[9]</sup>

**Nûrî Dêrsimî** zî zazakîya Dêrsimî sey ziwane xas ê kurdan qebûl keno û vano: “Ziwane zazakî yê ke Dêrsimijî qisey kenê, bêguman ziwane bawkalandê înan ê Med û Arîyan o.”<sup>[10]</sup>

**Kemal Badilli** zî vano: “Zazayê Turkiya, xo kurdê esil qebûl kenê û xo ra vanê kird û kurdandê bînan ra, yanî kurmancan ra zî -bi mana hûrdî vînayîşî de- vanê kirdasî.<sup>[11]</sup> **Prof. Mehrdad R. Izady** zî der heqê na mesela de vatişê **Bazil Nikitinî** neqil keno û vano: “Semedo ke qiseykerdoxê dimilî zaf vêşî herfa /z/ xebitnenê, kurmancan ênan ra vato “zaza”.<sup>[12]</sup>

**V. Minorskî** zî vateyê “dimilî” û “deylemî” pêwa girêdano û vano vatedê Andreasî gore, mabêndê “zazayan û deylemîyanê verênan de mêrdimayî esta.”<sup>[13]</sup> Gerek ma xo vîrê nêkê ke nûste û kitabandê cîyayan de, gelek formê cîya cîya yê nûstîşê kelîma “dimilî” estî: “dimlî”, “dumbilî”, “dinbilî” û “dimilî”. Zaf cayan de zî formê kelîma “dimilî”, sey nameyê yew eşîre vêreno. Mîsal *Şerefname* de “dinbilî”, sey nameyê eşîrêka êzidî ya derûdorê Musil û Şamî vêrena.<sup>[14]</sup> Ewro zî tayê cayan de bi nameyê “dumbilî”, “dimbilî” û “dumilî” eşîrî estî.

**Robert Olson** zî vateyê “zaza”, “deylem” û “goranî” sey vateyê pêwa têkildar qebûl keno û vano: “Zazayê ziwandê xo ra vanê dimilî, ke eno zî, îhtimalê têkilîya ênan û deylemîyanê vakurê Îranî ano kesî vîrî. Lehça kurdî ya zazakî, kurmancî ra vêşêr nizdîyê lehça goranî ya.”<sup>[15]</sup>

Vateyê “zaza” û “dimilî”, tayê çimeyan de zî manaya nameyê eşîran û cayan de ameyê nûstîş. Tayê nûşttox û çimeyê bîni zî vateyê “zaza” bi vatedê “zevezan (zozan)”, “zevezanîye”, “zavzan”, “zewezan”, “zewzan”, “zozanîye” û “zûzan” ra girêdanê.<sup>[16]</sup>

Wexto ke mesela “zaza” yan zî “zazakî”, “kurd” yan zî “kurmançî” bibo û kes behsê tayê nûşttoxandê îdeolojîya fermî ya tirkan nêkê, belkî manîpûlasyonê ewroyênî zî raşt fehm nêbenê. Der heqê na mesela de **Nazmî Sevgen** vano: “zazakî ziwaneke têmîyanek o û eslê xo de zî tirkî ra peyda bîyo.” Peydabîyayîşê kelîma “Zaza” zî tirkandê Oxuzan ra girêdano û vano: “Za” nameyê yew lajê Oxuzxanî bî. Qewmanê îptîdaî seba ke vatişê nameyê yewheceyî şidênaye telafûz kerdênê, nameyê “Za”yê lajê Oxuzxanî zî bi hawayê “za-za/zaza” ameyo vatiş.[17] **Hayrî Başbuğ** o ke tayê cayan de mahlasê **H. Şelîcî** xebitneno, ena mesela ser o vateyê nîzdî vatişê Sevgenî tekrar keno û vano: “Tayê mêrdimî qestî ra, bi nîyeto xirab û pêşînhikum “zaza”yan mefhûma “kurd”an mîyan de mutala kenê. Labelê eno hikum, vera realîta tarîxî tam tezatêk teşkîl keno... Kurmançî zî û zazakî zî di lehçeyê cîya yê tirkî yê. Goreyê fikirdê ma; nameyê “zaza (za-za)”, bi bedêlyayîşê nameyê “su/aw” (su-su) ra peyda bîyo.”[18]

### 3. Der heqê ziwana û dîyalektanê kurdî de, kê vato çî?

Bêguman sey heme ziwanan der heqê ziwana û dîyalektanê kurdî de zî fikrê cîyay estî. Ez wazena etîya de biney behsê tesnîfkerdişê dîyalektanê kurdî bika û no derheq de çî ameyo vatiş, bîyara şima vîrî. Qandê naye rê zî, ma do behsê fikirdê tayê nûşttox û kurdologê ke ziwana û dîyalektanê kurdî ser o xebitîyayê bikê. Heta ewro heme dîyalekt û şeweyandê kurdî ser o xebatêka bi serûber û besbîyaya bi ma dest nêkewta yan zî xebatê winayênî zaf kemî bîyê. Belkî xebatê akademîk ê ke ewro ra pey bêrê kerdiş, bibê sebebê nawitiş û akertişê yew rêçida newa. Labelê gerek ma ena zî bizanê ke xebata ma ya ewroyêne zî çinîbiyaye ra dest bide nêkerda. Heta ewro der heqê ziwana û dîyalektandê kurdî de gelek çî ameyê vatiş û nûstiş. Ez wazena ke bi kilmîye ênan ra behsê tayê vatiş, çime û xebatan bika.

Eke ma hawayêko kronolojîk behsê enî eseran û vatişan bikê, vernîya hemine de *Şerefname* yeno. *Şerefnameya* Şerefhan Begî de çehar dîyalektê ziwane kurdî ameyê hûmartiş: 1- kurmanç, 2- lor, 3- kelhur, 4- goran.[19]

*Şerefname* ra pey *Seyahetnameyê (1655) Ewlîya Çelebî* yeno. Wexta ke ma *Seyhatnameyê* Ewlîya Çelebî ra bewnî, kê şênê vajê ke der heqê kurdolojîyê de agadarîyê zaf mûhîmî tede estî, labelê etîya de ma wazenê giraneye bidê ziwani û ena hete ra bide bewnî. Çelebî, *Seyahatnameya* xo de, behsê şiyês dîyalektanê ziwani kurdî keno û nameyê ênan zî wina rêz keno: **Mehmûdî, avnikî, zazayî,**

*lloyî, cîloyî (hekkarî), şîrvanî, cîzrewî, pisanî, sincarî, harîrî, erdelanî, soranî, xalitî, çekvanî, îmadî, rojkî.*" [20] Wina aseno ke Çelebî nameyê eşîran, mintîqa, şêwe û dîyalektan têmîyan kerdo. Gama ke ma ênan sey dîyalektan tesnîf bikê; tena lurrî, soranî, erdelanî û zazakî manenê. Ê çekûyê bînî zî, kes şêno vêşaneyê ênan sey nameyê eşîran yan zî şêweyê kurmancî û soranî qebûl bikê.

Xebata pedagogê armenî **Xaçatur Abovyanî (1809-1848)** tesîrêko giran îranologandê Rûsya sero kerdo. No semed ra Abovyan sey pîyê kurdolojîya Rusya yeno qebûlkerdiş. *Abovyan zî dîyalektanê zîwanê kurdî bi namebê kurmancî û zazakî di şaxî keno.* Abovyanî ra pey, xebata **Peter J. A. Lerchî (1828-2884)** yena, ke o bi xo sey hîmdar û viraşttoxê kurdolojîya Sovyetî yeno qebûlkerdiş.

**Major E. B. Soane** zî der heqê zîwanê kurdî û fêrêqê mabêna dîyalektandê ênan de vano:

"Lehçeya mukrî û gilandê aye ra teber Kurdistan de sewbîna lehçe û şêweyî zî estî û pêro zî xo sey kurdandê xasan qebûl kenê. *Enê lehçan ra yewêda tewr mûhîm zî lehçeya zazakî ya.* Zazayî, kurdan mîyan de grûbêda gird a û derûdorê Diyarbekir, Ezirgan û tayê cayandê Anatolya de ciwîyenê. Vêşaneyê ênan mintîqa koyan de ciwîyenê, zaf tund û cesûr î. Bi yew lehçeya saf a arî qalî kenê. Lehçeya ênan hem lehçeya mukrî ra û hem zî lehçeyandê bînan ê kurdî ra cîya ya. Sey zîwanandê arî, gerek ena lehça ser o zî xebate bêro kerdiş. Lehçeya zazakî; farisî ra vêşêr nîzdîyê zîwandê kurdî ya" [21]

**Sir H. C. Rawlson**, benda "Kurdistan"î ya *Ansiklopedîya Britannica* de der heqê zîwanê kurdî de winî vano: "Ewro zîwanê esasî yê kurdan kurmancî ya, zazakî û goranî zî dîyalektê cîya yî." [22]

**M. Emîn Zekî Beg, Madson Grantî** ra neqil keno û vano: "Esrê III. ê V. Z. ra na heta zîwanê kurdî de hîrê dîyalektî peyda bîyê: Dîyalekta kurmancî, babanî û zazakî (dinbilî)." [23]

**Zîya Gokalp** o ke bi xo çêrmûgij o, dîyalektanê zîwanê kurdî eno hawa tesnîf keno: 1- *kurmancî*, 2- *zazakî*, 3- *soranî*, 4- *gûranî* û 5- *lûrî*. [24]

**Sernûşttoxê kovara Kurdistan Mehmed Mîhrî** zî vano, "Esasen zîwanê kurdî di qismî yo: Kurdî û goranî. Goranî zî xo mîyan de bena di şaxî: hewramanî û zazakî." [25]

**Roger Lescot û Celadet Alî Bedirxanî** ke “*Gramera Kurdmancî*” hadirnaya, der heqê dîyalekt û şêweyanê ziwane kurdî de vanê: “1- kurmancî, 2- soranî, 3- dumilî (zazakî), 4- goranî (û gelek şêweyê herêmî yê ênan)” [26] estî.

**Kemal Badilli** zî, vano çehar birrê ziwane kurdî estî: “1- kurmancî (kurdmanc/ kurmac/kirmanc/kirmaç), 2- lûrî (lûr, lor, ler), 3- goranî (hewramî, ewremanî, zaza/ dimilî), 4- kelhûrî yan zî soranî).” [27]

**Prof. Marûf Xeznedar** zî, tesnîfkerdişê mamoste **Tewfiq Wehbî** esas qebûl keno û dîyalektanê ziwane kurdî winî tesnîf keno: “1- kurmancî (a-kurmancîya serû, b- kurmancîya xwarû-soranî), 2- goranî (hewremanî)/ zazayî, 3- lûrî (bextiyarî, feylî, kelhûrî, lekî zî sey şêweyê ena dîyalekte qebûl keno).” [28]

Ziwanzan **Qanatê Kurdo** zî kitaba xo ya *Gramera Ziwane Kurdî (Kurmancî û Soranî)* de, ziwane kurdî sey çehar dîyalektan cêra abirrneno: 1- kurmancî, 2- zaza, 3- lûrî, 4-goranî. [29]

Enê agadarîyê corênan ra dîyar beno ke ziwane kurdî zî xo mîyan de gelek dîyalektan ser o par beno. Ayê ke çend dîyalektanê ziwane kurdî û tayê xusûsiyetanê eyê esasî bizanê, ên (în) do bivînê ke ferqê dîyalektanê kurdî, ferqê dîyalektanê ziwandê bînan ra vêşêr nîyo.

Enê agadarîyan ra pey ma şênê vajê ke helbet bi hawayêko mutleq dîyarkerdena tarîxê cirabîyayîşê yew ziwane dîyalektandê eye asan nîyo, labelê ma şênê vajê ke nê ziwani pêro têmîyan de sey parçeyêk azbeta ziwandê *Arî (Îranî)* yenê qabûlkerdiş.

#### 4. Metnê verênî yê zazakî/ dimilî/ kirdî/ Kirmancî

Ewro roj nûste û dokumentê zazakî yê ke ma destê de estî zaf kemî yê. Hetê nûstişî ra dîyalekta zazakî lawaz a. Eke ma nûsteyê hewramî û goranî xanedê zazakî ser o nêhesibnê û ewro ra pey sewbî dokumentê newe yê zazakî cayandê tarî ra nêvejî roşnayê, nûşte û dokumentê ke mabênê serrandê 1856-58 de terafê Peter Lerchî ra ameyê pêserkerdiş, sey dûkomentê verênî yê zazakî qebûl benê. Enê materyalandê folklorîkanê zazakî de, hem kelîma “**kird**” û hem zî “zaza” ameyê nûstiş. Vateya “kird”, pênasîya ênan bi xo ya. P. Lerc mesela “**Qauxê Nêrib û Hêynî**” de, vateyê Xelef Axay eno hawa neqil keno: “*Xelef Axayî va ki eskerî xoe ra: Baunî (bawnî) axaler, ma şuenî kauxe, metirsî,*

eskerî Deqma Begî zavû, hema piyeru Tirk î, nişênî ma de kauxe bikî, ma piyerû canmirdî **kirdan** î, miyerdeî aşîran î, metersî, ma ha şuenî, heta ki sereî mi niwenu, şima çewîrî çî çinu...”[30] Wexto ke ma bala xo bidê nê metnan, eke tayê kemaneya alfabeya nûstîşê metnan nêbo, sey ziwane eyro yê mintiqa Nêrib o, qet nêbedêlîyayo.[31]

Serra 1857-58 de, nê nûste û metnî St. Petersburg de yenê çapkerdiş û vilakerdiş. **Ferhengê vernî yê zazakî-rusî zî, serra 1858 de yeno nûstîş.** Eynî wext de **Albert von Le Cod zî, tayê metnê folklorî kurdî bi dîyalekta kurmançî û zazakî ya pêser kerdî û serra 1903ê Berlîn de dayê çapkerdiş û vila kerdî.”**[32]

Bêguman mesela materyalê dîyalekta zazakî û nûstîşê aye, zaf mûhîm a. Ewro roj ma destê de eserê ke şiklê verên ê zazakî û tekamûlê ayê tarîxî binawnê çinî. Eke dokomentê arêkerde yê Peter J. A. Lerchî (1858) nêbê, agadarîya ewroyî gore, nûste û kitaba verên a zazakî **Mewlûdê (1899) Mela Ehmedê Xasî** yo. Mewlûdê Xasî, serra 1899î de şeharê Dîyarbekir û çapxaneyê Lîtoğrafya de bi alfabeya erebî ameyo çapkerdiş. Eyî ra pey zî, **Mewlûdê miftîyê Sewêreke Mela Usman Efendîyê Babijî** yo, ke serra 1903ê de nûsîyawo û 1933 de zî *Şam de ameyo çapkerdene.*

Nînan ra teber, ma şênê vajê ke nûşte û nûstîşê zazakî (dimilî, kirdkî, kirmancî), eno demeyo nîzdî de yanî serrandê 1975î ra na heta roj bi roj vêşî bîyê. Nê serran de kovara *Tîrêj* û rojnameyê *Roja Welat* de tayê helbest û nûsteyê folklorîk ê zazakî ameyê çapkerdiş. Ewro zî tayê kovaran û malperan de nûsteyê zazakî yenê çapkerdiş û velakerdiş. Wexto ke behsê xebat û nûstîşê zazakî bibo, hewceyo ma verê hemine xebata kovar û *Grûba Vateyî* bîyarê xo vîrî. Bêguman dîyalekta zazakî tena kovara *Vate* de nê nûsîyena, kovarê sey *Armanc, Hêvî, War, Bîr, Newepel, Şewçila, Tija Sodiri, Pîya, Arîye* û ê bînan de zî nûsteyê bi dîyalekta zazakî ameyê çapkerdiş û velakerdiş.

Peynîye de, sey ke cor de gelek cigêrayoxan zî dîyar kerdo, ma şênê vajê ke kurdî zî sey heme ziwandê dinya, xo mîyan de dîyalekt bi dîyalekt cêra abirryena. Zazakî zî enê dîyalektan ra yew a. Gerek kê bîyayena dîyalektanê cîyayan sey çîdêk negatîf nê, sey xezîneyêk dewlemend a ziwani bivînê. Bîyayena dîyalektanê cîyayan, “tenîya xûsusîyetêk ziwane kurdan nîyo; dinya de neteweyê ke ziwane ênan tewr sererast û dewlemend o, dewre bi dewre edebîyatêk ênan ê se seran esto, hema zî lehçeyê ênan estî, ganî yî û sey wexto verên qalî benê.”[33] Ferq û nîzdîyeya ziwani û dîyalektandê bînan û bîlhesa zî yê koma arî çî hend o seke, yê zazakî û kurmançî zî kemî-vêşî ehend

o. Nizdîyeya mabênê dîyalektandê kurdî, ferqê ênan ra zaf vêşî ya. Hetê tarîxî û kulturî ra zî, kok û rîçikê etnîkî yê qiseykerdoxandê nê ziwan û dîyalektan şino pêser û yew o.

### 5. Eserê edebî yê zazakî (dimilî, kirdî, kirmancî)

Eger behsê nûstîş û edebiyatêk zazakî (dimilî) bibo, winî aseno ke çimeyê sereke yê nûstîşê zazakî metnê klasik ê dînî yî ke ma tira vanê **Mewlûd**. Mewlûdê dimilî, hem medrese û hem zî mîyanê şarî de yeno wendiş û bîyo sey yew bêjê edebiyatê klasîk ê dînî. Eke dokomentê arêkerde yê Peter J. A. Lerchî (1858) nêbê, agadarîya ewroyî gore, nûste û kitaba verên a zazakî **Mewlûdê (1899) Mela Ehmedê Xasî** yo. Mewlûdê Xasî, serra 1899î de şeharê Dîyarbekir û çapxaneyê Lîtografya de bi alfabeya erebî ameyo çapkerdiş. Eyî ra pey zî, **Mewlûdê miftîyê Sewêreke Mela Usman Efendîyê Babijî** yo, ke serra 1903ê de nûsîyawo û 1933 de zî Şam de ameyo çapkerdene. Enê Mewlûdanê verênanan pey zî Mewlûdê ameyê nûstîş. Etiya de wextê ma teng o, ma nişênê behsê ênan bikê.

*Şikil û qalibê edibiyatê modrn de, kitab û nûştayê zazakî (dimilî/kirdî):* Enê bêj materyal nûştayê zazakî, serra 1975î ra pey dest bide kerdo, verê sey nimûne yew bi yew kovar û rojnameyan de û serrê 1990 ra pey zî mewzûyê ciya ciyayan ser ro gelek kitabê zazakî ameyê çapkerdiş. Bi kilmîya, wazena humara kitabênê tayê bêjê nûstîşê zazakî bîyara şima vîrî. Hendo ke mi tesbît kerdî, heta nika;

– 32 kitabê Estanekan (çîrokan)

– 33 kitabê şîfran

– 12 romanî

– 30 kitabê folklorî

– 11 kitabê Gramerî

– 15 ferhengî

....

Bi kilmevatişêko peyên, wexto ke ma humara kitabê estanikan, şîr û romanên zazakî xo çiman vera bigîrê, bêguman ma şênê vajê edebiyatêk bi lehça zazakî peyda bîyo. Labelê gerek munaqêşeyê tema, zengîneye û averşiyayîşê enê edibîyatî, sewbî wext bêro kerdiş.

## 6. Fonetîk (vengsazîya)

### 6. 1. Fonetîka (vengsazîya) diyalakta zazakî û kurmançî ser o kilmvateyêk

Wexto ke behsê fonetîk yan zî fonolojîya ziwanî bibo, lazimo vernî de îzehatê ênan bêro kerdiş, wezîfe û çarçeweya cigêrayîşê aye diyar bibo. Bêguman fonolojî û fonetîka ser o fikir û îzehatê cîyayî estî û nê termî zî gelek ameyê munaqêşekerdene. *Fonetîk*, zanyarîya cigêrayîşîya bedêliyayîşê veng (foneman) a. *Fonolojî*, zanyarîya cigêrayîşîya vengê (fonem) tewr hûrdî yê ziwanî ya. Seha cigêrayîşê fonolojî veng (fonem) o. “Wezîfeyê fonolojî zî no yo: Cêbigêro ke bedêliyayîşê kamcin xusûsiyetandê vengî benê sebebê cîyawazeya mana; xusûsiyetê ke benê sebebê cîyawazîye, mabênê xo de senî hereket kenê û seba viraştene vate û cumleyan (hevokan) goreyê kamcin qeydeyan yewbîyayena ênan mimkun bena.” [34] No çarçewe de wexto ke behsê xebata gramerê ziwanî bibo, fonolojî û fonetîk sey parçeyêk esasî yê xebata ziwanî vejîyenê vera ma.

Ziwanzano namdar ê esrê 20. Fe. De Saussure, ziwanî sey sîstemêk qebul keno. Wexta ke ziwan sey sîstemêk qebul bo, no sîstem de unsûrê cîya cîyayî estî û wezîfeyê ênan her yewî zî cîya yo. Unsûro tewr hûrdîyê ziwanî veng o û ziwanî mîyan de wezîfeyê her yew vengî zî cîya yo. Heme ziwanan mîyan de zaf vengê cîya-cîyayî estî, feqet nê vengî pêro nîne xebitnayîş. “Mêrdim eşkeno nêzdî 200 vengên telafuz biko û ênan hîss biko; labelê qiseykerdoxê komeyê ziwanan, seba hezaran vateyan tenya 40 vengên esasî xebitnenê” [35]

Vengê ke behs beno yew bi yew yan zî yew ra vêşer bêrê pê hete, tira *vatey* peyda benê. Her yew veng manayanê cîyayî dano ziwanî û cîyayeya vateyan zî diyar keno. Vateyê ke ma fek ra vejîni, cîyayîya vengê ênan ê vernî û peynîye sey cê nîyê; ke tena vengê peyên ê vateyan bibedêliyî rewarew manaya ênan nêbedêliyena, ke vengê verên ê vateyan bibedêliyî manaya ênan zî bi temami bedêliyena. Mîsal; ke ma vateyê /roj/ û /roz/, /ruz/... bîyarê xo çiman ver, bedêliyayîşê vengê /j/ û /z/ yan zî /o/ û /u/ mana de ferqêk muhîm diyar nêkeno, labelê ke ma vateyanê /pîr/, /bîr/, /vîr/, /tîr/, /nîr/, /jîr/ û /şîr/ yan zî /dar/, /bar/, /jar/, /war/, /mar/ û /har/ sey sembolê vengandê cîyayan nê bieşnawê, ma nişênê ferqê manaya ênan yewbine ra bîaqitnê.



Yew vate tena zî, xo ser yew mana dîyar nêkeno. Seba ke mana peyda bibo, gerek yew ra vêşêr vateyî goreyê qeydeyê zıwanî pêwa bêrê rêstene, ke na rêstena vateyan ra vajyeno cumle yan zî hevoke. Cumle û rêstena cumle, binya mesacdê ma virazenê. Awayê rêstena hevoke, ca û giraneya vateyan dîyar keno. Feqet veng û vateyê ke sîstemê zıwanî mîyan de ca gênê mutlak nîyê. Rojgaro ke zıwanî peyda bîyê û heta ewro, heme zıwanî hetê veng û vateyan ra bedêlîyayê û peynîya na bedêlîyayene de formê ênan ê cîyay peyda bîyê. Wexto ke ma bala xo bide dîyalektandê kurdî, gelek çekûyî (vateyî) estî ke manaya ênan seycê ya, feqet formê ênan berdêlîyenê. Mîsal; seba nameyê organê (weslê) hilm (bûy) girewtene, ke bi tirkî vanê “burun”, yewindes (11) formê cîyayî estî: “**Vinî, zincî, pîrnike, pîrnos, poz, vinike, difn, bêvil, kepoz, lut, birnax**”[36]; seba veteya “nezle” des (10) formê cîyayî estî: “**zekem, bapêş, persî, şobe, asirm, zikam, peta, miqaw, nezle, baper**”[37] û seba vateya kokî zî diwyes (12) formê cîyayî estî: “**kok, reh, bineke, resen, rêl, rîşe, retewe, binetu, rek, binye, reya, rîçik.**”[38] “Ray rayan yew çekûye tamamî yan zî qismêk aye verapey bena, no hal sebebê gird ê cêrabîyayîşê zıwanê kurdî yo: kin/nik, lêr/rêl, befr/berf, pirasî/ parsû.”[39] Kê şênê nê bêj mîsalan gelek vêşî bikê, labelê bawer kena qandê dîyarkerdişê berdêlîyayena formê vateyan nê mîsalî bes î.

Armanca no birrê xebata ma zî, aşkerakerden û dîyarkerdena tayê form û xosereya umûmî (hemeyî) ya mabêna zazakî û kurmançî ya. Labelê tayê cayan de zî ma do behsê têkilîya zıwanandê hînd-awrupayî û şaxê ênan o hînd-aryanî û kurdî zî bikê.

Bêguman fonetîk, yew beşê muhîm ê xebata zıwanzanistî ya. Etîya de ma do bi hawayêko hera û xorîn fonoljîya zıwanê kurdî ser o nêvinderê. Ma wazenê çarçewa na xebate de tenîya tayê qeydeyê fonetîka dîyalekt û şeweyandê kurdî bîyarê şima vîrî. Ma no nûste de, di hetana behsê fonetîka zıwan û dîyalektandê kurdî kenê. Yew heta, cîyabîyayîş û bedêlîyayîşê vengê navbeyna dîyalekta kurmançî û zazakî bi tayê mîsalana yeno miqayesekerdiş; û heta bîna zî, cîyabîyayîşê fek û şeweyanê zazakî/dimilî/ kirmanckî ser o tayê qeyde û mîsalî ameyê dîyarkerdiş.

## 6.2. Pêbedêlîyayîşê tayê veng û vateyandê dîyalekta zazakî û kurmançî

Sey ke cor de zî ame vatiş, unsurê tewr hûrdî yê zıwanî veng (fonem) o, rayrayan tena bi yew vengî ya û rayrayan zî bi pêgirewtena vengandê cîyayan vateyî peyda benê. Goreyê şewe, dîyalekt û mintiqeyandê cîyayan ê qiseykerdoxandê zıwanî, tayê vengî bi vengandê nêzdîyê xo ya bedêlîyenê yan zî cê ra kemîyenê, peynî de vatey bi xo zî form bedilnenê, rayrayan hîna sivik û sade benê.



6.2. 1. Mabênê gelek vateyandê zazak û kurmancî de vengê /b/, /v/ û /m/ pê bedêlîyenê; cadê “v”ya zazakî de, kurmancî de vengê /b/ û ray rayan zî /p/ yeno.

Zazakî	Kurmancî
vewr	berf
velg	belg
vîst	bîst
vîr	bîr
va/yay	ba
varan	baran
vaz	baz
vela	bela
verapey	berûpaş
virso	birûsk
venikyayîş	ponijîn
zimistan	zivistan
zama	zava
xam	xav

6.2. 2. Tayê cayan de mîyanê şeweyandê kurmancî de zî vengê /b/ û /v/ pê bedêlîyenê.

Mîsal:

cewab                      cewav

kebanî                     kevanî

xirab                        xirav

sibe                         sive

hesab                       hesav

6.2. 3. Vengê /v/ zazakî û kurmancî de zaf yeno xebitnayene lê kurmancîya Verarojî (soranî) de kemî yeno xebitnayene. Kurmancîya verarojî de, cayê herfa /v/ de, /w/ hîna vêşî yeno vatiş. Zazakîya Gêl de zî zaf rayan cadê /v/ de, vengê /w/ yeno vatiş.

Zazakî	Soranî	Kurmancî
aw	aw	av
şew	şew	şev
awan	awan	avan
awî	awî	avî
lew	—	lêv
baw	baw	bav

6.2. 4. Navbeyna zazakî, kurmancî û ziwane Avesta de zî vengê /v/ û /m/ ca bedêlne.

Zazakî	Avesta	Kurmancî
--------	--------	----------

name	naman	nav
nîm/nême	naêma	nîv
zama	zmtar	zava
gam	gama	gav
hamnan	hamin	havîn
zimistan	zyam	zivistan

6.2. 5. Vengê /x/ heme dîyalektanê kurdî de esto û qirike ra vejîyeno. Ziwanê kurdî û dîyalektanê ey de, wexto ke /x/ û /w/ pê dima bêrê, nê her di vengî pêwa sey /xw/ telafuz benê, ke tira vajyeno *dîftong*. Zaf vateyê ke bi dîftongê /xw/ dest bide kenê, zazakî de sivik benê û vengê /x/ yê vernîya /w/yî de keweno.

**Kurmancî****Zazakî (Dimilî)****xwar**

wer

**xwarin**

werden

**xweş**

weş

**nexweş**

nêweş

**xwelî**

wele

**xwah**

waye

**xwendin**

wendene

xweyî weyî

6.2. 6. Vengê /j/ya kurmancî, bi vengê /z/ û /c/ya zazakî û ziwane Avesta pê bedêlîyenê, ge benê /c/ û ge ge zî benê /z/. Nê vengî, mabênê şeweyandê zazakî bi xo de zî bedêlîyenê.

Kurmancî	Zazakî	Avesta
jêr	cêr	–
jin	cinî/ cenî	canay
jentin	cena! cenayene	cana
bêj	vac	vaçah
roj	roj-roz-ruz	–
jî	zî	zî
mejî	mezg	mazga

6.2. 7. Vengê /h/ya kurmancî, ziwane Avesta de bi dîftongê /dh/, /th/ û vengê /x/ rey de bedêlîyenê, zazakî de zî vengê /h/ û /ş/ pê bedêlîyenê.

Kmancî	Avesta[40]	Zazakî
rohnî	raoxşna	roşna/roşnayî
sihur/sor	suxra	sur
reh/rê	raithya	rayir
pahtin	pathana	pewtene

goh/go	gaoşa	goş
mih/mî	maêşa	mêşna
tihnî	tarşna	têşanê

6.2. 8. Mîsalandê corênan de zî aşkera aseno ke vengê /h/, vengêdo kehan ê dîyalektandê kurdî yo. Kurmancî û zazakîya ewroyîne de, hem /h/yê sereyê vateyan û hem zî ê mîyanê ênan de kiweno û vetey sivik benê.

Kurmancî	Zazakî
fireh/fire	hambaz/ambaz
şeh/şe	hestor/estor
goh/go	havi/avil
mih/mî	herê/erê
hêş/êş	herey/erey
hêvar/êvar	heynî/eynî
dergahvan/dergavan	hewnîya/ewnîya
mêhman/meyman	mêhvan/mêvan
mirhov/mirov	
rehwan/rewan	
bihên/bîn	

6.2. 9. Yewna xusûsîyeto balkêş ê kurmancîya corî, kurmancîya cêrî (sorani) û zazakî esto ke, kê eşkenê vajê xusûsîyetêko kehan ê ziwane kurdî yo. Vengê /d/ yê peynîya nameyan û halê vîyarte yê karan, dîyalekta zazakî û kurmancîya verarojî (sorani) de xo paweno, feqet kurmancîya corî de kewto û kelîma bîya sivik.

Zazakî	Kurmancîya verarojî	Kurmancîya corî
kerd	kird	kir
kerdene	kirdin	kirin
berdene	birdin	birin
werdene	xwardin	xwarin
sard	sard	sar
pirid	pirid	pir

6.2.10. Mabênê zazakî û kurmancî de vengê /d/, /v/ û /g/ zî pê bedêlîyenê. Michael L. Chyet zî vano: "Pîta /g/ya kurmancî vera /v/ya zazakî û /w/ya hewramî ya."[\[41\]](#)

Zazakî	Kurmancî
va/vat	go/got
vatene	gotin
deng	veng
verg	gurg
vil	gul

veleke gurçik

6.2. 11. Bi vatena Michael L. Chyet, “Vengê r û d bîyê l, z û r zî bi veyartena wextî ya benê l. Na pê bedêlîyayena r û d yê ke bîyê l, hem seba kurdî û hem zî seba farisî raşt a.”[42]

Zazakî	Kurmancî	Farisî
zerr	dil	del
çar/çewres	çil/çihel	çehel
zana	zana	dâna
sare/serre	sal	sal
serdar	serdar/salar	salar

6.2. 12. Kurmancî de vengê /d/ yê ke demeyo nikayin de seredê tayê karan de yeno nûstiş, bi vengê /t/ ya bedêlîyenê: **derim/terim, dixum/texum, dikim/tekem.**

6. 2. 13. Mabênê dîyalekt û şeweyê kurmancî û zazakî de vengê /y/, /w/ û /h/ pê bedêlîyenê. Nê vengî wezîfeyê pêgirewtene zî vînenê.

Zazakî	Kurmancî
giya	giha
siwar	siyar
wûrdek	hûrdek
hûrdî	hûr
wirdî/her di	herdu

wişk                      hişk

wiro                      herro

6.2.14. Tayê cayan de zî “vengê /e/ bedêlîyeno beno /y/: esîr/yesîr, exte/yexte/”[43]

6.2.15. Hereketê “kelkewten” û “herikyayene” bi vengandê l-, r-, s-, ya taswîr benê.[44]

**Zazakî**                      **Kurmancî**

laser                      lehî

pêl                      pêl

lêl                      şêlo

liv                      liv

ling                      ling

rem                      rev

herik                      herik

ray                      rê

rayan                      rêwî

rişna                      rijand

neseb                      neseb

ro                      robar



rokerdene                      rokerdiş

pilor                              pilor

6. 2.16. Hem navbeyna zazakî û kurmancî de hem zî navbeyana şeweyandê zazakî de vengê /ş/, /s/ û /j/ pê bedêliyenê.

**Zazakî**                      **Kurmancî**

raşt                              rast

rişte                              riste

rişt                                rist

riştên                            ristin

rişna                              rijand

7. **Pêbedêlyayîşê tayê vengênê şeweyandê zazakî**

8. 1. Sey şeweyandê kurmancî, şeweyandê zazakî de zî vengê /b/ û /v/ pê bedêliyenê.

**Mirdasî(Pîran-Gêl)**                      **Dersim**                      **Çewlig (Bîngol)**

hesab                              hesav                      hesav

kitab                                kitav                      kitav

yewbin                              zuvin                      yobîn/juvin

xirabe                                xirave                      xirawe

7.2. Mabêna şeweyandê zazakî/dimilî de vengê /z/, /j/, /y/ û /ç/ pê bedêliyenê. Seke Celadet Ali Bedir-Xan zî vano: “Lehçeya dumilî de zî çend birrî estî, nê birran mîyan de zî bi hawayêko aşkera

ferqê mabêna veng û qaydeyan estî. Hetê vengana şêweyê Sêwreke de herfa /j/ bi qasê kurmanckî çinî bo zî, tayê çekuyan de no veng yeno dîyayîş. La şêweyandê bînan de sey şêweya Paleyî, vengê /j/ bin ra çinî yo û cayê ey de vengê /z/ yan zî /ç/ yeno vatene.”[45]

Mîsal: zî/ jî

mij / miz

nêzdî / nijdî

mizgîn/ mijdane

roj / roz/ruc

berzîn/ berjîn

zewac/zewaz

yewbin/jewbin/zuin

yewna/jewna

ziwa/jiwa

jew/yew

7. 3. Mabêna şêweya Dêrsim û mintiqandê bînan de vengê /k/ û /ç/ pê bedêlîyenê.

**Pîran-Gêl-Çermûg**

**Dêrsim**

keye

çeye

keyna

çeyna

keber/ber                      çeber

kêf                              çêf

7.4. Vengê /ş/yê cayandê bînan, şêweya Dêrsimî de beno /s/.

Mîsal: şenik / senik

weş / wes

derguş / dergus

şeş / ses

şima / sima

şew / sew

7.5. Mabêna şêweyandê zazakî de vengê /c/ û /g/ zî pê bedilyenê.

Mîsal:

veng/venc

Gan/can

gêno (girewotiş)/cêno

bigîr/bicî

gêrayene/cêrayene

7.6. Hem mabêna şêweyandê zazakî û hem zî mabêna zazakî û kurmancî de vengê /a/, /û/, /o/ û /u/yî pê bedilîyenê.

Mîsal:

ban/bon/bûn

manga/monga (moga/munga)

maker/moker/mûnker

giran/giron/girûn

panc/ponc/ponj/pûnc

varan/varon/varûn

7.7. Vateyê zazakî zaf rayan bi hawayê xo yo sade nê, bi pabesteyê xo yê *nerîyîye* û *makîyîye* yenê nûstîş û bîlhesa zî vateyê makî winî yenê nûstene. Ke ma raştê no hawa nûstîşê çekûyan ameyê, gerek ma halê sade yê vate û pêrebesteyê aye têmîyan nêkê.

Mîsal:

**Zazakî**

**Kurmancî**

dar/dare

dar

dew/dewe

gund

şew/şewe

şev

biz/bize

bizin

her/here (mankere)

ker

par/pare

par

7.8. Seke ma cor de zî dîyar kerd, senî ke navbeyna her di dîyalektanê kurdî de vengê /l/ û /r/ bedêlîyeno, navbeyana şêweyandê zazakî bi xo de zî vengê /l/ û /r/ bedêlîyeno.

Mîsal: mîrçike/mîlçike

rojine/lojine

zerr/dil/dill/zil/şêzil

velg/berg

emserr/emsal

belûy/berûy

çiray/çilay

perçîn/pelçîn

qereçî/qeleçî

[1] Prof. Dr. Doğan Aksan, *Her Yönüyle Dil*, Türk Dil Kurumu Yayınları, 5. Baskı, Ankara, 1995, r. 145

[2] Ludwig Paul, *1. Uluslararası Zaza Dili Sempozyumu*, Bingöl Üniversitesi Yayınları, 2011, r. 20

[3] F. De. Saussure, Neqilkerdax: Prof. Dr. Doğan Aksan, *Her Yönüyle Dil*, Türk Dil Kurumu Yayınları, Ankara, 1995, r. 146

[4] “Belgeyê tewr kehên ê grûba hind-îranî, belgeyandê Mîtanîyan mîyan ra vejîyayê. Mîtanîyan, vakurê Mezopotamya de, nîzdî 1500 serrî verê bîyayîşê Îsayî dewletêk viraşt bî.” (Korhan Kaya, Hindistan’da Diller, İmge Yay., 2005, r. 70)

[5] No nûste de kelîma “**kurdî**”, cayê “kurdîya kehêne” û dîyalektanê kurdî de ameya nûstîş. Etiya de wexto ke ma vanê “kurdî”, qestê ma, hem kurdîya kehên a û hem jî zar û lehçeyê ke kurdîya tewr verên ra peyda bîyê; sey kurmancî, kirmanckî (kirdkî/ zazakî/ dimilî), soranî, hewramî, goranî, lurî, kelhurî û ayê bînî yê.

[6] Zuhdi El Dahoodî, *Kürtler: Tarih Kültür ve Yaşam Mücadelesi*, Deng Yayınları, r. 162

[7] Ziya Gokalp, *Kürt Aşiretleri Hakkında Sosyolojik Tetkikler*, Sosyal Yayınları, Nisan 1992, r. 27

[8] Mela Ehmedê Xasî, *Mewlûdê Nebî*, Fırat Yayınları, İstanbul, 1994, r. 42

[9] Malmisanij, *Kird, Kirmanc, Dimilî veya Zaza Kürtleri*, Deng Yayınları, İstanbul, 1996, r. 11

[10] Dr. Nûrî Dersimî, *Kurdistan Tarihinde Dersim*, Doz yayınları, İstanbul, r. 65

[11] Kemal Badilli, *Türkçe İzahli Kürtçe Gerameri (Kurmançça Lehçesi)*, Dipnot: 2, Med Yayınları, r. 22

[12] Izady, Mehرداد R, *Bir el Kitabı Kürtler*, Doz Yayınları. r. 299

[13] *İslam Ansiklopedisi*, Cilt: 6, r. 1112

[14] Şeref Xan, *Şerefname*, Hasat yayınları, 4. Bask, 1990, r. 21

[15] Robert Olson, *Kürt Milliyetçiliğinin Kaynakları ve Şeyh Said Ayaklanması*, Özge yayınları. Ankara, 1992, r. 145-46

[16] Malmisaniy, *Kird, Kirmanc, Dimilî veya Zaza Kürtleri*, Kasim 1996, Deng Yayınları, b. notê binên ê 153, r. 11

[17] Nazmî Sevgen, *Zazalar ve Kızılbaşlar: Coğrafya-Tarih-Hukuk-Folklor-Teogoni*, Kalan Yayınları, Ankara, r. 34

[18] Hayri Başbuğ, *İki Türk Boyu: Zazalar ve Kurmanclar*, Türk Kültürünü Araştırma Enstitüsü, Ankara-1984), r. 17-33

[19] Şeref Xan, *Şerefname*, Hasat, 4. Baskı, İstanbul,1990, r. 20, Sewbî zî b.: Mc. Carus-Minorsky, *Kürtlerin Menşei ve Kürt Dili İncelemeleri*, Sönmez Neşriyat ve Matbaacılık, İstanbul,1963, r. 48

[20] Martîn Bruinessen, *Studia Kurdica, Onyedinci Yüzyılda Kürtler ve Dilleri: Kürt Lehçeleri Üzerine Evliya Çelebi'nin Notları*, hej: 1-3, weşanên Enstituya Kurdî ya Parîsî, Nîsana 1985, r. 18

[21] M. Emin Zekî Beg, *Kürtler ve Kurdistan Tarihi*, 4. Baskı, , çev.: Vahdettin İnce, Mehmet Dağ, Reşat Adak, Şükrü Aslan, Nûbihar Yayınları, İstanbul, 2012, r. 297

[22] Neqilkerdox: Bilal N. Şimşir, *Kürtçülük(1787-1923)*, Bilgi Yayınları. 3. Baskı, İstanbul/ 2009, r. 519

[23] M. Emin Zekî Beg, *Kürtler ve Kurdistan Tarihi*, 4. Baskı, çev.: Vahdettin İnce, Mehmet Dağ, Reşat Adak, Şükrü Aslan, Nûbihar Yayınları, İstanbul, 2012, r. 290

[24] Ziya Gokalp, *Kürt Aşiretleri Hakkında Sosyolojik Tetkikler*, Sosyal Yayınları, Nisan 1992, r. 27

[25] Mehmed Mîhrî (M.M), *Mukaddimet-ül İrfan*, Necmî İstikbal Metbası, İstanbul, 1918, bew. <http://www.kovarabir.com/> mehmet-mihrim-m-mukaddimet-ul-irfan/, 15/06/2013

[26] Emîr Celadet Bedirxan, & Roger Lescot, *Kürtçe Dilbilgisi*, Doz Yayınları, İstanbul, 1997, r. 9

[27] Kemal Badilli, *Türkçe İzahli Kürtçe Gerameri (Kurmançça Lehçesi)*, Med Yayınları, 2. Baskı, İstanbul, 1992, r. 22, 23

[28] Prof. Maruf Xeznedar, *Zimanê Kurdî*, <http://www.kovarabir.com/dr-maruf-xeznedar-zimane-kurdi/>, 17/06/2013

[29] Qanatê Kurdo, *Gramera Zimanê Kurdî (Kurmançî-Soranî)*, Koral Yayınları, İstanbul, 1990, r. 7

[30] Peter J. A Lerch, *Forschungen über die kurden und die iranischen Nordchaldar*. Band I, St. Petersburg 1857, r. 78

[31] bn., Lerch, Peter J. A.: *Forschungen über die kurden und die iranischen Nordchaldar*. r.: 80-81. Band I St. Petersburg 1857

[32] Joye Blau, *Kürtçe Dilbilim ve Sözlük Çalışmaları, Studia Kurdica*, No:1-3, Paris, Nisana 1985, r. 65

[33] Kurdîyê Bîtlîsî, *Jîn*, hej: 14(1919), wer.: M. Emîn Bozarslan, Weşanxaneya Deng, Sweden,1985

[34] Mehmet Rifat, *XX. Yüzyılda Dilbilim ve Göstergebilim Kuramları*, Kuram Yayınları, 2000, İstanbul, r. 44

[35] Zeynel Kıran, *Dilbilim Akımları*, Onur Yayınları, 1996, r. 27

[36] Seîd Veroj -Uçaman Abdurrahman, *Ferheng-Vajname: Kurmançî-Hewramanî-Dimilî-Senendajî*, weşanên War, 2002, İstanbul, r. 146

[37] ç. v. r. 146

[38] ç. v. r. 202

[39] Mihemed Mîhrî Hîlav, *Mukaddimet-ûl Îrfan*, <http://www.kovarabir.com/mehmet-mihrim-mukaddimet-ul-irfan/>



[40] M. Siraç Bilgin, *Zarahuştra Gathalar*, Doz Yayınları, İstanbul, r. 170-184

[41] Michael L. Chyet, *Rûpelek ji dengsazîya dîrokî ya zimanê kurdî*, kovara *Bîr*, hej.: 3, 2005, r.109

[42] J. b., r.110

[43] Mihemed Mîhrî Hîlav, *Mukaddimet-ûl Îrfan*, <http://www.kovarabir.com/mehmet-mihrim-m-mukaddimet-ul-irfan/>, 12/03/2013

[44] Walter Porzîng, *Dil Denen Mucize*, cild: 1, Kültür Bakanlığı Yayınları, Ankara, 1990, r. 21

[45] Celadet Alî Bedirxan, *Hawar*, h.: 23, çapakerdişê weşanê *Nûdem*, Stocholm, 1998

## Ferhengeke kurdî ji sala 1884



*Beiträge zum kurdischen Wortschatze*

(Hevkarî bo xezîneya peyvên kurdî)

ferhengekeke zimannasê alman A. **Houtum-Schindler** e ku sala 1884 di kovara Komeleya Almanî bo Vekolînên Rojhilatî (*Zeitschrift der Deutschen Morgenländischen Gesellschaft*) de hatiye belavkirin.

Berhem ji 75 rûpelan pêk tê ku nêzîkî 55

rûpelan ferhengok e û 20 rûpel jî

kurteşiroveyên li ser rêzimanê ne. Wergerên peyvan û şiroveyên rêzimanî bi almanî ne.

Houtum-Schindler peyvên ferhengoka xwe li Rojhilatê Kurdistanê û li Xorasanê berhev kirine. Ew ne ji lehceyekê bi tenê ne lê ji çendîn devok û zaravayan hatine berhevkirin. Tê de hem peyvên kurmancî, hem soranî, hem kelhurî û hem jî goranî hene. Lê piraniya peyvên Houtum-Schindler bi xwe berhevkirî ji soraniya mukrî ne. Peyvên ji kurmancî ji Xorasanê ne lê wî herwiha gelek peyv ji ferhenga kurmancî-fransî ya **Ferdinand Justi** jî neqlî ferhengoka xwe kirine.

Houtum-Schindler ihtimalen yekem kes e ku di ferhenga xwe de cih daye peyvên ewqas lehceyên kurdî. Wî herwiha li ber her peyvê herwiha diyar jî kiriye ka peyv ji kîjan devokê yan deverê hatiye wergirtin ku ev jî diyardeyeke ferhengsazî ye ku di kurdî de berî Houtum-Schindler nehatibû kirin û gelek caran piştî wî jî hatiye piştguhkirin.

Herwiha Houtum-Schindler yekem kes e hewl daye hin agahiyên etîmolojîyê li ser peyvên kurdî bide. Bo nimûne, wî li ber peyvên wî bi xwe berhevkirî yên ne-kurmancî herwiha hevrehên wan yên kurmancî ji ferhenga Justi neqil kiribe ber wan û li ber piraniya serpeyvên xwe hewl daye ku hevrehên wan yên farisî jî pêşkêş bike.

Ev ferhengok bo vekolînên zimannasî baş e. Lê bo bikarînerên "sade" yê ferhengan ew baş bi kêr nayê ji ber ku her çend peyv ji deverekê yan lehceyekê ne û hebûna yan tinebûna peyvên di ferhengokê de hema-hema bi tesadîfî ye, ne li gor berbelavî û mişetiyê peyvên di zimanê kurdî de ye.

Heta ber bi dawiyê sed sala bêstem, ferhengoka Houtum-Schindler tekane ferhenga kurdî-almanî bû.

<https://zimannas.files.wordpress.com/2017/03/beitrc3a4ge-zum-kurdischen-wortschatze.pdf>

## CINSÊ RÊZIMANÎ

Cinsê rêzimanî anku zayenda rêzimanî (mêyîtî û nêrîtî) yek ji mijarên serekî yên rêzimana kurmançî ye. Her navdêra kurmançî bi zerûrî yan mê ye yan jî nêr e yan jî herdu ye. Ji ber vê giringiya mijarê, hem kurdan bi xwe û hem jî gelek zimannasên biyanî qelem girtiye û li ser vê mijarê nivîsiye.<sup>11</sup> Min bi xwe jî berê dest avêtiye mijareke sinorkirî ya cinsê rêzimanî: cinsê heywanan yê rêzimanî.<sup>12</sup>

Di nivîsên bi kurdî yên derbarê cinsê rêzimanî de, giranî li ser wê bûye ka çi peyv mê ne û çi jî nêr in.<sup>13</sup> Kêmtir pûte û giringî bi wê hatiye dan ka cinsê rêzimanî di kurdî de çawa tê bikaranîn, kengî diyar e û kengî veşartî ye, çawa peyda bûye û çawa diguhere, têkiliya wî li gel zimanên kevn yên îranî û zimanên nû yên cîran û çawa ye.

Ev nivîs hewl dide ku bersiva hin ji van pirsan bide. Bersiva van hemû pirsan niha li ba min peyda nabe. Lê ji bilî bersivdanê, pêşkêşkirina hin pirsan jî giring e tevî ku niha bersiv ji wan re tine be.

Di rêzimannameyên kurdî de, li cihê peyva *cins*, gelek caran peyva çêkirî *zayend* tê bikaranîn lê peyva *cins* di kurdî, erebî, farisî û tirkî de ji aliyê hemû xwendevanan ve tê zanîn, fehmkirin û gotin. Sebebê bikarneanîna vê peyvê ji aliyê gelek rêzimannasên kurdî ve ew e ku ev peyv ji erebî ketiye kurdî. Lê eslê peyvê ne erebî ye lê erebî ew bi rêya aramî ji yûnanî *gênos* wergirtiye ku di latînî de jî wek *genus*

---

Bi kurdî mirov dikare kitêba Deham Ebdulfettah *Nav di zimanê kurdî de: kurmançiya jorîn*, Spîrêz 2006 bide: <http://www.kurdlib.org/rwdx/sitepdf/B1118.pdf> Bi inglîzî yek ji nivîsarên vê dawiyê ya Geoffrey Haig û Ergin Öpengin *Gender in Kurdish Structural and socio-cultural dimensions* [http://www.academia.edu/6001901/Gender\\_in\\_Kurdish\\_Structural\\_and\\_socio-cultural\\_dimensions](http://www.academia.edu/6001901/Gender_in_Kurdish_Structural_and_socio-cultural_dimensions)

Husein Muhammed: Cinsê heywanan yê rêzimanî: <https://zimannas.wordpress.com/2015/07/06/cinse-heywanan-12-ye-rezimani/>

Ji bilî kitêba Deham Ebdulfettah ya di jêrnota yekem de navborî, mirov dikare herwiha pirtûka *Zayenda mê û nêr* ya <sup>13</sup> nivîskareke bi hunernavê Keça Kurd bide: [http://uz-translations.net/engine/includes/print.php?category=iranian-irbooks&altname=feminine\\_and\\_masculine\\_in\\_kurdish\\_zayenda\\_me770\\_u770\\_ne770r](http://uz-translations.net/engine/includes/print.php?category=iranian-irbooks&altname=feminine_and_masculine_in_kurdish_zayenda_me770_u770_ne770r)

û *jenes* ya sanskrîtî ye. Peyva latînî bi rêya fransî *gendre* wek *gender* bi maneya *cins* ketiye inglîzî jî û di rêzimanên bi inglîzî de li kar e. Wek qedir û qîmet bo tarîxa vê peyvê û ji ber bernasiya wê di nav kurdan de, em ê peyva *cins* beramberî peyva çêkirî *zayend* bi kar bînin.

### CINSÊ SIRIŞTÎ Û CINSÊ RÊZIMANÎ

Di tebîetê de mirov û heywan du cins in: mê û nêr. Di rêzimana zimanên cuda de hejmara cinsan dikare yek be (*bêcins*), du, sê yan – wek prensîp – bêsinor be. Gelek ziman û heta binemalên zimanan jî (bo nimûne zimanên altayî û uralî) bi temamî *bêcins* in (*mînak tirkî û fînlendî*). Di zimanên *bicins* de, adeten du cins hene, nêr û mê (bo nimûne kurdî, erebî û fransî) yan jî *giştî û nêtar* anku *notir* (bo nimûne *swêdî*). Lê di gelek zimanan sê cins hene: nêr, mê û nêtar (bo nimûne *almanî, avestayî û latînî*).

Wek prensîpeke bingehîn, mirov yan heywanên bi siriştî anku *xwezayî* mê bin, bi rêzimanî jî mê ne. Bo nimûne, *jin, keç, bizin, mih, çêlek* hem di *xwezayê* de û hem jî di rêzimana kurmancî de mê ne. Bi heman awayî *mêr, kur, beran, ga* hem di *xwezayê* de û hem jî di rêzimana kurmancî de nêr in. Di zimanên din de jî adeten lihevkerineke wiha di navbera cinsê siriştî û cinsê rêzimanî de heye.

Lê cinsê siriştî û cinsê rêzimanî herdem hev nagirin. Bo nimûne, di *biratî* û *mêranî* di siriştê de xusûsiyeteke *mêran* in lê di rêzimana kurmancî de *peyveke* mê ne. Li aliyekî din, *quz* di siriştê de *endamekî leşê jinan* e lê ji aliyê rêzimanî ve di kurmancî de *peyveke* nêr e. Di siriştê de hin *mişk* nêr û hin jî mê ne lê di rêzimana kurmancî de ew *tenê nêr* in. Di siriştê de hin *mêş* mê û hin jî nêr in lê li gor rêzimana kurmancî ew herdem mê ne.

Heman lihevnekirina cinsê siriştî û cinsê rêzimanî di zimanên din de jî peyda dibe. Bo nimûne, *keç* di siriştê de mê ne lê peyva *almanî* ya bi wê maneyê *Mädchen* nêtar e anku ne mê ye û ne jî nêr e.

### CINSÊ RÊZIMANÎ DI ZIMANÊN LÊZIM Û CÎRAN DE

Di makezimanê proto-hindûewropî de sê cins hebûn: nêr, mê û nêtar. Heta îraniya kevn jî (bo nimûne *avestayî*) ev her sê mabûn. Di zimanên niha yên îranî de sê cinsên rêzimanî nemane. Di hinan

de du mane, bo nimûne di kurmancî, zazakî û peştûyî de. Di hinan de jî cins bi temamî ketiye: bo nimûne ji farisî, ji kurdiya başûrî û bi piranî ji soranî jî.

Di nav zimanên din jî yên hindûewropî de rewş ji hev cuda ye. Di almanî de sê cins mane, di fransî de du û di inglîzî de ti neman.

Ji nav zimanên cîranên kurdî, di tirkî û lêzimên wî de (azerî, tirkmenistanî, ozbekî...) de ti caran cinsê rêzimanê tine bûye. Di zimanê ermenî de, ku ew jî wek kurdî ji hindûewropî ye, cins nemaye. Di herdu zimanên samî yên cîranên kurdî de, anku di erebî û aramî de, ducinsî (nêr û mê) heye û berbelav e.

### ÇI PEYV MÊ NE, ÇI NÊR IN?

Me li pêştir diyar kiriye ku tiştên di siriştê de nêr, navên wan di rêzimanê de jî adeten – lê ne herdem – nêr in. Tiştên di siriştê de mê jî, navên wan di rêzimanê de adeten mê ne.

Lê piraniya navdêran di hemû zimanan de navên tiştên wisan in ku di siriştê de ti cins nînin. Tenê mirovan û piraniya heywanan cinsê siriştî heye. Gul û giyayan, dar û beran, gund û bajar, banî û bînyan ti cinsê siriştî nîne.

Lê d hin haletên rêzimanî de, bi zerûrî divê her navdêra kurmancî cins hebe. Bo nimûne, her cara ku mirov bi kurmancî bibêje “filan tiştê min”, divê mirov cinsekî li wî tiştî bar bike:

- destê min (nêr)
- pişta min (mê)
- hevala min (mê)
- hevalê min (nêr)

Gelo hin rê û rêbaz hene ku mirov bizane filan navdêra kurmancî mê ye yan nêr e bêyî ku xwe ji ferhengekê yan cihekî din hînî cinsê wê peyvê bike?

Ne di kurdî de û ne jî di piraniya zimanên din yên cinsdar de ti rêberiyê mutleq nîne ku herdem mirov bê hînbûnê bi cinsê peyvê bihese. Lê di kurmancî de jî çend rêbaz hene ku dikarin bi piranî alîkariya mirovî bikin.

### Peyvên mê:

- 1) Eger mirov tevahiya peyvên zimanê kurmançî bihesibîne, cinsê mê bi piraniyeke berçav ji cinsê nêr serdesttir e anku piraniya peyvên kurmançî mê ne.<sup>14</sup>
- 2) Hemû lêkerên navdêrkirî mê ne: *xwandina kitêban, xwarina sêvan, gotina wî...*
- 3) Hemû navdêrên ji rengdêran (yan navdêrên ji navdêrên rengdêrkirî) çêkirî mê ne: *azadî, mezinahî dostanî, biratî...*
- 4) Navên hemû dewletan, welatan, bajaran û gundan mê ne.
- 5) Piraniya fêkî û sebzeyan (lê bo nimûne *xîyar, tivir, tilozî...* nêr in.)
- 6) Hema-hema hemû peyvên vê dawiyê ji zimanên ewropî hatî wergirtin dikarin bi cinsê mê bên bikaranîn.

### Peyvên nêr:

- 1) Piraniya peyvên ji mêj ve di zimanî de li kar:
  - a. Piraniya endamên leşî: *ser, çav, dev, didan, guh, ziman, dest, mil, mû, zik, kîr, quz* lê ne hemû (çend nimûne ji yên mê: *lêv, gulçîsk, pişt, qûn, gep/alek*) û herwiha hin jî li gor devokan diguherin: *sîng, por, poz, pirç...*)
- 2) Gelek peyvên giştî wek *gund, bajar, welat* tevî ku navên gundan, bajaran û welatan yên taybet mê ne jî.

### COTCINSÎ

Di kurmançî de gelek peyv hene ku cinsê wan li gor rewşê diguhere:

(a) doktora didanan

---

Heta niha lêkolîn li ser rêjeya peyvên nêr û yên mê di kurdî (kurmançî yan zazakî) de nehatine kirin. Diyar kirina <sup>14</sup> rêjeya wan ne hêsan û ne sade ye jî. Bo nimûne, gelo em rêjeyê li gor peyvên di ferhengan de hene diyar bikin yan jî yên di nivîsên rojane de, ecebe em tenê peyvên xwerû bihejmêrin yan jî yên pêkhatî (hevedudanî, compound) jî? Lê rêjeya peyvên mê di kurdî de hind ji nisbeta peyvên nêr mezintir e ku ti guman jê namîne ku mêyîtî di kurmançî de zal û serdest e. Bo nimûne, di mezintirîn ferhenga kurdî, di Wikîferhengê de, li havîna sala 2015 nêzikî 49.000 navdêr hene. Ji van 42.000 mê ne û tenê nêzikî 3.400 nêr in (cinsê yên din nehatiye diyarkirina yan jî cotcins, wek "heval, mirov, mamoste...): [https://ku.wiktionary.org/wiki/Kategor%C3%AE:Navd%C3%AAr\\_\(Kurd%C3%AE\)](https://ku.wiktionary.org/wiki/Kategor%C3%AE:Navd%C3%AAr_(Kurd%C3%AE)).

(b) doktorê didanan

Di nimûneya (a) de doctor jin e, di ya (b) de mêr e. Peyva “doktor” di kurdî de cotcinsî ye: heman peyv dikare hem bo jinan û hem jî bo mêran were bikaranîn. Di haletê xwerû de ne diyar e ka mebest jê jin e yan mêr e (kontekst dikare diyar bike:

- Ew doktor e.

Mebest ji hevoka “ew doktor e” dikare jinek be (a) yan jî mêrek be (b):

- Azad doktor e.
- Jiyan doktor e.

Di gelek zimanên din yê ducinsî de, di haletên wiha de du peyvên cud abo jin û mêran hene. Bo nimûne:

erebî:

- a) Azad t̤ebîb.
- b) Jiyan t̤ebîbe.

Yan jî bi almanî:

- a) Azad is Arzt.
- b) Jiyan ist Ärtzin.

Yan jî bi zazakî:<sup>15</sup>

- a) Azad doktor o.
- b) Jiyan doktor a (ji “\*Jiyan doktore ya”).

---

Hevokên zazakî ji aliyê kekê hêja Hasan Aslan ve hatine kontrolkirin û ez spasdarê wî me. Helbet ji her kêmasiya <sup>15</sup> mihtemel tenê ez bi xwe berpirsiyar im.



Ji bilî peyvên malbatî<sup>16</sup>, piraniya peyvên civakî, siyasî û pîşeyî<sup>17</sup>, yê ku amaje bi mirovan dikin, cotcinsî ne: heman peyv bo jin û mêran li kar e lê li gor cinsê kesa/ê ku armanc e, cinsê mê yan nêr li peyvê tê kirin di rewşa çemandina yan girêdana peyvê bi peyvên din ve:

- heval, dost, serok, birêveber, mamoste...

Heta peyvên civakî yê serdema feodaliyê yan jî peyvên dînî jî dikarin wek mê jî bên bikaranîn tevî ku adeten kesên xwedî wan pîşe û pileyan mên in:

- axaya gundê wan
- melaya mizgeftê

## BERGEHA CINSÎ DI RÊZIMANA KURMANCÎ DE

Gelek caran tê gotin ku ducinsîti (mê û nêr) muhreke gelek giring ya “zimanê kurdî” ye. Lê wek me li jor diyar kiriye, ducinsîti ne muhra hemû kurdî ye lê muhra kurmancî û zazakî – û herwiha hewramî jî ku me li jor behs nekiriye.

Di zazakî û hewramî de bergeha ducinsîtiyê gelek berfireh e. Di haletên çemandî û neçemandî yê navdêran de di rewşa yekhejmariyê de berçav e.<sup>18</sup> Di zazakî de cudakirina cinsî ji bilî navdêran, herwiha di cînavan, rengdêran, lêkeran û heta hejmaran de jî (tenê hejmar “yew/jew, ju” anku “yek”) peyda dibe.

Di kurmancî de cudakirina cinsê rêzimanî ji zazakî û gelek zimanên din jî bisinortir e.

- 1) Lêker di li gor cinsê xwe naguherin: *Jin/mêr hat, jin/mêr naçe, jin/mêr dê were.*<sup>19</sup>

---

Bo peyvên malbatî di kurdî de, binêrin: Husein Muhammed: Peyvên malbatî çi ne û ji kû tên? <sup>16</sup>

<https://zimannas.wordpress.com/2015/07/03/peyven-malbatî-cî-ne-û-jî-ku-tên/>

Hin peyvên ji zimanên din wergirtî du formên cuda bo mêr û jinan parastine: “melik, qiral, şah, aktor, ?dansor” bo <sup>17</sup> mêran, “melike, qiralîçe, şahbanû, aktrîs, dansoz” bo jinan lê di peyvên xwemalî de cudakirineke wiha nîne.

Di ti zaravayên kurdî de di rewşa pirhejmariyê de cudahî di navbera nêr û mêyan de nayê kirin. Lê cudakirina nêr û <sup>18</sup> mêyan di rewşa pirhejmar de jî di gelek zimanan de heye. Ji nav zimanên îranî peştûyî tekane nimûne ye lê heman cudahî di navbera erebî, almanî, fransî, spanî û gelek zimanên din jî tê kirin.

Dema niha ya berdest li gor hin devokan pirtika “a” bo jinan û ya “ê” bo mêran bi kar tine: “ez a dixwim” (jinek <sup>19</sup> dibêje) û “ez ê dixwim” (mêrek dibêje).

- 2) Rengdêr tenê di rewşa navdêrî de li gor cinsê xwe tên cudakirin: *mezina wan, mezinê wan*. Wek din rengdêr li gor cinsê naçemin, ji xwe li gor hejmarê jî naçemin: *keça bas, kurê baş, mirovên baş*.
- 3) Ji cînavan tenê yê sêyem yê yekhejmar ducinsî ye: *wê jinê, wî mêrî*. Wek din “ez, tu, em, hûn, ew (pirhejmar)” û formên wan yên çemandî “min, te, me, we, wan” bo herdu cinsan eynî ne.
- 4) Ji hejmaran ya “yek” cotcinsî ye anku dikare li gor amajeyê nêr yan mê be. Hejmarên din jî eger wek navdêr û yekhejmarî bên bikaranîn, dikarin cinsekî wergirin ku li gor devokên cuda dikare mê yan nêr be. “Wê sedê / wî sedî bide min” (Sed ewro/dolar/lîre/dînar...)
- 5) Navdêr tenê di rewşa çemandî yan girêdayî de ya yekhejmar de cinsê wan diyar dibe. Di pirhejmariyê de ew bê cins in. Peyvên amajeyî mirovan dikin, bi piranî cotcins in anku cinsê wan li gor cinsê kesa/ê amajepêkirî diyar dibe. Di girêdana peyvên di rewşa yekhejmar ya nediyar de jî cudane kirina cinsî mimkin e: *hevalek min* (li cihê *hevalekî min* ku nêr e yan *hevaleke min* ku mê ye.)
- 6) Daçek û hoker, wek piraniya zimanên din, di kurmancî de jî bêcins in.
- 7) Di cînavên bi daçekan ve kirî de (pê, jê, lê, tê) de cins (û hejmar jî) hatine yekkirin: *pê* (bi wê/wî/wan), *jê* (ji wê/wî/wan), *lê* (li wê/wî/wan)...

## CINSÊ PEYVÊN WERGIRTÎ

Hin peyvên kurdî yên bi eslê xwe biyanî ji hin zimanan hatine wergirtin ku du- yan sêcinsî tê de heye. Bo nimûne, erebî – ku gelek peyv jê ketine kurdî – xwedî du cinsên rêzimanî ye. Peyvên ji erebî hatî carinan cinsê xwe yê erebî di kurdî de jî diparêzin lê carinan jî cinsê wan diguhere. Bo nimûne, peyvên *kitab* (kitêb) û *qanûn* di erebî de nêr in lê di kurmancî de bûne mê. Berevajî wan, peyva *cere* (cerr, cerrik) di erebî de mê ye lê di kurmancî de bûye nêr. Peyva *qelem* ya esil-yûnanî bi rêya erebî ketiye kurdî. Di erebî de ew nêr e, di kurmanciya rojhilatî de jî her nêr maye lê di kurmanciya navendî de bûye mê.

Di soranî, farisî, ermenî û tirkî de cinsên rêzimanî nînin. Adeten peyvên ji zimanan bi kurmancî dibin mê (bo nimûne, *peyman* ji farisî, *soz* ji tirkî, *xaç* ji ermenî). Lê herdem ne wisa ye, bo nimûne *kon/kûn* ji tirkî ye û di kurmancî de nêr e. Cinsê hin peyvên vê dawiyê wergirtî jî hê sabit û qayim nebûye. Bo nimûne, *netewe* û *niştiman* yên ji soranî wergirtî carinan wek mê û hin caran jî wek nêr tên dîtin û bihîstin.

Peyvên ji zimanên ewropî hatî adeten di kurdî de dibin mê. Bo nimûne, *televizyon* bi eslê xwe yê fransî mê ye û *parleman* jî bi heman eslê fransî nêr e lê herdu jî di kurmançiya nivîskî de mê ne. Lê di kurmançiya Başûrê Kurdistanê de mirov peyva *perleman* gelek caran bi forma wê ya nêr jî dibîne, ihtimalen ji ber tesîra erebî ku tê de ev peyv nêr e, yan jî ji ber tesîra soranî ku wek prensîp bêcîns e lê paşpirtika soranî ya girêdanê (-î) dişibe paşpirtika kurmançî ya çemandinê ya nêr (-î).

## CINSÊ PEYVÊN PÊKHATÎ

Hin caran dudilî li ser cinsê peyvên pêkhatî (hevedudanî, compound) heye. Heta carinan hin kes peyva *rêziman* bi xeletî wek nêr dinivîsin. Gelo cinsê peyvên pêkhatî çawa ye û çawa çêbûye?

Eger peyva pêkhatî amaje bi mirovan bike, cinsê wê wek kesa/ê amajepêkirî ye yan ew cins lê tê barkirin. Eger mamosteyek jin be, hingê mirov peyva “mamoste” wek mê bi kar tîne: *mamosteya me* tevî ku *mamoste* ji du peyva *mam+hoste* pêk hatiye û bi kêmî *mam* lê piranî herwiha *hoste* jî nêr in. Herwiha gava ku mirov behsa jineke serok dike, hingê peyva “serok” bi forma wê ya mê dixebitîne tevî ku ew peyv ji peyva *ser* ya nêr hatiye çêkirin.

Herwiha lêkerên pêkhatî yê navdêrkirî jî herdem mê ne tevî ku ew ji navdêrên nêr jî pêk hatibin: bo nimûne, *karkirin*, *destpêkirin*, *şerkirin* mê ne tevî ku *kar*, *dest*, *şer* nêr in.

Eger merem ji peyvê ne amajekirina bi mirovan yan heywanên cins-diyar be û peyv ne lêkerên pêkhatî yê navdêrkirî bin, hingê ev rêbaz bo barkirina cinsî li peyvê hene:

- 1) Eger di peyva pêkhatî de tenê navdêrek hebe, hingê cinsê peyva pêkhatî li gor cinsê wê navdêra xwerû ye: *bajar* > *bजारok* (herdu nêr in<sup>20</sup>), *ba* > *başûr* / *bakur* (her sê nêr in)<sup>21</sup>
- 2) Eger peyva pêkhatî ji du navdêrên cinscuda pêk hatibe, cinsê peyva pêkhatî adeten li gor cinsê peyva yekem e: *rêziman* (mê) ye ji ber ku *rê* mê ye tevî ku *ziman* nêr e. Watenasî tesîrê li ser diyarbûna cinsê peyvên wiha dike: *rêziman* ne zimanek e ku mirov pê li rêyan digere lê

---

Tevî ku carinan di medyayê de bi xeletî peyva *bजारok* wek mê tê bikaranîn, belkî di bin tesîra hevwateryên xwe yê 20 mê (nahî/nahye, qeza, navçe) de. Bo nimûne “bajaroka Eyn Îsa”: <http://ku.hawarnews.com/bajaroka-eyn-isa-hate-rizgarkirin/>

Li gor vê rêbazê, peyvên *bakur/başûr* nêr in (ji ber ku ji peyva *ba* ya nêr hatine çêkirin) û peyvên *rojhilat/rojawa* mê 21 ne (ji ber ku ji peyva *roj* ya mê hatine çêkirin). Lê gelek caran peyvên *rojhilat/rojawa* di bin tesîra *bakur/başûr* de wek mê yê gotin yan nivîsîn. Kêman caran jî tesîr berevajî ye anku mirov di bin tesîra *rojhilat/rojawa* de de, peyvên *bakur/başûr* jî wek mê dibîne.

rêyek e ku mirov pê li zimanan dinêre. Ji ber ku rêziman rê û rêbaz e û rê mê ye, rêziman jî dibe mê.

- 3) Ji ber ku cinsê rêzimanî yê mê di kurdî de serdest e, eger qiseker ji cinsê rêzimanî yê peyvekê ne piştrast be, adeten cinsê mê li peyvê bar dike heta eger ew peyv ji yek yan çend peyvên nêr pêk hatibe jî.

### CINS LI GOR DEVOKÊN KURMANCÎ

Hemû peyvan di hemû devokên kurmancî de ne herdem eynî cins heye. Carinan cinsê peyvekê li derekê nêr e lê li dereke din mê ye. Ev cudahî xaseten di navbera devokên kurmanciya navendî û kurmanciya rojhilatî de heye. Bi awayekî amî mirov dikare bibêje ku cinsê mê di devokên navendî de piçekê ji devokên rojhilatî serdesttir e. Anku hin peyv hene ku di devokên rojhilatî de nêr in lê di devokên navendî de mê ne. Lê nimûneyên berevajî jî peyda dibin.

Bi taybetî cinsê hin peyvên ji erebî di devokên rojhilatî de (wek di erebî de) nêr in lê di devokên navendî de mê ne: *wext*, *qelem* bi devokên navendî mê ne lê bi yên rojhilatî nêr in. Herwiha *dem* (*wext*, *çax*) ya ne ji erebî di devokên rojhilatî de nêr e, di navendî de mê ye. Berevajî van, *xatir*, *ruh*, *poz*, *porr* di kurmanciya navendî de nêr in lê di rojhilatî de mê ne.

### CINS Û WATENASÎ

Li jor hatiye diyarkirin ku bi guherandina cinsê peyvên cotcinsî, em dikarin amaje bi kesên/heywanên mêyan nêr bikin. *Hevala min* diyar dike ku ez behsa jinekê/keçekê dikim û *hevalê min* jî dide nîşan ku merema min mêrek/kurek e.

Ji bilî van, herwiha di çend peyvên nejiNDAR (inanimate) de jî bi guherandina cinsê peyvê, maneya wê jî hinekî diguhere:

- *sêv bi dara baxçeyê me ve çêbûne* (mebest jê dareke şên û terr e)
- *darê hişk* (parçeyeke darî anku textî/depî/doqişkî)

Peyva *erd* bi kêmî di hin devokan de li gor cinsê wê maneya wê piçekê cuda ye:

- *erdê çandî* (nêr: zevî, erazî)
- *ket erdê* (mê: her cihê ax yan nizm)

Dîsa bi kêmî di hin devokan de peyvên *birinc* û *savar* bi xavî (wek made) nêr in lê kelandî (wek xwarin) mê ne.

### GIRÊDAYÎ NÊR, ÇEMANDÎ MÊ?

Hin peyv hene ku di haletê girêdayî de di hemû devokên kurmancî de nêr in. Bo nimûne:0

- bayê biharê
- şerê yar û neyaran

Gava ku ev navdêrên nêr tên çemandin, adeten divê ew li gor devokan bi yek ji van her sê awayan bin:

- li ber bayî (kurmanciya rojhilatî)
- li ber bê (kurmanciya navendî)
- li ber ba (hin devokên ku navdêrên nêr naçemînin)

Lê ji bilî van, herwiha mirov di hin devokan de û heta di nivîsan de jî formên wiha jî dibîne:

- li ber bayê
- çûn şerê

Heçku “ba, şer” mê bin. Heta çend nivîsên bi armanca “sererastkirina van xeletiyên” jî hatine nivîsîn. Tê gotin ku cinsê van peyvên nêr e lê ew “wek mê tîn tewandin”.<sup>22</sup>

Gelo bi rastî ev awayê çemandinê “mêkirina peyvên nêr e”?

Di rastiye de na, ev ne “mêkirina nêran” e. Tarîxiyên pirtika çemandinê “-ê” bû, paşî di kurmanciya rojhilatî de bûye “î”, di kurmanciya navendî li gel “a” yan “e” ya nava yan dawiya yan destpêka peyvê heliyaye loma “ba” di van devokan de dibe “bê”, “aş” dibe “êş”.

Lê di xaseten di kurmanciya rojavayî de ev “ê” wek paşpirtika peyvên nêr jî maye. Loma tê gotin: *li ber bayê, bi hespê, çûn şerê*...<sup>23</sup>

---

Bo nimûne, Zana Farqînî *Peyvên ku zayenda wan nêr lê wekî mê tîn tewandin*: <sup>22</sup>

[http://www.amidakurd.net/qunciknivis/peyv%C3%AAn ku zayenda wan n%C3%AAr l%C3%AA wek%C3%AE m%C3%AA t%C3%AAn tewandin](http://www.amidakurd.net/qunciknivis/peyv%C3%AAn%20ku%20zayenda%20wan%20n%C3%AAr%20l%C3%AA%20wek%C3%AE%20m%C3%AA%20t%C3%AAn%20tewandin)

2

Binêrin Husein Muhammed *Metafonî – çima “welat” dibe “welêt” û “standin” dibe “bistîne*: <sup>23</sup>

<https://zimannas.wordpress.com/2015/07/06/metafoni-cima-welat-dibe-welet-u-standin-dibe-bistine/>

## Le birakujî giyanîyewe berew birakujîy zimanî

**Cemal Nebez**

Hezim nedekird lem kateda bême em meydanewe, çonke be çend babetêkî dîkewe destim gîrawe, befam çar çiyê? Kurd gutûyane "şeşe û yexet degirê, eger neykeyt, xuwa detgirê". Em şeşê, her yexey minî negirtûe, ke safanî saî xerîkî zimanewanî kurdî bûm, befkû yexey neteweyekî girtûe, emeş, wek ewey em Kurde, lehemû şitêkî tewaw bê û, le bêkarîda bêzar bûbê û, şeî le betaî pê baştir bê û, lemewe kewtibête şeşeqoçî şêwezarî "Sorani û Badînanî".

Şeşêkeş leşeyî 53 kesewe heşgîrsêndirawe ke pêyan waye peydabûnî zimanêkî dîwanî (resmî), bexuwastî wan û,bezorî darî serkirdey çend hîzbêkî Başûr û, lenêwyanda "Yekgirtûy Islamî" ke layengirekanî, hîç rojêk bîryan le xizmetî zimanî Kurdî nekirduwetewe û, lebatî rojbaş debêjn "selam" ke le "şalom" î 'Ibriyewe hatuwe, nek siław/v ke wuşeyekî resenî Kurdiye û, legeî Salutare î Latîni û Salute î Inglîzî û Salut î Feřensî hawşegî yekin, beřastî cêy dax û xefete ke debînîn lenêw ew (53) wajolêdereda, ke be pena birdine ber deseřatî hîzbekan, deyanewê zimanêkî nûsîn bisepênin beser netewey Kurdda, ke hêşta nebuwe be zimanêkî standard, kesanêkî diřsoj û diřuderûn pakîşyan têdaye. Em heşwêşêş way le hêndek hîzb û komeşey ser be Bakûrî Kurdistanîş kird, wek KNK û Instîtoy Kurd le Berlîn, ke ewanîş bikewne sing derpeřandin û berberekanî û xoderxistin û, bemeş agirî nakokî xoştirbiken û, çawî dujminanî netewey Kurdî pê geş biken û, diřî reşuřûtî Kurdî pê reş biken, her bo ewey, tepî û zuřnay "dû standardî zimanî Kurdî" bikewête geř. Ca le ber ewey xom hest be metirsiyekî gewre dekem û, le gelêk hawbîr û dost û nasiyawîşewe, rûnira lêm ke bîruřay xom lem bareyewe derbibîřim, wa naçarim bême deng.

Ber le hemû şitêk demewê bêjim ke em çend dêřey lem gutareda cêyangirtûe, her qisey ewřom nîn, befkû qisey 52 saî lemewberme û, le namîlkey "Xwêndewarî Be Zimanî Kurdî" ke le saî 1956 da le Kerkûk nûsîwme û, le 1957da le Bexda çapkirawe, lêyduwawim. Lewêda û, lepaş ew berheřistaneda ke dêne berdem xwêndewarî be zimanî Kurdî, gîrugiroy nebûnî zimanêkî yekgirtûm xistûwete

berçaw û, pêşnîyazî damezrandinê koşkî zanyarî – zimanewanî (ekadêmîyay zimanewanî) m kirdûwe bo rêberîkirdinî çareserî em kêşeye.

Ew namîlkeye, paş sî saî, wate le safî 1987 da le Swêd, carekî dî çapkirawetewe û bo carî sêyemîş, paş penca saî, wate le 2007 da, le Nerwîc amadekirawetewe û le maîpeřekanî "Kongirey Nîştimanî Kurdistan" û "Kurdibûn" û heftenamey "Mîdîya" û "Pertûk" da heye û, her kesêk bîyewê, detuwanê lew maîpeřanewe raybikêşê û wêneyekî boxoy lê çap bikat.

Bêcge lemeş, le safî 1974 da û, lejêr nêwî "Zimanî Yekgirtûy Kurdî" da, basêkî zimanewanîm le Eřmanîya, lerîzî biřawkirawekanî "NUKSE" (Yekêti Neteweyî Xwêndkaranî Kurd le Ewrûpa" beçap geyand, wek beşdarîkirdinêkî destpêşkerane bo çareserkirdinî em gîrugiroye û, be pêçewaney ew Ewropayîyaney ke xerîkî zimanî Kurdî bûn û, le nezanînewe, zimanî Kurdîyan dabeşkirdûwe be ser dû şêwezarî Kirmancî Bakûr û Kirmancî Başûr da, çonke ewane, şêwezarî Goranî – Kirmanckî (Zazakî) û Lekî û Lořî, be Kurdî nazanin, min zimanî Kurdîm dabeşkird be dû şêwezarî serekî: Kirmancîy Bakûr û Kirmancîy Navîn (Nêwerast) û dû şêwezarî latenîşt: Kirmancî Başûr û Goranî – Kirmanckî (Zazakî). Em dabeşkirdineş, lebarey çalakî û firawanî nûsînewe bû bew şêwezarane, nek lebarey giringî şêwezare serekiyekan, yan nagiringî ew şêwezarane, ke belatenîşt leqetem dirawin, egena hemû şêwezar û binzarêk giringî xoy heye û beşêke lezimanî Kurdî.

Le safî 1975 da, wutarêkim be zimanî Eřmanî lejêr nêwî "Zimanî Nûsînî Kurdekan ((De Sçriftspiraçe der Kurden)) le Insîklopîdîyaî êranewanîda ke be Aça İraniça benêwbange (ce 2, I, 97 – 122), biřawkirdewe û, le herdû berhemekey duwayîda, hoyekanî peydabûnî şêwezarim le zimanda û, betaybetî le zimanî Kurdîda xistine berçaw û, berawirdkariyekim kird lenêwan herdû şêwezare serekiyekeda, lebarey morfolojî û dengnasî û rêziman û wušenasî û rênûsewe û, gelêk pêşnîyazim xistineřû bo lêknêzîkkirdinewey herdû şêwe zare serekiyeke leyek û, sûtwegirtin le yek û, guncandinyan leget şêwe zare latenîştékanda. Le wutarêkîşda lejêr nêwî "Kurd û Kêşey Ziman" ke le govarî "Kongire" jimare 38, mangî Pûşpeřî safî 2707 î Kurdî (cûnî 2006-î zaynî), le heftenamey "Mîdîya" jimare 244 û rêkewtî 13/6/2006 biřawkirayewe, hêndek pêşnîyazî dîkem bo nêzîkkirdinewey şêwe zarekan xiste berçaw. Bo wêne: cîyakirdinewey regezî nêrîne û mêyîne be nîşanepêdanyan, tenê le katêkda bê ke ew cîyakirdineweye nirxêkî rêzimanî hebê, nek ewey, mêz, berd, dar, be mê, yan be nêr dabinrên, ke ew cîyakirdineweye nirxêkî rêzimanî niye. Herweha, wazhênan le paşqoy napêwîst, emaneş wek hoyek bo hasankirdinî ziman.



Ewey ez agam lêbê, eweye lew serdemanewe heta ewro, berhemêkî zimanewanî zanistane ke, şitêkî nwêy xistbête ser ew karaney serewe nekirawe. Egerçî, eme 17 saê, hevde safî rebeq, lenêwçeyekî pan û berînî Başûrî Kurdistanda, derfetêkî zor baş hatuwete pêşewe bo kirdinî ew kare. Bêguman eger em hevde saê, be şeî "birakujî" û beîênî naîst û gwênedane çarenûsî xelkî Kurdistan û hîzbhîzbêney maîuwêrankerane nebrayete ser û awîrêk le ziman û ferhengî Kurd bidrayetewe û, beşêweyekî zanistane hewfî nêzîkkirdinewey şêwezarekanî zimanî Kurdî bidraye lelayen mirovî le zimanewanîda pispoş û, sîstemî xwêndinî zimanî Kurdî, le herêmetiyewe, bigoşdiraye be sîstemêkî perwerdey serdem, ewa ewro detuwanra bas le zimanêkî standard bo zimanî Kurdî bikirêt û, ew hele dekira, le karbedestan dawa bikirê ke piştgîrbiken, nek şêwenûsînêkî taybetî beser xelkda bisepênin. Aşkiraşe, hemû ewaney ke ta êste lem base duawin, zimanî nûsîn û zimanî standard, be yek şit dezanin. Eweş nezanîyan derdexat. Raste, hêndek car zimanî nûsîn û zimanî standard yek şitin, beîam her gelêk zimanî nûsînî hebû, manay ewe niye zimanî standardî heye. Bo wêne: Fars û Tirk zimanî standardîyan niye. Farsekan hezar saî pitire zimanî nûsînîyan heye, beîam zimanî standardyan niye (Farsî êranî û Farsî Derî Efxanî û Farsî Tacîkî sê zimanî nûsînî), Tirkekan (hewt – heşt zimanî nûsînîyan heye, Tirkî Estemûfî û şeş core zimanî nûsînî Tirkekanî kone Sovêt û, zimanêkî nûsînî Tirkekanî êran).

Şayanî base, Kurdîş, wek Fars û Tirk, zimanî standardî niye, beîku dû core zimanî nûsînî heye. Ewey ke hendêk kes pêy deîen "cût standard", rast niye û, sa yan le nezanî, yan le naberpirsiyaretiyewe dê, çonke hîç şêwezarekî nûsînî Kurdî, carê nebûwe be standard. Ne emey ke le beşêkî Başûr û Rojêtatî Kurdistanda pêydenûsirê û, be heîe be "Sorani" dedrête qeîem û, caran pêydegutira "Kurdî Petî" û, ne ewey ke leser binçîney şêwezareî Cizîr û Botane û, beşêk le Kurdekanî Bakûr û Rojava û kone Sovêt û Badînan û Mûsiî pêydenûsîn û, be heîe be "Badînanî" nêwdebirê, hîçyan standard nîn. Zimanî standard, bew zimane degutirê, ke çî lebarî rêziman û çî lebarî dengnasî û ç lebarî ristesazî û çî lebarî wuşenasî û çî lebarî rênûsewe, şêweyekî qaîbbestûy wergirtibê û, şêway destkarî û herkes boxoyî nebê, ke bew zimaneş nûsira, her bew şêweye binûsirê. Emeş le zimanekanî nûsînî 'erebî û Inglîzî û Eîmanî û gelêk zimanî dîkeda debînrê û, lehemû layekîşewe pêşewî dekirê, xo eger goşanêkîş bepêwîst zanra, ewa leîy ekadêmîyaî zimanewaniyewe dekirê û, eweş paş lêkoîneweyekî dirêjxayen û kûr (qûî), nek be bişyarî hîzbekan. Ew hîzbaney ke be fermanêkî "şahane", aşbetaîyan be "Koî Zanyarî Kurdistan" kird û, be fiftî fiftî Partî û Yekêtî, baryankirdewe beser herdû layanda. Dîyare em taybetkaraney zimanî standard ke baskiran, le herdû şêwezare Kurdiyekeda nîn ke bûnete zimanî nûsîn û biîawkirdinewe. Her bo wêne, werin temaşay rojnamekan û ew çapkirawane biken

ke bew şêwezare denûsirên ke pêydegutirê "Sorani", ewete yekêk denûsê "deçim", ewî dîke denûsê "eçim". Yekêk denûsê "beserya kewtim" ewî dîke denûsê "beserîda kewtim". Yekêk denûsê "zerenger" ewî dîke denûsê "zêînger". Yekêk denûsê "wergêrdiraw", yekêkî dî denûsê "wergêrrow". Yekêk denûsê: "deden" ewî dî denûsê "eyen". Eme, le şêwezari Bakûrîşda ke nêwyannawe "Badînanî", her waye û bigire lemey "Sorani" xiraptire. Pêrewînekirdinî rênûsêkî lebar û cêgirtûş, eweş derdêkî dîkeye û lehemû kes aşkiraye. Idî, zimanî standardî çî?

Ewca zimanî standard, hêndek car lexoyewe û, behoy helumercêkî nêwxoyewe (kultûrî, aynî, bazrganî, ramiyarî... htd) durust debê û, hêndek carîş, şîwezarêk lelayen desetataranî dewletêkewe dekirê be zimanî dîwanî û, carî waş heye, lelayen zanayan û nûseran û hozanvanan û hunerweranewe lesar binçîney şêwezarekan û dahênanewe, lesar durustdekirê û, leşey perwerdey qutabxanekan û destgey rageyandinî giştîyewe, bexawen dekirê û, bere bere şwênî xoy degirê. Em rûdaw û hefkewtane, le bextî şîrî kurd, beser zimanî Kurdî nehatûn. Em baseşim be têruteselî û bezimanî Inglîzî, le semînarêkda le jêr nêwî "Zimanî Kurdî, le Zimanêkî Devokiyewe Bo Zimanî Nûsîn", le konfiransêkî nêwneteweyîda pêşkêşkird, lelayen zanistgey Sorbonî (parîs) ewe, ke le 28/11/1993 da bestira, lejêr nêwî "Zimanî Kurdî Berew Safî Dûhezar". Em semînare le Inglîzîyewe, le get semînarêkî dîke ke bezimanî Eftmanî le "Civatî Kurd le Berlîn" le jêr nêwî "Kurd, Mêjû û Kultûryan" le 19/9/1997 da pêşkêşimkirduwe, kirawn be Kurdî û be tîpî latînî û, le layen Binkey Çapemenî "Avêsta" we le Estemûl, le yek bergda û le beharî emsaîda bihawkirawnetewe.

Raste, em şêwenûsîney ke be hefe nêwyan nawe "Sorani" le setey raburdûwewe, betaybetî le pencasafî duwayîda, bexizmetî takekesî, ta hendazeyek pêşkewtûwe, be lam negeyştûwete ewey ke bûbête standard, takû bisepêndirê beser 40 milyon kesda, betaybet, çunke 20 milyon Kurd hen, natuwanin bem rênûsey ke em "Sorani" yey pêdenûsirê bixwêninewe, bo ewey bituwanin legefî rabên û çêjî ew wêje berze biken ke bem şêwezare nûsirawe. Edî çon fêrîbin? fêrbûnî ew rênûsey bo xelkî Bakûr lem rojeda, nebû û nekirawe.

Hêjay gotine, her paş bihawbûnewey tikanamey ew 53 kesê ke dirabû be karbedestanî hukûmetî Hewlêr û Silêmanî û Duhok û hîzbekan, jimareyek wutar lew bareyewe bihawbûnewe, ke hêndêkyan bo piştgirî ew tikanameye bû, ke le beşêkîyanda, tenanet sûkayêtîş be xelkî berûmet û zehmetkêşî Badînan û Bakûrî Kurdistaniş kirabû, ke eweş dîyare sêrey roşinbîrî û piley nîştmanperwerî ew kesane pêşandeda ke xoyan kirdûwe be demrâstî kurd. Lêreda namewê hemû ew qise naşîrînane bihênimewe pêş çaw, lê hênde debêjim, le wutarêkî dûrudirêjda, ke le çend maîpeşkêda

bihawkirabûwewe, yekêk, wek melakanî serdemî 'Usmanî, ke qisekanî xoyan bemebest, be wuşey 'erebî deaxinî, emîş, bê çawênî bê, pilar û tuwancekanî be gelêk wuşey Ewropayî suwax dabû, wek "ergîyument" û "motîv" û çî û çî û, xêraxêraş, qisey hêndek Ewropayî têxistbû, bo ewey pêman biselmênê ke kuře başeke, xwêndewarî Ewropayî heye û, sişî lewe nekirdibûwewe ke ewaney bîr le yekêtî zimanî Kurdî dekenewe û, zimanî Kurdî be yek ziman dezanin û, netewey Kurd be yek netewe, be "pan Kurdîst" nêwbiba. Ke em wuşey "pan Kurdîst" e, bo yekemîncar û, le kotayî şestekanî setey raburdûda, sîxuřêkî SAVAKî serdemî şay lêxirawî êran, be nêwî xuwastemenî "Makan" ewe, le namîlkeyekda ke be zimanî Farsî dijî kurd nûsîbûy, le jêr sernêwî "Efsane yê Xelqhayê Iran" (efsaney gelanî êran), em wuşeyey bekarhênabû ledijî Şehîd Ewrehmanî Qasmlo, bo ewey be mêşkî boşî xoy bîselmênê ke Kurd giwaye netewe nîn, belkû hozêkin û zimanekeyan şêwezarêkî Farsiye û, tenanet zarî Tirkî Azerîşî b eşêwezarêkî Farsî dabûwe qetem. Kakî "ergîyument" bazî xoşman, debê ewe bizanê, ke em qisaney wî, le 'êraqçêtiyekî kalfamane bewlawe, hîçî dî nageyenê û, ke qisekanî hêndek Ewropayî, befam bê bone, dexate nûsînekeyewe, ba bizanê ke çend safêk lemewber, bîr le çaksaziyek kirayewe le rênûsî zimanî Ełmanîda, bo eme, cermanîstekanî Ełmanîya û Nemsî û Swîsira û Luksemborg û Ustiralîya û xuwarûy Efirîkaş, çend car û çend car kobûnewe û, maweyekî zor wutûwêjyan lebarewe kird, eweş leser gořenêkî yekcar kem û, kesîş pêynegutin "pan Cermanîst" û, ke bişyarekanîş bihawkiranewe, hêndek qutabixane pêy razînebûn, le encamda, kêşeke b enaçarî xiraye berdem Dadgey Berzî Ełmanîya ke, maweyekî baş pêwey xerîkbû û, giwêy le raportî gelêk pîspořan girt û, paş destkarîkirdin, ewca bişyarîda leserî.

Her lew wutaraneşda, ke nûserekanî, bîyanewê û neyanewê, qisekanyan le hestêkî 'êraqçêti, yan îslamçêtiyekî 'erebanewe derpeřîwe, dujminayetiyekekî zor xest beramber rênûsî Latîni pêşandedrêt û, nezanane hewîldedrêt, wa pêşanbidrêt ke, eme lasayîyekî Etatirkiye. Hey quř beser Kurd, ke emane xwêndewarekanî bin. Em nezanane, agayan le mêjûy rênûsî Kurdî niye. Roşinbîranî Kurd, her le paş cengî cîhanî yekemewe û, safanêk pêş Etatirk, bîryan le rênûsî Latîni kirdûwetewe. Pêşengî em kare rewanişadan Mihemmed başqe (başege - ke Kurdêkî Feylî roşinbîr bû) û Tofîq Wehbî û Ehmed Muxtar Caf û Lemalî 'Irfan û Ehmed Behcet Qeraxî û Bedrxaniyekan û duktur Se'îdî Kurdistanî bûn (ke emî duwayîyan Kurdêkî Sineyî Goranî û ser be ayinî Dîyanî bû). Befam ewe bû, dagîrkeranî 'ereb le 'êraqda ke 'erebayetî û îslametîyan kirduwe be yek şit û, wek kutekêk bo lêdanî Kurd bekarîdeben, be "ergument" î îslamçêti le dijî westan û, rêyan neda pêy. Emeyan wa û, hebjardinî elfubêy Latîni, lecîyatî elfubêy rojefatî, bo nûsînî kurdî, le ber ewe niye ke kurd xoy le 'ereb cîyabikatewe, yan êdî netuwanê Quran bixwênêwewe, wek eman debêjin. Quran be zimanî 'erebiye

û dîyare Kurd têtîyagen, le ber ewe debê bikirê be Kurdî û, be Kurdî bixwêndirêtewe û, be mêşkêkî Kurdî, lêkbidrêtewe. Zimanî kurdîş, wek zimanî 'erebî û her zimanêkî dîke, xuwa efirandûyetî û hîçî le zimanekanî dîke kemtir niye. Bêcgeleweş, ew elfubêyey ke pêydegutirê "elfubêy 'erebî û îslamî", ne elfubêy'ereb bûwe û ne hî îslam. Elfubêyî 'erebî, wek le çil saî lemewberewe gutûme, lebineřetda elfubêy Aramî cûlekekan bûwe, paşan be gořanêkewe bû be elfubêy 'arebe bitperstekan. Lemeş bitirazê, katêk gelêk deyewê, elfubêyek bo zimanekew xoy dîyarîbikat, naçê le xoşewîstî, yan le rikî kes,ewkare bikat. Xo eger ewe bikat, ewe gemjeyetiye, wek gemjeyetî berberekaniyê rênûsî Latînî bo zimanî Kurdî, be "ergument" î bê wecane. Bo rênûsî Kurdî, debê elfubêyek heřbjêdrê ke fêrbûnî sûk û hasan bê û, legeř dengnasî û rêzimanî zimanekeda baş biguncê û, xař û çukley kem bê û, wêney dengekanîşî, bepêy şwênîyan le wuşeda, negořê, yan zor kem bigořê. Wate : f, v, ç, e, x, b, t,... Htd, her yekeyan be çuwar wêne nenûsirên (le seretada, le nêweřastda, le binetada, betenê û her yeke be corêkî dî... ) de ew elfubê hasane guncawe bo zimanî Kurdî, elfubêy Latîniye, nek Aramî. Bêcgeleweş, demêke pêşnîyazî ewem kirdûwe, ke le cîyatî Ç û S î çukte lejêr, bo ç û ş, Ç û Ş binûsirê û waz le bizroke (i) bihênrê û ew (i) ye le cîyatî (î) bekarbibrê le katêkda ke ê bedû ee binûsirê. Şayanî base, 20 milwên Kurdî Bakûr, ne ew biwareyan heye û, ne ew helumerceyan bo rexsawe, ke biçin fêrî em tîpe rojeřatiye bibin, ta bituwanin nûsînekanî xelkî Başûr û Rojeřat bixwênnewe û şarezay bibin. Bedîřnîyayîşewe debêjim, ta elfubêy Kurdî, Leser binçîney rênûsî Latînî bîrazkiraw, yeknêrê, basî nêzîkkirdinewey şêwezarekan le yek û zimanî standard, herwek dewen be aş waye. Mebestîşim leme, ewe niye ke destbecê mařawayî lem elfubê rojeřatiye bikeyn, beřkû deřêm, şanbeşanî ewe, elfubêy Latînî çakkiraw (destkarîkiraw û bîrazkiraw) bihênîne kaye û pêy binûsîn.

Leber ewe, sepandinî şêwenûsînêk wek standard, le katî êsteda û, betaybetî, ke gelêk karî çarenûssaz hen çaweřuwanî rapeřandinin, wek: kêşey Kerkûk û nêwçe dagîrkirawekanî dîke û, piştgîrî xebatî netewey kurd le Rojeřat û Bakûr û Rojavay Kurdistan û, bedengewehatinî daxuwaziye rewakanî xelkî Herêmi Başûr ledijî gendefî beřêweberêtî û, hewîřdan bo nasandinî enfal û çekî kîmyayî be gelkujî le Kurd û, destnişankirdinî heřwêstî Kurd beramber peymannamey zêrevanî, ke Emrîka deyewê legeř 'êraq bîbestê û, bergirî bombarankirdinî sinûrekanî Başûrî Kurdistan lelayen rijêmi Tirk û Farsewe u, berberekaniyê reşekujî le jinan û.. htd, ewa, xerîkkirdinî xelik bekêşey zimanî standardewe, bêewey hîç amadekariyek kirabê boy, le zîyan bewlawe, hîç encamêkî dîkey nabê. Xo eger Kurd hemûyan, her le 'êraqda bûnaye, yan her hemûyan le 'êraq û êranda bûnaye, dekira em şêwenûsîne, be hêndek çaksaziye, bikirê be zimanî standard. Egerçî şêwezari dîkeş hen lem dû wiřate, beřam rênûs leher dûla yeke û, maweyekî zorîşe em şêwenûsîne, le herdû lada bekar debirê.

Xo eger bihataye û Kurd hemûyan, le sinûrî yek dewletda bîjyanaye û, hemû şarezay yek elfubê û rênûs bûnaye û, şêwezarekîyan, zimanî zanist û tekinîk û huner û wêje buwaye, ewanî dîkeş devokî (sernc: devokî wuşeyekî dîkeye bo demokî dev/dem e) bûnaye, ewa ew demeş herdekira, ew şêwezare bikirête zimanî dîwanî. Beîam Kurd neteweyekî bê dewletî dabeşkirawe û, sinûrî parçekanî wulatekey be tank û top û leşkir gîrawe û, deselatî herêmî "sê bajêrîş", namexuwa, lew sê şare têpeş nakat û, hevde safîşe hîç awîrêk le zimanî Kurdî nedrawetewe û, pênc safîşe le Kerkûkda, dû core pertûk û, dû cor perwerde pêşewdekirên û, hîzbhîzbêne û binemateperstî, dokey Kurdî betewawî tirş kirdûwe. Êdî em daxuwaziye bêserubere ke, berewrûy deselatî herêm kirawetewe, ta fermanî bo derbikat, le xeyalî xaw bewlawe çîdîke niye û, xo eger bikirê, ewa debê Kurd xoy bedestî xoy, sinûrî zimanekey û wulatekey tesk bikatewe, ew deme zimanî Kurdî berew "dûzimanî" û "çendzimanî" îş deçê.

Rastiyekey, eger bêtu, ew şêwezarey ke nêwyannawe "Sorani", bem elfubêyey êstey û bê bekargirtinî elfubêy Latîni bîrazkiraw û, bebê yarmetî şarezayanî hemû şêwezare û binzarekan, bisepêndrê beser herêm û Kurdda û, pişt bikirête hemû Kurdekanî Bakûr û Rojava, ew deme debê rijêmî Tirk û Sûriya zor supasî ewane biken ke bûnete hoy em kare dizêwe û, piştyan kirdûwete hawnetewekanî xoyan le Bakûr û Enadol û Rojava û, kewtûnete birakujî zimanî.

Katî xoy, Stalîni têrorîst û enfal le Kurdker, le ber xatirî rijêmî Tirk, elfubêyî Rûsî sepand beser Kurdekanî Kurdistanî Sorda û, neyhêşt be elfubêy Latîni binûsn, neba Kurdekanî Bakûr, sût le berhemî Kurdekanî bindestî Sovêt bibînin. Em 53 keseş, êdî bizanin, yan nezanin, her bew rêyeda hengaw denên ke Stalin nexşey kêşa boy. Xo eger Celadet Bedrxan ke êste kone derwêşekanî Stalin defên "sîxuř" bûwe, ew elfubê Latîniyey danehênaye û, zimanî Kurdî be tîpî Aramî destkarîkiraw binûsiyaye, ewa emro Kurdekanî Bakûr, bê nûsîn û bê xwendewarî Kurdî demanewe. Leber ewe, lêreşda rûy giley û gazndem le mirove dişojekanyane, çunke ewanî dî, wek Farsekan debêjuin " m'lum alhal" in, ey başe, emane nebûn ke xerîkî ewebûn, marşî Kurdistan û aîay Kurdistan bigořin? ey lew rojaneda, le heftenamey "Mîdîya" da, pêşbînî ewemnekird ke sereş dête ser ziman û nemnûsî: "heres hênanîş be koşkî dařûxawî zimanî Kurdî, ke be rêkewit çend koleke û nêrgeyekî lecêy xoyda mawin, bo emeş "xuwa kerîme.... htd" (wutarî "Zîndûkujî Mirdû Perst" "Mîdîya" ce 238, rêkewtî 2/5/2006).

Zimanî Kurdî, her Kirmancî Bakûr û Navînî niye, beîkû şêwezarekanî Goranî – Kirmancî (Zazayî) u Kirmancî Başûr û Luřî (Feylî û Keřhuřî û... htd) û gelêk binzarî heye ke, hemûyan sermayey em

neteweyen û, debê hemûyan tomarbikirên û sût werbigîrê lêyan bo hênane bûnê zimanî standard. Le pertokî "Wuşernameki êtîmolojyaî Zimanî Kurdî" da ke le 2007 ewe le maþpeþekanî "Kurdûn" û "Kongirey Nîþtîmanî Kurdistan" û "Mîdîya" û "Pertokxaney Kurdî" da heye, pêşnîyazî dananî însîklopêdîyayekî zimanî Kurdîm kirdûwe ke, leþêy înternêtewe bikirê û, hemû þêwezar û binzarekan bigirête xoy û, hemû netewey Kurd le durustkirdinîda beþdarbê. Bêcgeleweþ, debê lehemû qutabixane seretay û nêwendî û duwanêwendiyekanî ew þwênaneda ke bedest kurdewen, zimanî Kurdî, hemû rojêk, belanî kemewe, dû demjmêr bixwêndrê û ew pertokaney ke amade dekirên, debê hemû þêwezarekan, be rêziman û wuşenasiyewe, be þêweyekî berawirdkirawane û pile pile, fêrî qutabîyan biken. Ewca ke zimanî standard, zanayane û leserxo û, be reþawgirtinî layene resenekanî hemû þêwezar û binzarekan û, leser binçîney rêzimanêkî yekgirtû, durustkîra, ke em destpêþkeriye debê le Baþûrî Kurdistanewe serheþbidat, ew deme debê lehemû qutabxanekanda bixwêndirê û pertokekan bew zimane binûsrênewe, beþam mamostakan ketik le þêwezari ew þwênanane werbigirn ke waney têda deþênewe û, bew þêwezarane, babetekan le qutabyekan bigeyenin, heta zimane standardeke betewawî cêyî xoy lenêw komeþgekeda degirê. Bo emeþ debê mamostakan ber lewe, behoy korsî taybetiyewe bo em kare amade kirabin. Kurt û kirmancî; sepandinî em þêwenûsîney Kirmancî Navîn, lem kateda û bem þêweyey êstey û, bem rênûsey êsta, çend karêkî dizêwe, ewa pêþewîkirdinî "cût standard" îþ, jehrêke bo netewey Kurd, debê xoman le her dûkîyan biparêzîn.

Çîni hurde borjuway xwêndewarî Kurd, eme penca saþ pitire, waney dujmnayeti nêwxoyî û hîzbhîzbêne û nêwçegerêti deda begwêy Kurdî beþxuraw da, ewe bû kurdî geyande þeþî birakujî, ke leþastîda Kurdkujî bû (wek kak Mes'ûd Barzanî, çend rojêk lemewber, rastewxo danî pêdana, egerçî, bedaxewe, amade nebû, berpîrsiyaretîyekey bigirête esto) ew þeþe çepeþe, hezaran Kurdî bê giyan kird û, gelêk derfetî ledest Kurd da, ke carekî dî nageþênewe. Êsteþ betemaye, lew birakujîye giyanîyewe, bikewête heþîrsandinî agirî þeþî birakujî zimanî, beþam ba diþnîya bê ke rêyî pênadre û, ew deste çîlkeyey ke amadey kirdûwe bo kirdinewey em agire, her xoy desûtê pêy û tif û ne'letî rojgarîþî berdekewê.

Kêþey zimanî Kurdî kêþeyekî neteweyî ye, nek nêwçeyî û hîzbî be têkoþînêkî zanistane û, hoþyariyekî roþinbîrane û giyanêkî neteweyî û deseþatêkî neteweyî çareser dekirê, emeþ le helumercêkî lebarda, nek le rojî emþo û, lem barudoxey nihoda ke kurdî kiþofî têkewtûwe.

## LÊKER DI ZIMANÊ KURDÎ DE

*Deham Ebdulfettah*

### PÊŞGOTIN

Berî ku ez di vê pêşgotinê de babeta Karan tevbidim û bikevim nav girêk û aloziyên wan, dixwazim kêşeya van zaraveyên (têrmên) ku bi vê pirraniya bêserûber li hêman û mijarên rêzimana Kurdî bûne, di ber çavan re derbas bikim û di bîra xwendevanên pirtûkên rêzimana Kurdî de bînim, çendî têgihêştina van navlêkirinên têvel (ciyawaz) çetin e.

Her şarezayekî zimên di nivîsarên xwe de navek, li gora baweriya xwe, li mijarekê kiriye.

Bi vê yekê her mijarek bi çend navan hatiye nasîn wek Nimûne:

- Hevok, hevek, pevek, komik û riste (الجملة).
- Kar, lêker, pîşk, kirin, ferman û kardar (الفاعل).
- Kara, kirar, kirde, kiryar, pîşkar û biker (الفاعل).

-.....

Dema ku mijarek bi (4 - 5) navan bê nasîn, divê hayê mirov ji watedariya wan navan tevan hebe, ku ew nav tev yek mijarê destnîşan dikin, yan jî wê tûşî tevheviya navlêkirinan bibe.

Rast e ku ji hezarên salan ve zimanê me, weku zimanekî devikî maye, bêyî ku derfeta lêkolîn û vekolînên pêdivî jêre peyda bibe. Rast e jî ku nuha em di qûnaxa vejandin û damezirandina bingehên zimanekî wêjeyî de ne, lê ka ev qûnax, li gora perîşaniya vê rewşa me ya îroyî, gelo wê çiqasî dirêj bike.....? !

Hemû xebatên ku di warê zimanê me de bûne berhemên kesayetiyê yekta ne. Ev celebê xebatê jî, çiqasî pêkhatî be, şûna xebata komelên dezgehî nagire.



Bêguman, em di vê qonaxê de nikarin hemû kêşeyên zimanê xwe çareser bikin. Lê ku em xwe bidin serhev û dezgehî zanyarî li gora karîna xwe ava bikin, em ê karibin gelek xalên aloz di gelek mijaran de sererast bikin.

Hin Kurdnas û zimanzan dibêjin: Zimanê Kurdî (Kurmanciya Jorîn) zimanê verês û veguhestinê ye. Anku, ev her du mijarên rêzimanî (verês û veguhestin) bingeheên tevna şêwezareê Kurmancî û taybetmendiya wî ya herî taybet in. Digel ku verês (tewang) digihêje nav û cînavan jî, lê herî bi cor û celebên karan, dem û raweyên wan ve girêdayî ye. Bi vê giringiyê kar dibin hêmanê herî sereke di pergala derbirîn û hevoksaziya zimanê me de. Ji ber vê giringiyê jî min ev pirtûk bo Karan tenê terxan kiriye, min hewldaye ku ez vî hêmanê giring ji hemû hêl û rexan ve vekolim, xalên tarî, di goşeyên jibîrkirî de ronî bikim û hin bilêvkirinên herêmkî destnîşan bikim. Bi gotineke tevayî, min xwestiye ku ez babeta «kar», weku giringtirîn mijar di rêzimana Kurdî de, hindekî ronî bikim. Bi hêvî me ku ez karibim çend gavên cîgirtî berû armanca xwe ve bavêjim.

Xebitandina hinek raweyên veguhestina karan ji herêmeke Kurdistanê ta herêmekê tê guhertin. Helbet, li gora pîrbûn û belavbûna herêman ew raweyên neyeksane jî bi pîrranî bikar tên. Pirtûkên rêzimana Kurdî, yê li ber destên me jî parekê ji wan têveliyên veguhestina Karan di nav rûpelên xwe de digirin, wek nimûne Karê (çînîn):

**Dema Borî:**

- 1- Min mazî çînîn
- 2- Min mazî çînîne
- 3- Min mazî diçînîn
- 4- Min mazî diçînîne
- 5- Min mazî çînîbûn
- 6- Min mazî çînîbûne

**Dema Nuha:**

- 1- Ez maziyan diçinim
- 2- Ez maziyan diçinime
- 3- Ezê maziyan diçinim
- 4- Ezî maziyan diçinim

**Dema Paşeroj:**



1- Ez ê / dê maziyan biçinim

2- Ez ê maziyan biçinime

3- Ezê dê maziyan biçinim

4- Ez dikim maziyan biçinim

Ev her (12) raweyên pêşkerî (إخباري) jî, di pirtûkên rêzimanî de hatine nivîsîn. Her yek ji wan jî bi navekî hatiye destnîşankirin.....!!

Di warê navlêkirin û veguhestina raweyên daxwazî de, mijar hêj aloztir û lihevketîtir e. Çetin e ku mirov karibe wan raweyan ji hev derîne û têgehên arezûyan di çarçewa demên lihevgeriyayî ji hev bide alî !

Da ku mirov bixwe bigihêje vê rastiyê, gerek li pirtûkên van şarezayên zimên, wek nimûne: (Qenatê Kurdo, Kamîran Bedirxan, Feqe Huseyn Sagniç û Murad Ciwan...) vegere û vê mijarê bişopîne, hingê wê baş bizane, ka çendî ev raweyên daxwazî aloz in û têgihîştina wan jî çendî çetin e !

Bi gotina zanyarên zimanê Firansî, gelek dem û rawe di veguhestina karên vî zimanî de hene. Lê di warê kiryariyê (piratîkê) de, nemaze van demên dawî, hin ji wan raweyên negiring paşguh dibin û bikar nayên. Çiqasî ev gotin rast û hûrbîn be, çiqasî kêr û zêde be jî, ez bixwe piştgirê nûjenkirin û hêskirina zimanê Kurdî me, lê bi mercê ku destdirêjayî negihêje wan rêzik û destûrên bingehîn, ên ku ziman bêyî wan saz û durist nabe... !

Di vê pirtûkê de, ez bi vê baweriyê nêzî babeta Karan bûme û li ber ronahiya vê baweriyê jî, min çendek ji wan raweyên pêşkerî paşguh kirine. Bi dîtina min, hinek raweyên bingehîn şûna hinên herêmkî digirin, anku em karin wan ên herêmkî bavêjin bêyî ku kêmasiyek bigihêje derbirîna me.

Bi vê yekê zimanê me siviktir û petîtir dibe WEK:

**Raweyên Bingehîn**

**Raweyên Devikî**

- Ez diketim

ez diketime

- Ez ketibûm

ez ketibûme

- Ez dikevîm

ez dikevîme

- Ez ê bikevîm

ez ê bikevîme

- Ez ê bikevîm

ezê dê bikevîm.

Bi vê pîvanê raweyên herêmkî yên devikî paşguh dibin û yên ku li tevaya herêman, yan jî li pîrraniya wan bikar tên, di çarçewa van deman de dimînin:

Raweyên pêşkerî yên bingehîn:

**Borî: 1** - Nêzbûriya xwerû: Ez hatim

2 - Boriya sergihayî: Ez hatime

3 - Boriya berdewam: Ez dihatim

4 - Boriya çîrokî: Ez hatibûm

**Nuha:** - Ez tîm / dihîm

**Paşeroj:-** Ez ê / dê bîm / bihîm.

Raweyên daxwazî jî, bi heman bawerî, min ew tevdane. Min hewl daye ku ez wan bi rêbazeke hêsantir vekolim û tevheviya veguhestina wan bi dû pêngavan zelal bikim:

1 - Min giringî daye raweyên sereke, lê yên ku li herêmkên teng, li nav hoz û êlên xwecî bikar tên, tenê min amaje bi wan (qala wan) kiriye û jêderên wan di pirtûkên rêzimanî de destnîşan kirine.

2 - Min her raweyeke daxwazî daye ber demeke pêşkerî. Bi vê yekê her raweyeke daxwazî, di bin navê xwe de, beranberî raweya demeke pêşkerî forma xwe digire.

**Nimûne:**«Çandin»

**Demên Pêşkerî**

**Raweyên Daxwazî**

- Min genim çand Xwezî te jî biçanda

- Min genim çandiye Xwezî te jî çandibe

- Min genim diçand Xwezî te jî çandiba

- Min genim çandibû Xwezî te jî çandibûya

- Ez genim diçînim Xwezî tu jî biçînî

- Ez ê genim biçînim Xwezî tu jî biçînî.

Berçav e ku raweyên daxwazî yên beranberî dema nuha û paşeroj (ayinde) wekî hev, bi forma (biçînî) hatine.

Li vê gorê raweyên daxwazî, ji karê (çandin) bi (5) forman tenê tên. Ew jî ev in (biçanda, çandibe, çandiba, çandibûya û biçînî). Ev form di hemû raweyên daxwazî de (fermanî, mercî, bilanî, xwezînî,

gerekî.....) bikar tên. Helbet, dawiya van forman li gora cor û celebên kar û kesan tên guhertin û li wê gorê paşkokên kesîn (im, î, e, in) digihêjin wan.

Sebaret bi karê (bûn)a rêzder (awarte), min ew bi mînakên ronî kiriye ku ev paşpirtik (im, î, e, in) ne raweyên karê (bûn) di dema nuha de ne, ne cînavên pêvebestî ne jî. Bi dîtina min ew paşkokên kesîn in, li pey nav û cînavên koma (ez) tên û weku peyrewên pabendî, bi wan ve girêdayî ne. Di dema nuha de karê (bûn) tê avêtin û ew paşkok li şûnê dimînin.

Di mijara (bêjesaziya hevokê) de ez tûşî diyardeyeke rêzimanî bûm, beriya nuha min ew di pirtûkên rêzimanî de nedîtibû (dibe ku hebe lê min nedîtiye). Ew diyarde jî ev e: Eger kara û berkarê rasteder nav û cînav bin, jixwe li pêş karên xwe bikar tên, lê ku hevok bin hingê li paş karan tên xebitandin.

Li dawiya vê gotinê ez lêborînê ji wan biraderan dixwazim, ên ku nêrînên min û wan di hin xalan de ne wekî hev hatine û min ew binav kirine. Mebesta min ji wan hevberkirin û binavkirinan, vebir ne diyarkirina kêmasiyan e, tenê min dixwest ez wan xalên ku cihê têveliyê ne zelaltir û ronîtir bikim!

Dawî jî, mebest û armanca me tevan ew e, ku em zimanê xwe bi rêzimanê rast û tekûz biparêzin û hebûna xwe ya netewî jî, bi zimanê xwe biparêzin.

## BIRRÊ YEKEM

- Kar

- Danasîn

- Çima (kar) û ne (lêker)

- Binyat (reg)

**Danasîn:**

Kar bêjeveke guhêrbar e (tê guhertin), serbixwe û watedar e, rûdanekê yan bizavekê di demeke destnîşankirî de berçav dike.

**Wek:** - Zîn çûye zanîngehê

- Şêrko nameyê dinivîse

- Ez ê vê pirtûkê bidim te.

Diyar e, ku her bêjeveke binxêzkerî, di van mînakên jorîn de bûyereke yan bizaveke di demeke nîşankirî de bi xwe ve digire:

- Zîn çûye.....(bizava çûnê di dema borî de)

- Şêrko dinivîse (bûyera nivîsînê di dema nuha de)

- Ez ê bidim (bûyerê danê di dema paşê de).

**Dêmek,** Kar ew bêje ye, ya ku têgeha rûdan û demê, bi hev re dide.

**Bi** vê danasînê, jêderên (raderên) Karan, wek (çûn, hatin, xwendin, nivîsîn...) ne kar in, çiku bûyer di wan de heye, lê dem nehatiye nîşankirin. Bo vê egerê jî, jêder li ser navan hatine jimartin û nebûne Kar. Lê jêderên Karan in, anku Kar ji wan der tên.

- **Çima (Kar) û Ne (Lêker) ?!**

**Beranberî** gotina (verb\*<sup>(24)</sup> - الفعل) gelek navlêkirin di zimanê Kurdî de hatine xebitandin. Her şarezayekî zimên, li gora dîtina xwe, navek li şûna zaraveyê<sup>(25)</sup> (verb) bikar aniye:

- Dr. Qenatê Kurdo û Tewfîq Wehbî: (Fêl - Fi'il) (فعل).

- Reşîdê Kurd: (Pîşk).

- Cigerxwîn: (kirin).

- Celadet Bedirxan, Kamîran Bedirxan, Feqe Huseyn Sagnîç û hinin dîtir jî: (Lêker).

- Mihemedî Xal û Şêx Mihemedî Merdox û hinin dîtir:(kirdar).

- Nûrî E'lî Emîn û Ebdurehman Hacî Ma'rûf: (ferman).

- Sadiq Behadîne Amêdî: (Kar, Kirin).

**Helbet** van zimanzanên binavkirî, ew navlêkirinên me li jor diyar kirine di pirtûkên xwe de xebitandine.

24- Verb : Ingilîzî ye, anku (الفعل).

25 - Zarave : Navlêkirin (têrm ).

Em dizanin ku dema navek li kesekî yan tişteki dibe, mebest ji wê navlêkirinê ew e ku ew kes yan jî ew tişt bi wî navî ji nav celebên xwe bê nasîn. Lê ku gelek nav li yek kesî yan yek tiştî bibin, bêguman ew kes û ew tişt bê nav dimînin. Boyî vê egerê jî, pêdivî ye ku ev kêşeya zaraveyan (têrman) di hemû babet û mijarên ziman û rêzimana Kurdî de çareser bibe.

Li Kurdistana başûr gotina (kar) bo (verb) hatiye pejirandin û bi şeweyekî fermî bikar tê. Lê di nav Kurdên bakur û rojava de gotina (lêker) (li ser şopa Celadet Bedirxan) tê xebitandin.

Bi baweriya min gotina (lêker) cihê (verb) nagire. Wisan jî pirraniya wan navlêkirinên destnîşankirî.

Beriya ku em bikevin gêra mijara xwe divê ez bibêjim, ku min jî gotina (kar) pejirandiye û ez ê wê di vê nivîsarê de bixebitînim <sup>(26)</sup>.

Li gora ku hayê min jê heye, nivîserê herî pêşîn, yê ku gotina (lêker) bi wateya (verb) xebitandiye Celadet Bedirxan e. Celadet ev gotin di govara (HAWAR)ê de (1932 - 1943) bikar aniye. Wisan jî, weku zarave (têrm) di pirtûka xwe ya rêzimanî de (Bingehên Gramêra Kurdmancî) ew xebitandiye. Li ser şopa Celadet jî pirraniya şarezayên zimanê Kurdî li bakur û rojavayê Kurdistanê (ji bilî Reşîdê Kurd û Cegerxwîn) di pirtûkên xwe de gotina (lêker) bikar aniye.

Dibe ku mirovek bipirse: Di nivîsarên xwe yê pêşîn de te bêjeya (lêker) bikar aniye, lê van salên dawî te baweriya xwe guhertiye û tu (kar) li şûna (lêker)ê dixebitîni, gelo ev guhertin li ser çi bingehê pêk hatiye ?!

Bi dîtina min, navlêkirina (lêker) cihê gotina (verb - الفعل) nagire. Li gora pîvan û rêpîvana dariştina zimanê Kurdî (lêker) raweya navê kara ye (اسم الفاعل), ne ku kar bixwe ye. Anku (lêker) ew kesê ku lêdike, ne lêkirin e.

Wekî ku em bibêjin, navê kara ji van karên jêrîn, bi van raweyan tê:

Ji (kuştin)ê: Yê ku dikuje, (kujer) e

Ji (nivîsîn)ê: Yê ku dinivîse, (nivîser) e

Ji (xwendin)ê: Yê ku dixwîne, (xwîner) e.

---

26 - Beriya vê nivîsarê jî min zaraveya (kar) di her dû pirtûkên xwe de (Nav, Cînav...) bikar aniye.

Lê ka çawa raweya navê kara ji karan tê dariştin ?! Çawa (lêker) ji (lêkirin) bûye navê kara ?! Bi gelemperî, raweya navê kara (اسم الفاعل) ji binyata dema nuha (reg), ya karên derhingêv (têper) û paşgira (er) saz dibe.

Anku: Binyata nuha + er = navê kara.

**- Binyat (reg):**

Binyata Kar ew kurtebêjeya resen e, ya ku Kar raweya xwe ya watedar, pê û li ser wê ava dike. Anku, ew beşê neguhêrbar e, yê ku di veguheztin û guhertina raweya karan de, weku bingehekê (bê guhertin) ji karan dimîne.

Çi karê di zimanê Kurdî de heye du binyat jê re hene:

- Binyata dema borî.

- Binyata dema nuha.

A - Binyata Borî ew binyat e, ya ku di dema borî de destnîşan dibe. Ev binyat bi veguheztina karan digel kesê dûwem ê yekjimar (ew, wî, wê) tê wergirtin.

Anku, bi avêtina nîşandeka jêderî, ji jêderên karan.

Wek:

<u>Jêder</u>	<u>dema borî</u>	<u>binyat</u>
- Bûn	ew bû	bû...
- Hatin	ew hat	hat....
- Xwendin	wî xwend	xwend..
- Kenîn/ kenîyan ew kenî/keniya kenî / keniya..		
- Danasîn	wê danasî	danasî..

B - Binyata Nuha jî, ew binyat e, ya ku ji karan di dema nuha de tê wergirtin. Ev binyat ji karên dema nuha bi avêtina pêşgira dema nuha (di) û paşkokên kesianî (im, î, e, in).Wek:

<u>Jêder</u>	<u>Dema Nuha</u>	<u>Binyat</u>
- Bûn	(ez) dibim	...b....
- Çûn	(tu) diçî	...ç.....
- Nivîsîn (ew) dinivîse	...nivîs...	
- Kolan	(em) dikolin	... kol....

Eger kar dariştî be yan lêkdayî be, dîsan binyata nuha ji karê nuha bi avêtina nîşandeka (di) û paşkokaan tê. Wek:

<u>Jêder</u>	<u>nuha</u>	<u>Binyat</u>
- Rabûn	(ez) radibim	ra...b...(rab)
- Lêçûn	(tu) lêdiçî	lê...ç...(lêç)
- Daweşandin (ew)dadweşîne da...weşîn (daweşîn)		
- Vekolan	(hûn) vedikolin ve...kol .. (vekol)	

**Navê Kara:**

Berî nuha jî me gotibû, navê kara ji binyata karên derhingêv (têper) û paşgira (er) pêk tê (27). Lê divê ew binyat, ya dema nuha be, ne ya borî be. Li vê gorê navên kara ji van karên jêrîn bi vî şêweyî pêk tên:

- Hilkişandin: Hilkişîn + er = hilkişîner (yê ku tiştêkî hildikişîne)
- Jêkirin: Jêk + er = jêker (yê ku tiştêkî jêdike)
- Raxistin: Rax + er = raxer (yê ku tiştêkî radixe)
- Lêkirin: Lêk + er = lêker (yê ku tiştêkî lêdike)
- Vekuştin<sup>(28)</sup>: Vekuj + er = vekujer (yê ku tiştêkî serjêdike).

(Lêkirin) karekî lêkdayî (hevbend) e ji:

- Pêbesta (li) + Cînavê kesîn (wî, wê) + kirin) pêk hatiye. Anku: Li + wî / wê = (lê) + kirin = lêkirin.

Navên kara ji karên lêkdayî jî, weku karên xwerû û dariştî pêk tên, nemaze yên ku bi karê (kirin)ê re saz dibin. Wek:

- Sorkirin: Sork (Sork + er) = Sorker.
- Zîne hêkan sor dike (ew Sorkera hêkan e)
- Rastkirin: Rastk (rastk + er) = rastker
- Tu şaşiyar rast dikî (tu rastker î)

27 - Binyata nuha : ne ji hemû karên derhingêv bi wî şêweyê li jor der tê. Em ê vê mijarê paşê, di cih û dema wê de rave bikin.

28 - Li Herêma Behdînan, Vekuştin Serjêkirin e (serbîrîn e).

- Û (karker, xebatker, zîvker...)

Wilo jî:

- Ji (çêkirin)ê ----- çêker

- Ji (jêkirin)ê ----- jêker

- Ji (pêkirin)ê ----- pêker

...Û ji (lêkirin)ê ----- lêker

Berçav e, ku li gora vê pîvanê bêjeya (lêker) bi wateya (verb - الفعل) nayê, lê wateya navê kara (yê ku karê lêkirinê dike) bi xwe ve digire.

Ji ber vê yekê jî, min gotina (kar) li şûna (lêker) bikar aniye.

## BIRRÊ DUWEM

- Beşên Karan

**A - Ji hêla teşe û binesaziyê ve**

**1 - Karên Xwerû**

**2 - Karên Dariştî**

a - Pêşgir

b - Paşgir

**3 - Karên Lêkdayî**

**B - Ji hêla hêzê ve**

1 - Karên Nederhingêv

2 - Karên Derhingêv

a - Derhingêvên Resen

b - Derhingêvên Sazkirî



- Têbînî

**C - Ji hêla binyatê ve**

- Karên Yekreh

- Karên Dureh

www.arsîva.kurdî.org

## Beşên Karan

Kar di zimanê Kurdî de ji (3) hêlan ve parve dibin:

- Ji hêla teşe û binesaziyê ve.
- Ji hêla hêzê ve.
- ji hêla binyatê (rehê) ve.

Her hêlek (aliyek) ji van hêlan jî, li ser çend beşan parve dibe:

### A -Kar Ji Hêla Teşe û Binesaziyê Ve:

Kar ji hêla teşe û binesaziyê (formê) ve dibin (3) beşên sereke:

- Karên xwerû (sade).
- Karên dariştî (xurdezad).
- Karên lêkdayî (hevedûdanî).

#### 1 - Karên Xwerû:

Karên xwerû (sade) ew kar in, ên ku binesaziya wan ji bêjeyeke rût (bê zêdebûn) pêk hatibe û têgeha bûyerekê di demeke nîşankirî de bi xwe ve girtibe, weku karên ku ji van jêderan tên der:

- Hatîn: Memo hatiye civînê
- Nivîsîn: Zîn nameyê dinivîse
- Parastin: Em ê zimanê xwe biparêzin

#### 2 - Karên Dariştî:

Karên dariştî jî ew kar in, ên ku binesaziya forma wan ji karekî xwerû (sade) û pêşgîrekê yan paşgîrekê durist dibe, wek (vekişîn, kişandin).

##### a - Pêşgir:

Pêşgirên ku dikevin ser karên xwerû û karên dariştî saz dikin ev in: ((da, hil (hel), ra, ve, wer, rû)).

Ev pêşgir bi ser karên xwerû ve tên berdan û wateyên wan diguhêrin. Anku, her pêşgîrekê ji wan bi karekî xwerû re karekî dariştî bi wateyeke nû durist dike:

- **(Da):** Ev pêşgir dikeve ser karên xwerû û wateya bizaveke berû jêr ve bi ser karê dariştî ve berdide.

Wek: Da + ketin = daketin (Memo ji ser darê daket)

-Da + hatin = dahatin (Pêlên lehiyê dahatin)

- Da + dan = dadan

- Da + Xistin = daxistin

- Da + werivîn = dawerivîn.

Hindek caran jî ev pêşgir ji wateya bizava berû jêr ve tê der: - Da + gerîn / geriyan = / dagerîn / dageriyan

(Mêvan dagerîn / dageriyan mala we)

- Da + berizîn = daberizîn:

(Reşo daberizî neyarê xwe)

Diyar e, ku di bin bandora pêşgira (da) yê de wateyên van karên xwerû (ketin, hatin, dan, xistin, werivîn, gerîn / geriyan, berizîn) hatine guhertin û vê pêşgîrê karinî dariştî bi watene nû ava kirine, (daketin, dahatin, dadan, daxistin, dawerivîn, dagerîn / dageriyan, daberizîn).

**-(Hil, Hel):**

Ev pêşgir bi karên xwerû re wateya bizaveke ji jêr berû jor ve dide.

Wek: - Hil + kirin = hilkirin:

(Remo şitlên bacanan ji rehan ve hilkirin).

- Hil + dan = hildan:

(Her kes barê xwe hildide ser milê xwe).

- Hil + girtin = hilgirtin:

(Zîne birayê xwe hilgirtiye).

- Hil + kişandin = hilkişandin:

(Şivên bizinên xwe hilkişandin pala çiyê).

- Hil + perikîn = hilperikîn:

(Bizin hilperikîne lûtka çiyê).

**Hin caran jî, pêşgira (hil) wateya bizaveke bêhêl (bêlayan) dide Wek:**

- Hil + avêtin = hilavêtin: (Sîrwan top hilavêt).

- Hil / hel + bijartin = hilbijartin / helbijartin:

(te kîjan xwest wî hilbijêre / helbijêre).

- **(Ra):**

Ev pêşgir jî bi karên xwerû re karên dariştî saz dike û wateya bizaveke bêlayan (bêhêl) dide Wek:

- Ra + kirin = rakirin:

(Sîno nexweşê xwe rakir nexweşxaneyê).

- Ra + hatin = rahatin:

(Ez rahatime xwendina berî xewê).

- Ra + ketin = raketin: (karker zû raketin).

- Ra + hiştin = rahiştin:

(Qirşvanan rahiştin piştîyên xwe).

- Ra + kişîn = rakişîn (rakişîyan):

(Pêşmerge rakişîn / rakişîyan çiyê).

- Ra + westan = rawestan:(Pale radiwestin).

- HD.....

- **(Ve):** pêşgira (ve) jî bi gelemperî wateya rûdaneke asoyî û ber fireh dide karên dariştî, wek:

- Ve + kirin = vekirin:

(Ehmedê Xanî gelek dergehên girtî vekirine).

- Ve + gerîn = vegerîn:

(Bêrîvanî ji bêriyê vegerîn / vegerîyan).

- Ve + lîstin (leyistin) = velîstin / veleyistin:

(Nexweş ji ber taya tund vedilîst / vedileyist).

- Ve + xwarin = vexwarin:

(Havînê mirov pir avê vedixwe).

- Ve + dan = vedan:

(Hindek cil rengên xwe vedidin).

- HD.....

- **(Wer):**

Bikaranîna vê pêşgirê di Kurmanciya jorîn de kême, wek:

- Wer + girtin = wergirtin:

(Karmendan mûçeyên (29) xwe wergirtin).

- Wer + dan = werdan:

(Zîn avê di beroşê werdide .

- Wer + gerandin = wergerandin:

(Şêro çîrokê werdigerîne).

**Di kurmanciya xwarê de jî ev pêşgir tê xebitandin:**

- Wer + badan = werbadan.

- Wer + pêçan = werpêçan.

Ji bilî vê (wer)a pêşgir jî, bêjeya (wer, werîn) bi watene dîtir bikar tê, wek: Wilo, Wiha, Wisan.

- Weriyar: Karekî xwerû ye, bi wateya (ketin, weşîn / weşiyar

- (Pelên daran weriyar).

- (Were vir, da em biçin gulistanê).

- (Ka wê pênuşê werîne vir).

- **(Rû):**

Ev pêşgir têgeha bizaveke ber bi jêr ve dide karên dariştî. Wek:

- Rû + kirin = rûkirin:

(Zîn çayê rûdike peyalê).

- Rû + niştin = rûniştin:

(Mêvan li ser kulavan rûniştin).

- Rû + dan = rûdan:

(Bi Nûrozê re nişeyên biharê rûdidin).

**b - Paşgir:**

Li gora ku ez zanim, di Kurmanciya Jorîn de (2) du paşgirên karan hene, ew jî ev in, (andin) û (ve). Ev paşgir digihêjin karên xwerû û wateyên wan, li gora taybetiyên xwe, diguhêrin:

**-(Andin):**

Em dizanin ku di zimanê Kurdî de du beşên karan hene:

- Karên derhingê (derbaz / têper)
- Karên nederhingêv (nederbaz / têneper).

**- Karên Derhingêv:**

Karên derhingêv ew kar in, ên ku bûyerên wan derbasî ser berkarên rasterast (rasterast) dibin. Anku, bûyer û bizavên kiryarên wan dihingivin berkaran. Bi vê yekê hevoka karê derhingêv ji (3) sê hêmanên bingehîn pêk tê. Ew hêman jî ev in:

(kara - berkar - kar).

Wek: Şagirt: helbestê dixwîne

Şagirt: Kara ye (فاعل)

Helbestê: Berkar e (مفعول به)

Dixwîne: Kar e (فعل)

Gelek caran hevalnav û hevokar jî di hevoka karê derhingêv de (bo têkirina wateya hevokê) tên.

Wek: Şagirt li ber hevalan helbestê dixwîne.

**- Karên Nederhingêv:**

Karên nederhingêv jî ew kar in, ên ku hevokên wan bi kara û karên wan tenê sergihayî (temam) dibin, bêyî ku pêdivî bi berkarên rasterast hebe. Bi vê danasînê hevoka karê nederhingêv ji (2) du hêmanên sereke pêk tê. Ew jî (Kara û Kar) in. Wek:

- Şagirt rawestiyane

Şagirt: Kara ye (فاعل)

Rawestiyane: Kar e (فعل)

Di hindê hevokan de têker jî li rex wan her du hêmanan bikar tên. Wek:

Vê êvarê şagirt li dora dibistanê ne.

Paşgira (andin) digihêje karên nederhingêv û wan dike karinê derhingêv. Wek:

- Bezîn + andin = bezandin:

(Memo bezî / beziya)

(Min ew bezand).

- Razan + andin = razandin: (Zarok razan)

(Dayika zarokan ew razandin).

Ev paşgir digihêje hindêk navan û wan dike karinî derhingêv. Wek:

Şop + andin = şopandin:

(Kurdan dîroka xwe şopandine).

- Tep + andin = tepandin:

(Zînê zaroka xwe tepand).

- **(Ve):** <sup>(30)</sup>

Paşgira (ve) li Herêma Behdînan bikar tê. Ev paşgir bi mebesta dubarekirina bûyerên karan tê xebitandin. Wek:

- Hat + ve = hateve

- Xwar + ve = xwareve

- Zîvirî + ve = zîvirîve

- HD.....

Paşgira (ve) di şêwezarê Kurmanciya Xwarê bi şêweyê (we) tê xebitandin:

- Kirdin + we = kirdinewe

- Xwardin + we = xwardinewe

-HD.....

Ji bilî van her du paşgiran (andin) û (ve), hin paşgirên dîtir jî, wek (ijî, ixî) hene. Ev paşgir bi şêweyekî awarte (rêzder) digihêje hinek nav û hevalnavan (rengdêran) û bi wan re karinî sazber (çêkirî) durist dikan.

- **(Ijî):**

- **Kel:** - kel + ijî = kelijî (zêde keliya)

(Savar li ser êgir kelijî)

(Savar dikelije)

(Savar ê bikelije)

- **Hilm:** - Hilm + ijî = hilmijî (hilm pêket)

(Goşt hilmijî)

(Goşt dihilmije)

(Goşt ê bihilmije)

- **Helm:** - Helm + ijî = helmijî (keldûman jê çû)

(Xwarin helmijî)

(Xwarin dihelmije)

(Xwarin ê bihelmije)

- **Tam:** - Tam + ijî = tamijî (rahatî tamê)

(Bizina kol tamijî nokên şor)

(Bizin ditamije nokên şor)

(Bizin ê bitamije nokên şor)

- **Germ:** - Germ + ijî = germijî (germixî)

(Ew xwarin li ber rojê germijî)

(Xwarin digermije)

(Xwarin dê bigermije)

- **Nerm:** - Nerm + ijî = nermijî

(Birinc nermijiye)

(Birinc dinermije)

(Birinc ê binermije)

- **Teng:** - Teng + ijî = tengijî (xeyidî)

(Reşo ji gotina te tengijî)

(Reşo zû ditengije)

(Reşo dê bitengije)



**-Hirm:** - Hirm + ijî = hirmijî (kir hirmîn)

(Şêr li temaşekerên xwe hirmijî)

(Şêr dihirmije)

(Ku tu nêzî şêr bibî ew ê bihirmije)

- HD.....

Ev paşgir nagihêje her nav û hevalnavî, çiku ew bi şêweyekî bihîstinê gihîştîye wan nav û hevalnavên jorî û ne durist e ku li wan bê pîvan.

**- (Ixî):**

Paşgira (ixî) jî, weku (ijî) digihêje hinek nav û hevalnavan û karinî sazber (çêkirî) pêk têne. Ev paşgir jî bi şêweyekî rêbihîstin û awarte digihêje hindêk nav û hevalnavan, ne tevan. Wek:

**-Term:** Term + ixî = termixî (bûye wek term)

(Pale ji kar hatine û termixîne)

(Pale ji kar tîn, vedikevin û ditermixin)

(Êvarî ew ê bitermixin)

**-Germ:** Germ + ixî = germixî (germê ew xerab kiriye)

(Ev xwarin şevnivistî maye, germixîye)

(Xwarina neparastî digermixe)

(Xwarin dê bigermixe)

**-Xew:** <sup>(31)</sup> Xew + ixî = xewixî (bêhêz bû)

(Karker bê xew û xwarin xewixîye)

(Her ku şevbuhêrk dirêj dibe em dixewixin)

(Heval bê xew û xurek dê bixewixin)

**-Perr:** (perrên balindeyan)

- Perr + ixî = perrixî (bêhêz maye)

(Ev pîrejin mezin bûye, perrixîye)

(Mirov pîr dibe, diperrixe)

(Ku temen dirêj bibe, em ê biperrixin)

-HD.....

Ev karên ku ji hinek nav û hevalnavan bi alîkariya paşgirên (ijî, ixî) saz dibin, ji wan re tê gotin (karên sazber), anku (karên çêkirî). Çunkî forma binasaziya wan, ne li gora rêzik û rêpîvaneke karan pêk hatiye.

Di vê helbesta ku di navbera **Melayê Cizîrî** û helbestvanekî bi navê (**Laxer**) de derketiye, paşgira(ixî) bi rêzbandê re hatiye xebitandin:

-**Laxer**: Bê keştî li ber behrê firaqê errixîm ez

Xewfek min hebû, lew bi wisalê perrixîm ez

Bihnek ji wisalê me bihîst û kerrixîm ez

-**Cizîrî**: Wek tole li pey mûçe, li dorê çerrixîm ez

Çixkir me hebîbê: Ka tu narî?! biqêşî<sup>(32)</sup>

**Têbênî:**

A - Hindek şarezayên zimanê Kurdî di pirtûkên xwe

de ev bêje (pê, jê, tê, lê) weku pêşgirên karan

xebitandine (S. B. Amêdî - Rêzimana Kurdî. Bexda (1987). Rû (296 - 297).

Bi hizra min, ew bêje ne pêşgirên karan in. Ji ber ku pêşgirên karan (bi tena xwe) bê wate ne, wek (da, ra, ve...), lê ku dikevin ser karan bandorê li wan dikin û wateyên wan diguhêrin, wek (ketin, daketin, raketin, veketin....).

Ev (pê, jê, tê, lê) bêjeyin watedarin, ji pêrbest û cînavine kesîn saz bûne.

Wek: - Bi + wî / wê = bê = pê

(Pêvedan, pêketin, pêxistin.....)

- Ji + wî / wê = jê

(Jêkirin, jêbirin, jêbûn.....)

- Li + wî / wê = lê

(Lêdan, lêkolîn, lêxistin.....)

32 - Dîwana Cizîrî (şirovekirina Zivingî). Heleb (1987). Bergê duwem - Rû (679).

- Laxer : Rastnavê wî Şêx Xalidê Zîbarî ye.

Helbet, mebesta min ji gotina (ne pêşgir in) ew e, ku ji hêla binasazî û watedariyê ve ew nakevin rêza pêşgiran, digel ku li pêş karan û bi wan ve jî tîn xebitandin.

B - Hindek caran pêşgir û paşgir bi hev re digihêjin hin karên xwerû û karinî dariştî saz dikin.

Wek: - Ra + west + andin = rawestandin

- Ve + kiş + andin = vekişandin

- Da + hej + andin = dahejandin

C – Diyar e ku paşgira (andin) digihêje binyata (regê) dema nuha, ya karên nederhingêv û wan dike karinî derhingêv:

- Bezîn: Bez + andin = bezandin

- Revîn: Rev + andin = revandin

- Hejîn: Hej + andin = hejandin

### 3 - Karên Lêkdayî:

Karên lêkdayî ew kar in, ên ku binasaziya forma wan ji bêjeyê watedar, yan pirtir û karekî (33) pêk tînin. Bêjeyên watedar jî ew bêje ne, yê ku her yek ji wan bi tena xwe wateyekê dide, wek (nav, cînav, hevalnav û hevalkar). Her yek ji van celebên bêjeyan, bi alîkariya hin karan, dikare karekî lêkdayî saz bike:

- Nav + kar = karê lêkdayî

- Cînav + kar = karê lêkdayî

- Hevalnav + kar = karê lêkdayî

- Hevalkar + kar = karê lêkdayî

Li vê gorê karên lêkdayî bi van pêngavan saz dibin:

#### Nav + Kar:

Av: - Av + dan = avdan

(Reşo zevî avda)

(Ez ê gulên avbidim / avdim)

Ber: - Ber + avêtin = beravêtin

(Bizina Fatê beravêt)

(Çima bizinê beravêtiye ?)

Dil: - Dil + ketin = dilketin

(Mem dilketibû Zînê)

(Xort û keç dildikevin hev)

Hez:- Hez + kirin = hezkirin

(Em ji zimanê xwe hezdikin)

(Eger tu ji zimanê xwe hezdikî, wî biparêze)

Wisani jî (girêdan, berdani, rûdan.....)

HD.....

### **Cînav + Kar:**

Hêja ye bîranînê ku cînavên **pevxistî**, ew cînav in, yê ku ji pevxistina van pêbestan (bi, di, ji, li) û cînavên kesîn (wî, wê) kurtebirr bûne.

Wek: - Bi + wî / wê = bê = pê

- Di + wî / wê = dê = tê

- Ji + wî / wê = jê

- Li + wî / wê = lê

Yan jî, ji wan pêbest û cînavên nîşandanê (vî, vê, wî, wê) kurtebirr bûne.

Wek: - Bi + (vî, vê, wî, wê) = bê = pê

(Te bi vî hevalî re kar kiriye ?)

(Te (bi + vî) pê re kar kiriye ?)

- Di + (vî, vê, wî, wê) = dê = tê

- Ji + (vî, vê, wî, wê) = jê

- Li + (vî, vê, wî, wê) = lê

Ev cînavên pevxistî û kurtkirî (pê, tê, jê, lê) bi ser hindê karan ve tên berdani û karinê lêdayî, bi wateyî nû saz dikin.

### **Nimûne:**

Pê: - Pê + ketin = pêketin

(Agir bi pûş ket)

(Agir pêket / bi wî ket)

- Pê + xistin = pêxistin

(Min agir bi pûş xist)

(Min agir pêxist)<sup>(34)</sup>

- Pê + vedan = pêvedan

(Dûpişkê bi Fatê (vedaye)

(Dûpişkê pêvedaye)

Tê: - Tê + dan = têdan

(Aras nîvişk di nanê xwe da)

(Aras nîvişk têda)

- Tê + ghiştin = têghiştin

(Ez di gotina te de ghiştim)

(Ez têghiştim)

- Tê + vedan = têvedan

(Şêro di otobîsê de veda)

(Şêro têveda)<sup>(35)</sup>

Jê: - Jê + kirin = jêkirin

(Zînê kiras ji Fatê kir)

(Zînê kiras ji wê kir)

(Zînê kiras jêkir)

- Jê + bûn = jêbûn

(Zîna mehîne ji wê bû)

---

34 - Li gelek herêman, ev karên lêkdayî (pêket, pêxist) bi şeweyê (vêket, vêxist) jî bikar tên. Bi hizra min, hevguherîn di navbera tîpa (p) û (v) de çêbûye. Anku, bi demê re (p) bûye (v) û wilo jî (pêketin, pêxistin) bûye (vêketin, vêxistin).

35 - Têvedan : Pêşdeda. Ev karê lêkdayî bi şeweyekî berfireh li herêma (Efrînê) bikar tê.

(Zîna mehînê jêbû)

(Ev gul jêbûye, kê ew jêkiriye ?)

Lê: - Lê + dan = lêdan

(Memo ghişte derî û li wî da)

(Memo ghişte derî û lêda)

(Lêdana zarokan ne durist e)

- Lê + kirin = lêkirin

(Kesê dijminahiya me bike, em ê li wî xin)

(Kesê dijminahiya me bike, em ê lêxin)

(Wî li min xist û min jî lêxist)

Ji bilî wan cînavên pevxistî, hin cînavên dîtir jî, ji pêbest û cînavên hevayî (hev, êk) hatine kurtkirin û pevxistin.

Wek: - Bi + hev = pev

- Bi + êk = pêk

- Di + hev = tev

- Di + êk = têk

- Li + hev = lev

- Li + êk = lêk

Ev cînavên kurtebirr û pevxistî (pev, pêk, tev, têk, lev, lêk) dikevin ser karan û karinê lêkdayî, bi wateyin nû pêk tînin.

**Nimûne:**

Pev: - Pev + çûn = pevçûn

- Pev + ketin = pevketin

Pêk: - Pêk + hatin = pêkhatin

- Pêk + anîn = pêkanîn

Tev:- Tev + dan = tevdan

- Tev + rakirin = tevrakirin

Têk:- Têk + çûn = têkçûn

- Têk + dan = têkdan

Lev:- Lev + hatin = levhatin

- Lev + ketin = levketin

Lêk:- Lêk + dan = lêkdan

- Lêk + hatin = lêkhatin

-Jev, Jêk: Jevketin, jêkbirin

Di warê kiryarî de ev karên lêkdayî, yên ku ji hev girtina kar û cînavên pevxistî saz bûne, ne li yek astê tene xebitandin. Hindek ji wan bi şêweyekî berfireh û rojane, li gelek navçe û herêman bikar tên, wek: (pevçûn, pevketin, pêkhatin, pêkanîn, tevdan, tevrakirin, têkçûn, lêkdan...). Hinek ji wan li asteke teng û li hin herêman bikar tên, wek:(têkdan, levhatin, levketin, jevketin, jêkbirin...).

Berçav e ku ev karên lêkdayî, bi şêweyekî gelêrî li ser zimanan sivik bûne û bi wê sivikbûnê jî, li hindek herêman tên xebitandin.

#### **Hevalnav + Kar:**

Hevalnav ew bêjeyên watedar in, yên ku li pey navan bikar tên, rewş, reng û çawaniya navên berî xwe diyar dikin, wek (gula sor, hevalê dilsoz, mirovên mêrxas, stêrên geş...). Di parvekirina bêjeyan de hevalnav jî (weku hevalkar û jêderan) dikevin bin sîwana navan. Karên lêkdayî bi hevalnav û karên alîkar (bûn, kirin) jî pêk tên.

Wek: - Sor + bûn = sorbûn

- Sor + kirin = sorkirin

- Nerîna te zelal -- bû

- Te nêrîna xwe zelal -- kir

- Heval pir -- bûn

- Me heval pir -- kirin

- Qûnax nêzîk – bûn

- Me qûnax nêzîk – kirin

- Gundên me vala – bûn

- Dijmin gundên me vala – dikin

- HD.....

### Hevalkar + Kar:

Hevalkar jî ew bêje ne, yên ku bi karan ve girêdayî ne, dem û cihên bûyerên karan (qewimandina wan) destnîşan dikin.

Wek: - Par ez çûm Hewlêrê

- Îsal em ê herin Amedê

- Min pênuş danî ser pirtûkê

- Şagirt pêş de çûn, hin jî li paş man

Diyar e, ku gotinên (par, îsal) dema bûyîna karên (çûm, herin) destnîşan dikin. Gotinên (ser, pêş, paş) jî cihê bûyîna karên (danî, çûn, man) didin nasîn.

Karên lêkdayî ji hevalkarên cîgehî û hindek karan pêk tên. Wek: - Ser + keftin = serkeftin

- Şêro di ezmûnê de serkeft / biserket

- Paş + ketin = paşketin

- Zîne di xwendina xwe de paşketiye

- Pêş + xistin = pêşxistin

- Mamosta şagirtên xwe pêşxistine

- Û paşketin, paşxistin, pêşveçûn,

Paşveçûn, pêşvebirin.....

Hindek caran jî gelek hêmanên sazkirina karên lêkdayî digihêjin hev û bi hev re karekî lêkdayî pêk tînin.

Wek: - Ser + jê (ji wî, wê) + kirin = serjêkirin

- Memo berxek ji mêvanan re serjêkir.

### B - Kar Ji Hêla Hêzê Ve

Mebesta me ji gotina (hêzê) ew şiyar û bandora karan di warê avakirina hevokan de ye, weku em bibêjin:

1 - Şêrko rabû

2- Şêrko hevalê xwe rakir



Di hevoka yekê de bûyera karê (rabû) di çarçova karayê xwe (Şêrko) de maye, bêyî ku derbasî ser bêjeyêke dîtir bibe û bihingive wê. Anku, bûyer û bizava karê (rabû) di sînorê kiryarê xwe de, ku ew jî (Şêrko) ye, dimîne.

Li vê gorê (rabû) karekî nederhingêv e, hêza wî ji karayê wî derbas nabe û nahingive bêjeyêke dî.

Di hevoka duwê de, bûyera karê (rakir) ji çarçova karayê xwe (Şêrko) derketiye, derbasî ser bêjeya (heval) bûye û hingiviye wê. Bi vê derbasbûnê karê (rakirin) dibe karekî derhingêv (têper).

Li vê gorê kar di zimanê me de (ji hêla hêzê ve) dibin du beş:

- Karên nederhingêv (têneper)
- Karên derhingêv (têper).

### **1 - Karên Nederhingêv:**

Karên nederhingêv (têneper) ew kar in, ên ku bûyerên wan ji karayên wan derbas nabin ser berkarên rasteder (rastewxo). Anku, hevokên karên nederhingêv ji du hêmanên serekî ava dibin. Ew hêman jî kara (kiryar) û karên wan in.

Wek:- Memo hat

- Nesrîn radiweste

Berçav e ku ev her du hevok ji hêla wateyên xwe ve sergihayî (temam) in û ji hêla binasaziye ve jî, ji kara (Memo, Nesrîn) û karên wan ên nederhingêv (hat, radiweste) pêk hatine. Lê gelek caran têrkerên hevokan jî, wek (daçek, alav, hevalnav, hevalkar.....) di pêvajoya hevokan de bikar tên wek:

- Memo ji xwendingehê hat malê
- Nesrîn li ber darê radiweste.

Di van her du hevokan de, ev bêje (ji xwendingehê..... malê.....li ber darê) têrker in, wateyên hevokan têtir û zelaltir dikin.

Her sê corên karên nederhingêv, (xwerû, dariştî û lêkdayî), di hemû dem û raweyên veguhestinê de bi cînavên kesî, ên koma (ez) re tên xebitandin.

Wek: - Ez ketim

- Tu daketî
- Ew veket

- Hûn derketin

Bi nav û cînavên ditir re, yên ku ne di raweya verêsê de jî, tên xebitandin.

Wek: - Ez vegeriyam gundê xwe

- Restem li welêt dimîne

- Zîn ji welêt vegeriya

- kî çûye û kî hatiye ?

- Ew çûye û ew hatiye.

Di vê raweya rast û rût (bê verês) de nîşandekên jimara navan (yekjimar û komjimar) li karayên (kiryarên) van karên nederhingêv diyar nabin, ne li navan û ne li cînavan. Ew nîşandek li karên wan nav û cînavên ku kara ne xuya dibin.

Wek: 1 - Ev heval çûye Amedê (yek heval)

- Ev heval çûne Amedê (gelek heval)

2 - Xwendekar tê (dihê) û diçe (yek)

- Xwendekar tên (dihên) û diçin (kom)

3 - Ew ji xew rabû û derket (yek)

- Ew ji xew rabûn û derketin (kom)

Di mînaka yekem de cînavê nîşandan (ev) bo yekjimar û komjimarê jî bikar hatiye, wilo jî navê (heval) bo her du jimaran bikar hatiye, bêyî ku nîşandekên jimarê li wan xuya bin (ev heval). Lê ew nîşandek digihêjin karên wî nav û cînavî (çûye, çûne).

Di mînaka duwem de navê (xwendekar), bi jimara yekê û komê bikar hatiye, nîşandekên jimara wî li karên wî xuya bûne (tê û diçe, tên û diçin).

Di mînaka sêyem de jî cînavê (ew) carekê bi yekjimarî bikar hatiye û carekê bi komjimarî. Lê nîşandekên jimara vî cînavî li karê wî xuya dibe (rabû û derket, rabûn û derketin).

## 2 - Karên Derhingêv:

Karên derhingêv ew kar in, ên ku bûyerên wan ji çarçewa karayên (kiryarên) wan dertên û dihingivin berkarên rasteder. Karên derhingêv dibin du beş:

- Derhingivên Resen

- Derhingêvên Sazkirî

### A - Derhingêvên Resen:

Karên derhingêvên resen ew kar in, ên ku di hebûna xwe ya resen de derhingêv in. Anku, wekî ku hene (bêyî alîkarî) derhingêv in, wek (kirin, rakirin, xistin, daxistin, birin, dan, berdan, avdan, girtin, vegirtin, çandin, hilçandin, şandin, kişandin....).

Berçav e ku hin karên derhingêv xwerû (sade) ne, hin dariştî ne û hin jî lêkdayî (hevedûdanî) ne, lê her sê beş jî derhingêv in.

Wek: Xwerû - Xwendin: Memo rojnameyê dixwîne

- Çandin: Cotyar birincê diçînin

- Xistin: Zînê nan xistiye tûr

Dariştî - Vexwendin: Memo heval vexwendin

- Rakirin: Te ez ji xewê rakirim

- Daxistin: Fatê zembîl daxist

Lêkdayî - Berdan: Temo pez berda mêrgê

- Serjêkirin: Remo berxek serjêkir

- Avdan: Cotyaran zevî avdane

Diyar e ku karên van mînanan, bêyî alîkarî, derhingêv in, bûyerên wan derbasî ser berkarên rasteder bûne.

### B - Derhingêvên Sazkirî:

Karên derhingêvên sazkirî jî ew kar in, ên ku di binasaziya xwe de nederhingêvin, lê bi alîkariya bêjeyeke alîkar dibin derhingêv. Ew alîkar jî paşgira (andin) e.

Paşgira (andin) digihêje çend corên bêjeyan û wan bi xwe re dike karinî derhingêv. Anku, erkê vê paşgirê yê sereke sazkirina karên derhingêv e:

**1** - Digihêje binyata (regê) dema nuha ya hin karên nederhingêv û wan bi xwe re dike karinî derhingêv.

**Nimûne: Karên Nederhingêv**

**Karên Derhingêv**

- Razan

razandin

- Xuriyan

xurandin

- Perritîn

perritandin

- Kelîn<sup>(36)</sup> kelandin
- Barîn barandin
- Revîn revandin
- Kenîn kenandin
- Xebitîn xebitandin
- Şewitîn şewitandin
- Geriyan gerandin
- HD.....

Ev karên nederhingêv li gora vê rêzika jêrîn bûne derhingêv: (Binyata dema nuha ya karê nederhingêv + andin = karê derhingêv).

Binyata dema nuha jî, bi vî şêweyî pêk tê:

- Kar di dema nuha de: (kenîn ---- ez dikenim)
- Avêtina pêşgira dema nuha (di) û paşkokên kesîn (im, î, e, in) ji karê dema nuha: (di - ken - im -----...ken...)

Dêmek binyata dema nuha ji jêdera karê (kenîn) bêjeya (ken) e. Binyata dema nuha ji karên dîtir jî li vê mînakê tê pîvan û bi vî şêweyî pêk tê:

**Kar      Dema Nuha      Binyat      Derhingêv**

- Şewitîn (ez) dişewitim      ..şewit..      şewitandin
- Xebitîn (tu) dixebitî      ..xebit...      xebitandin
- Mirin (ew) dimire      ....mir.....      mirandin
- Hejîn (hûn) dihejin      ....hej.....      hejandin
- Bezîn (ez) dibezim      ....bez...      bezandin
- Revîn (tu) direvî      ...rev...      revandin
- Zîvirîn (ew) dizîvire      ....zîvir...      zîvirandin
- Geriyan (ew) digerin      ...ger.....      gerandin

---

36 - Hinek kar bi du şêweyan bilêv dibin, wek(kelîn - keliyan, gerîn – geriyan, kenîn - keniyan, bezîn – beziyan, barîn – bariyan, revîn – reviyar.... ).

-HD.....

**2 - Li hin herêman paşgira (andin) digihêje hindêk navan jî û karên derhingêv ji wan saz dike.**

Wek: (şop, tep, xew, toz, pel.....)

- Şop + andin = şopandin

- Tep + andin = tepandin

- Toz + andin = tozandin

- Xew + andin = xewandin

- Pel + andin = pelandin

- HD.....

Li gora erk û cihê paşgira (andin) gerek ev nav (şop, tep, toz, xew, pel) binyatên karinî nederhingêv bin. Anku, ji van jêderan (şopîn, tepîn, tozîn, xewtin, pelîn), weku binyat û navên jêderî hatine dariştin:

Şop - şopîn / şopiyan: Ew şopî / şopiya

Tep - tepîn / tepiyan: Ew tepî / tepiya

Toz - tozîn / toziyan: Ew tozî / toziya

Xew - xewtin. : Ew xewt.

Lê di warê kiryarî (piratîkê) de, ji bilî karê (xewtin - xewandin) ku di şêwezarê Kurmanciya Jêrîn de bikar tê, ew karên dîtir nayên xebitandin. Dibe ku jêderên van navan di zimanê Kurdî yê dêrîn (kevin) de, yan jî di şêwezarekî wî de hebûn, lê bi dirêjahiya demê re paşguh bûne û hatine jibîrkin, wekî ku gelek jêderên bêjeyan di zimanê me de bi demê re winda bûne <sup>(37)</sup>.

**3 - Paşgira (andin) digihêje hindêk navên dangan jî û wan bi taybetmendiya xwe dike karinî derhingêv, bêyî ku karên nederhingêv ji wan hebin, wekî van dengên dûbarekirî (lîlan, lorîn):**

- Lîlan (lîlî - lîlî): lîl + andin = lîlandin

- Lorîn (lorî - lorî: lor + andin = lorandin<sup>(38)</sup>)

- HD.....

37 - Em ê vê mijarê di bin navê (jêderên winda) de di vê pirtûkê de vekolin.

38 - Lorîn (lore - lor) : Dengê zûrîna guran e. (Dr. Nesrîn Fexrî – Govarî korî zanyarî Kurd – Bergî sêyem, beşî yekem. Bexda (1975) – Rû (230 – 231) ). Lê di Kurmanciya Jorîn de (Lorandin) bo razandina zarokan bikar tê. Li vê gorê dayikan (berê) zarokên xwe bi dengê guran ditirsandin û ew radzandin.

Taybetiya van karan û yê di rêza wan de, weku (fîkandin, tewwandin...) ew e ku bi van formên xwe (lîl + andin, lor + andin, fîk + andin, tew + andin) weku binesaziya karên derhingêv pêk hatine, lê bi wate û hevoksaziya xwe weku karên nederhingêv tên xebitandin.

Wek: - Zî nê di daweta birayê xwe de lîland

- HD.....

Di vê mînakê de karê (lîland), li ber çavan, karekî nederhingêv e, hevoka wî ya mînakê bêyî berkarê rasteder watedar û sergihayî (temam) e. Lê ku em bibêjin: - Zî nê di daweta birayê xwe de (dengê) lîland, hingê gotina (dengê) dibe berkarê rasteder û karê (lîland) dibe karekî derhingêv. Anku, karê (lîland) di reseniya raweya xwe de derhingêv e, lê nederhingêv bikar tê, yan jî berkarê wî hatiye avêtin.

Karê (lorandin) jî weku (lîlandin), ku em bibêjin:

- Zî ji birayê xwe re dilorîne.

Li vir karê (dilorîne) nederhingêv e û hevok, bêyî berkarê rasteder jî watedar û sergihayî ye. Lê ku me got:

- Zî (birayê) xwe dilorîne.

Hingê gotina (birayê) dibe berkarê rasteder û (dilorîne) dibe karekî derhingêv, wateya hejandin û teppandinê jî bi xwe ve digire.

Arîşeya van karan (lîlandin, lorandin, fîkandin, tewandin.....) ew e ku ev kar di raweya xwe de derhingêv in, lê di warê xebitandinê de nederhingêv bikar tên. Em dizanin ku karên derhingêv ew kar in, ên ku dihingivin berkarên rasteder, wek (dan, badan, xistin, raxistin, çandin, hilçandin, kuştin, guran, kirin, kolan.....).

Karên derhingêv di dema borî de bi cînavên kesîn, ên koma (min)re û navdêrên di rêz û raweya wan de tên veguhestin.

Wek: - Min pirtûk xwend

- Te name nivîsî

- Wî heval dîtî

- Zî nê gul avdan

- Şagirtan sêv çinî

- HD.....

Lê di dema nuha û paşerojê (ayinde) de hemû karên derhingêv bi cînavên kesîn ên koma (ez) re tên veguhestin.

Wek: - Ez pirtûkê dixwînim

- Ez ê pirtûkê bixwînim
- Tu nameyê dinivîsî
- Tu yê (tê) nameyê binivîsî
- Ew hevalan dibîne
- Zîn gulan avdide
- Şagirt dê sêvan bixun
- HD.....

Karên nederhingêv jî, di hemû dem û raweyan de bi cînavên koma (ez) re tên veguhestin.

Wek: - Ez çûm, ez diçim, ez ê biçim.....

- Tu ketî, tu dikevî, tu yê bikevî.....
- Ew hatin, ew tên (dihên), ew ê bên (bihên)....
- HD.....

Li gora vê pîvanê, ew karên ku ji navên dangan û paşgira (andin) saz bûne, ew jî di dema borî de bi cînavên koma (min) re tên xebitandin:

Wek: - Min di Nûrozê de lîland

- Te ji birayê xwe re lorand
- Wî ji hevalê xwe re fîkand
- Me ji dengbêjê xwe re tewand<sup>(39)</sup>

Anku, ev kar jî, dikevin rêza karên derhingêv, bêyî ku berkarên rasteder di hevokên wan de xuya bibin.

Em dizanin ku çî karê derhingêv ê heye dihingive berkarekî rasteder. Berkarên van karên derhingêv jî hatine avêtin. Reseniya hevoksaziya van karan, gerek bi vî şêweyî be:

- Min di Nûrozê de (awazek) lîland

---

39 - Dema ku dengbêj destire guhdarê wî jê re ditewîne, anku pêre dibêje (tew...tew...tew.... ).

- Te (birayê) xwe lorand
- Wî ji hevalê xwe re (dengek) fikand
- Me ji dengbêjê xwe re (dengek) tewand.

Bi vê yekê ew navên di nav kevanan de dibin berkarên rasteder. Wilo jî karên (teppandin, reqqandin, reppandin....).

**4 - Paşgira (andin) digihêje hin karên biyanî (Erebî) û wan bi xwe re dike karinî derhingêv.**

Wek: - Cerrib(جرب) + andin = cerribandin

- Ricif (رجف) + andin = ricifandin
- Xecil (خجل) + andin = xecilandin
- Reş (رَشَّ) + andin = reşandin
- Bexir (بخر)+ andin = bexirandin
- Qesim (قسم)+ andin = qesimandin
- HD.....

Berî nuha me gotibû ku erkê paşgira (andin)ê sereke ew e ku digihêje hin karên nederhingêv û wan dike derhingêv.

Wek: - Zarok razan (ew bi xwe razan)

- Zînê zarok razandin (ew hatin razandin)

Li hin herêmên Kurdistanê paşgira (andin) digihêje çend karên derhingêv, wek (nivîsîn, hêran, dêran, pêçan, guran, kolan.....). Ev karên xwerû bi van formên resen derhingêv in.

Wek: - Nivîsîn: Min name nivîsî

- Hêran: Zînê danê xwe hêra
- Dêran: Cotyar genim didêrin
- Pêçan: Fatê cil pêçan
- Guran: Temo berxek gura
- Kolan: Gundiyan çalek kola

Vêca ku paşgira (andin) digihêje van karan, dîsan ev kar derhingêv dimînin:

Wek: - Nivîs + andin = nivîsandin



(Min name nivîsand)

- Hêr + andin = hêrandin

(Zînê danê xwe hêrand)

- Dêr + andin = dêrandin

(Cotyar genim didêrînin)

- Pêç + andin = pêçandin

(Fatê cil pêçandin)

- Gur + andin = gurandin

(Temo berxek gurand)

- Kol + andin = kolandin

(Gundiyan çalek koland)

- HD.....

Pirsa ku derbarî van karan, raberî me radiweste ev e: Eger ev kar bêyî paşgira (andin) jî derhingêv bin, ka rol û kartêkirina vê paşgirê li wan çi ye û ka bo çi gihîştîye wan ?!

**Dr. Nesrîn Fexrî** dibêje<sup>(40)</sup>: Wateya karê (nivîsîn) û (nivîsandin) ne wekî hev in. Paşgira (andin) wateya (pêdakirin), (pê da nivîsîn)dide. Li gora Dr. Nesrîn Fexrî, wateya her du raweyan (nivîsîn) û (nivîsandin) ji hev cuda ne.

Wek: - Zînê name nivîsiye

(Wê bixwe nivîsiye)

- Zînê name nivîsandiye

(Hinekan pê daye nivîsîn)

Bi baweriya min, ev nêrîna Dr. Nesrîn ne cîgirtî ye. Ez dibînim ku çi têvelî di navbera wateya (nivîsîn) û (nivîsandinê) de nîn e. Dema ku em dibêjin:

- (Min pirtûkek nivîsî) û (Min pirtûkek nivîsand), wateya van her du hevokan yek e. Ew jî ew e, ku pirtûkek ji hêla min ve hatiye nivîsîn. Ew karên dîtir jî wek (hêrandin, dêrandin..... û stirandin) li karê (nivîsîn) û (nivîsandin) tên pêvan.

---

40 - Dr. Nesrîn Fexrî : Govarî zanyarî Kurd - Bergî sêyem - Beşî yekem. Bexda (1975) – Rû (228).

Bi gumana min, paşgira (andin) bi şêweyekî gelêrî ghiştiye van karên derhingêv, bêyî ku çî bandorê li wan bike, yan çî sûdê bide wan.

**Têbênî:**

Ne hemû karên nederhingêv bi alîkariya paşgira (andin) dibin derhingêv. Hin ji karên nederhingêv weku xwe dimînin, lê têgeha derhingêviya wan bi karinê derhingêv (ne ji binasaziyên wan) pêk tê.

Wek:

**Nederhingêv**

**Derhingêv**

- Bûn ----- kirin
- Çûn-----şandin, birin
- Hatin----- anîn, înan
- Ketin----- xistin, êxistin
- Daketin----- daxistin
- Rabûn----- rakirin
- Vebûn----- vekirin
- Man----- hiştin, hêlan
- HD.....

**C - Kar Ji Hêla Binyatê Ve**

Kar di zimanê me de, ji hêla binyatê (rehê, kokê) ve li ser du beşan parve dibin:

- Karên Yekreh
- Karên Dureh

**1 - karên Yekreh:**

Karên yekreh ew kar in, ên ku di hemû dem û raweyên xwe de bi hin tîpên jêderên xwe, yê resen û bingehîn tên veguhestin. Anku, tîpên karên yekreh di hemû dem û raweyan de ji tîpên yek jêderê pêk tînin û bi wan tîpan jî tîpên xebitandin, wek (çûn, rabûn, kirin, nivîsîn, birin, revandin, vemirandin.....).

Mînak:

**Jêder   Borî   Nuha   Fermanî   Reh**

Çûn (ew) çû diçe biçe (tu) ...ç...  
 Rabûn (ew) rabû radibe rabe rab...  
 Kirin (wî) kir dike bike ...k...  
 Nivîsîn (wî) nivîsî dinivîse binivîse nivîs...  
 Birin (wî) bir dibe bibe ...b...  
 Revandin (wî) revand direvîne birevîne revîn..  
 Mirandin (wî) mirand dimirîne bimirîne mirîn..

- HD.....

Diyar e ku binyata dema nuha ya karên van mînakan ev in (ç, rab, k, nivîs, b, revîn, mirîn). Tîpên her binyatekê (rehekê) ji tîpên yek jêderê hatine hilçandin û ew tîp bixwe jî di formên hemû dem û raweyan de (borî, nuha, paşê û fermanî) de jî tîpên xebitandin. Ji van karên ku tîpên binyatên xwe di hemû formên xwe de ji yek jêderê werdigirin, ji wan re tê gotin (karên yekreh). Pîrriya karên zimanê me yekreh in, wek (bezîn, revîn, kuştin, vekuştin, jêbûn, jêkirin, çandin, hilçandin, kişandin, hilkişandin û HD...):

**Jêder Borî Nuha Paşeroj Fermanî Binyat(reh)**

Bezîn bezî dibeze dê bibeze bibeze bez  
 Revîn revî direve dê bireve bireve rev  
 Kuştin kuşt dikuje dê bikuje bikuje kuj  
 Jêbûn jêbû jêdibe dê jêbibe jêbibe jêb  
 Jêkirin jêkir jêdike dê jêbibe jêbibe jêk  
 Çandin çand diçîne dê biçîne biçîne çîn  
 Hilçandin hilçand hildiçîne dê hilbiçîne hilbiçîne hilçîn

- HD.....

**2 - Karên Dureh:**

Karên dureh jî ew kar in, ên ku di dema borî tenê de li gora binesaziya jêderên xwe yê destnîşankirî tîpên veguhestin, lê di dem û raweyên dîtir de (nuha, paşeroj û fermanî) bi alîkariya karinî dîtir tîpên veguhestin. Anku, karên dureh veguhestina xwe ji du jêderên karan sergihayî (temam) dikin:

**Jêder Borî Nuha Paşeroj Fermanî**

Gotin got (dibêje) (dê bibêje) (bibêje)

Di vê mînakê de karê dema borî (got) ji jêdera xwe (gotin) hatiye dariştin. Lê di dema nuha, paşeroj û raweya fermanî de ji karekî dîtir (ne ji binesaziya jêdera /gotin/ hatiye xebitandin (dibêje, dê bibêje, bibêje). Ev karê ku veguhestina wî bi hevkarîya karekî dî sergihayî dibe, jê re (karê dureh) tê gotin. Bi vê têgehê karê dureh ew kar e, yê ku bi hevkarîya du karên têvel (ciyawaz) veguhestina xwe di hemû dem û raweyan de temam dike. Ev jî dide zanîn ku ev kar bi du binyatan (rehan)in, her binyatek ji jêderê, tên xebitandin:

1 - Binyata karê dema borî, ku ji jêdera karê nîşankirî, bi avêtina nîşandeka jêderî pêk tê.

Wek: - Got - in = got....(binyata / reha dema borî)

- Hişt - in = hişt...(binyata / reha dema borî)

2 - Binyata dema nuha<sup>(41)</sup> ku ji jêderê dîtir tê wergirtin û di dema nuha, paşeroj û raweya fermanî de bikar tê. Binyata dema nuha jî, bi vê rêzikê pêk tê:

- Kar di dema nuha de: Ez dibêjim

- Avêtina pêşgira dema nuha (di) û paşkokên kesîn (im, î, e, in):

- Ez di – bêj – im =...bêj...(binyata / reha dema nuha)

Binyata dema borî û ya dema nuha di karên yekreş de jî hene, lê her du binyat ji yek karî û yek jêderê tên dariştin. Ew jî jêdera wan a binavkirî ye.

Wek: - çandin: - Çand-in = çand...(binyata borî)

- Di-çîn-e =...çîn....(binyata nuha)

Seyda Sadiq Behadînê Amêdî, derbarî mijara me dibêje : ((kirina (karê) dureh ew kirine, ya ku koka wê ya jêderî tete duristkirin ji bo pêkanîna kirina fermanî, yan kirina demê nuho û paşê guherîn tê da bibin..))<sup>(42)</sup>. Bo zelalkirina vê danasîna xwe Seydayê Amêdî van mînanan pêşberî xwendevanên xwe dike:

((Gotin - bibêje, kuştin - bikuje, sotin - bisoje, patin - bipêje)).

41 - Hin zimannivîs vê binyata berfireh ji raweya fermanî digirin: (bibêje = bi-bêj-e =...bêj...). Di encamê de her du şêwaz jî, wekî hev rast in.

42 - Sadiq Behadîn Amêdî : Rêzimana Kurdî. Bexda (1987) – Rû. (372).

Di van mînakên de, karê (gotin) bi tenê dureh e. Lê karên (kuştin, sotin û patin) karinê yekreh in. Di vê navê re pirsê xwe dide pêş: Eger rast ev kar (kuştin, sotin û patin) karinê yekreh bin, gelo çima raweya wan a fermanî ne li gora tîpên jêderên wan hatiye ?!

Bi hizra min, bersiva pirsê ev e:

**- Kuştin:**

Ev kar di reseniya tîpên forma xwe de (kujtin) e. Anku, hevguherîn di navbera tîpa (j) û (ş) de çêbûye. Ji ber ku dengê (j) yê nerm e û yê (t) yê sert e, bilêvkirina her du dangan li pey hev, giraniyekê dide zimên, lê dengê (ş) yê nêzîktirî dengê (t) yê ye û bilêvkirina van her du tîpan (ş - t), li pey hev ji ya (j - t) siviktir û hêsantir e. Bo vê egerê (kujtin) bûye (kuştin). Lê dema ku tîpa (t)

tê avêtin dîsan (j) vedigere cihê xwe:

- Kuştin – kuşt: dikuje - bikuje

**- Sotin:**

Karê (sotin) jî di forma xwe ya resen de (sojtin) e.

Lê bi egera sivikbûnê û li dirêjahiya demê tîpa (j) hatiye avêtin: (Sotin = sojtin - disoje – bisoje)

**- Patin:**

Binesaziya vî karî, ya resen (pajtin) e. Di forma vî karî de jî, tîpa (j) hatiye avêtin û bûye (patin).

Di dema nuha, paşeroj û raweya fermanî de binesaziya karan, a resen berçav dibe. Li vê gorê forma resen, ya wan karan bi vî şêweyî tê:

**Jêder Borî Nuha Paşeroj Fermanî Jêdera Resen**

Kuştin kuşt dikuje dê bikuje bikuje (kujtin)

Sotin sot disoje dê bisoje bisoje (sojtin)

Patin dipat dipêje dê bipêje bipêje (pajtin)

Ji van mînakên mijarê tê zanîn ku bi dirêjahiya demê re çend diyardeyên balkêş gihiştine zimanê me. Van diyardeyan bandoreke berçav li jêderên hinek karan kiriye. Ji wan diyardeyan:

1 - Jêderên hin karan, bi demê re paşguh bûne û hatine jibîrkirin. Karên wan jêderan di dema nuha, paşeroj û raweya fermanî de bikar tên, lê jêder û veguhestina dema borî winda ne, wek (bêjtin, bînan, hêlan..):

**Jêder Borî Nuha Paşeroj Fermanî**

- (...) (.....) dibêje dê bibêje bibêje

- (.....) (.....) dibîne dê bibîne bibîne

- (.....) (.....) dihêle dê bihêle bihêle

Li hin herêman karê (bînan) di dema borî de, bi karê (dîtin) re tê bihîstin, wek: (Min nedîtiye, nebînaye), lê ev kar bi tena xwe nehatiye bihîstin. Karê (hêlan) jî, li hin herêmên Behdînan weku karekî yekreh û sergihayî tê xebitandin:

**Jêder Borî Nuha Paşeroj Fermanî Reh**

Hêlan hêla dihêle dê bihêle bihêle ...hêl..

2 - Hindek kar hene di dema borî tenê de bikar tên, lê di dema nuha, paşeroj û raweya fermanî de paşguh bûne, wek: (gotin, hiştin, dîtin...):

**Jêder Borî Nuha Paşeroj Fermanî**

Gotin got (.....) (.....) (.....)

Hîştin hişt (.....) (.....) (.....)

Dîtin dît (.....) (.....) (.....)

- HD.....

Di warê kiryarî de ev her du beşên karên dureh (ên ku jêderên wan winda ne û di dema borî de bikar nayên û yên jêderên wan hene, lê di dema borî tenê de tên xebitandin), her du beş hev sergihayî dikin û bi hev re tên veguhestin:

**Jêder Borî Nuha Paşeroj Fermanî**

Gotin got dibêje dê bibêje bibêje

Hîştin hîşt dihêle dê bihêle bihêle

Dîtin dît dibîne dê bibîne bibîne

Bo vê hevkarîyê jî, ji van karan re (karên dureh) tê gotin.

3- Bi sedema sivikbûnê hin tîpên bingehîn û resen di binesaziya hindek karan de, bi tîpine dîtir tên guhertin. Tîpên karan ên resen di dema nuha, paşeroj û raweya fermanî de berçav dibin, lê yên ku bi wan hatine guhertin, di jêder û dema borî de berçav dibin:

**Nimûne:**

- (z) bi (s) tê guhertin, wek (xwestin, bihîstin, parastin, guhestin, veguhestin...):

**Jêder   Borî   Nuha   Paşeroj   Fermanî**

Xwestin   xwest   dixwaze   dê bixwaze   bixwaze

Bihîstin   bihîst   dibihîze   dê bibihîze   bibihîze

Parastin   parast   diparêze   dê biparêze   biparêze

Guhestin   guhest   diguhêze   dê biguhêze   biguhêze

Veguhestin   veguhest   vediguhêze   dê veguhêze   veguhêze

- HD.....

- (j) bi (ş) tê guhertin, wek (biraştin, dahiştin, rahiştin, gihiştin, kuştin.....):

**Jêder   Borî   Nuha   Paşeroj   Fermanî**

Biraştin   biraşt   dibirêje   dê bibirêje   bibirêje

Dahiştin   dahişt   dadihêje   dê dahêje   dahêje

Rahiştin   rahişt   radihêje   dê rahêje   rahêje

Gihiştin   gihişt   digihêje   dê bigihêje   bigihêje

Kuştin   kuşt   dikuje   dê bikuje   bikuje

- HD.....

4 - Bi egera sivikbûna bilêvkirina hinek jêderên karan, tîpin ji wan hatine avêtin. Ew tîpên ketî di jêder û karên dema borî de xuya nabin, lê di dema nuha paşeroj û raweya fermanî de vedigerin cihê xwe yê resen, wek (mêtin, patin, firotin, avêtin, dotin, kotin, ketin, daketin....):

**Jêder   Borî   Nuha   Paşeroj   Fermanî**

Mêtin   mêt   dimije   dê bimije   bimije

Patin   pat   dipêje   dê bipêje   bipêje

Firotin   firot   difiroşe   dê bifiroşe   bifiroşe

Avêtin   avêt   davêje   dê bavêje   bavêje

Dotin   dot   didoşe   dê bidoşe   bidoşe

Kotin   kot   dikoje   dê bikoje   bikoje

Ketin   ket   dikeve   dê bikeve   bikeve

Daketin   daket   dadikeve   dê dakeve   dakeve

- HD.....

5 - Hin kar li herêminan yekreh tên xebitandin, lê li herêmine dîtir dureh tên xebitandin, wek (hatin, weriyan, hêlan, heriyan....):

**Jêder   Borî   Nuha   Paşeroj   Fermanî**

Hatin   hat   dihê /tê   wê bihê/ bê   bihê /bê

Lê di warê kiryarî (piratîkê) de, ev raweya fermanî (bihê / bê) bikar nayê, li şûna wê raweya (were), ji karê (weriyan) tê xebitandin:

**Jêder   Borî   Nuha   Paşeroj   Fermanî**

Hatin   hat   dihê / tê   wê bihê/ bê   were

- **Weriyan:**

Karê (weriyan) li hin herêmên Behdînan, weku karekî yekreh, di hemû dem û raweyan de tê veguhestin:

**Jêder   Borî   Nuha   Paşeroj   Fermanî**

Weriyan weriya   diwere   wê were   were

Ev kar li Behdînan bi wateya (ketin, weşiyar) tê xebitandin:

- Pelên darê weriyan: Pelên darê weşiyar

Lê li gelek herêmên dîtir jêdera karê (weriyan), hatiye jibîrkirin, tenê di dema paşeroj û raweya fermanî de tê bihîstin:

**Jêder   Borî   Nuha   Paşeroj   Fermanî**

(.....)   (.....)   (.....)   wê were   were

- **Hêlan:**

Karê (hêlan) jî yek ji wan karan e, yên ku li hindê herêman sergihayî, wek karekî yekreh (di hemû dem û raweyan de) tê veguhestin. Lê li herêmine dîtir jêdera vî karî hatiye jibîrkirin û di dema borî de bikar nayê. Li herêma Behdînan karê (hêlan) yekreh e. Wek:

**Jêder   Borî   Nuha   Paşeroj   Fermanî**

Hêlan   hêla   dihêle   wê bihêle   bihêle



Ev kar li gelek herêman dureh e, jêdera wî winda ye û di dema borî de jî, nayê veguhestin, lê di demên dîtir de bikar tê. Wek:

**Jêder**    **Borî**    **Nuha**    **Paşeroj**    **Fermanî**

(.....)    (.....)    dihêle    wê bihêle    bihêle

Karê (hêlan) bi hevkarîya (hîştin) veguhestina xwe sergihayî (temam) dike. Wek:

**Jêder**    **Borî**    **Nuha**    **Paşeroj**    **Fermanî**

(Hîştin) (hîşt)    dihêle    wê bihêle    bihêle

- **Heriyan:**

Ev jêder jî bikar nayê û di dema borî de jî nayê xebitandin, lê di dema nuha, paşeroj û raweya fermanî de, li hin herêman bikar tê. Wek:

**Jêder**    **Borî**    **Nuha**    **Paşeroj**    **Fermanî**

(.....)    (.....)    dihere    wê here    here

Karê (heriyan) bi hevkarîya (çûn / çûndin)

veguhestina xwe sergihayî dike. Wek:

**Jêder**    **Borî**    **Nuha**    **Paşeroj**    **Fermanî**

Çûn    çû    diçe    wê biçe    biçe

(çûn)    (çû)    di here/dire    wê here    here

## BIRRÊ SÊYEM

### - Karên Alîkar

#### - Bûn

1 - Bûn (heyîn, hebûn)

2 - Bûn (çêbûn)

#### - Kirin

1 - Bi Hevalnavan re

2 - Bi cînavan re

#### - Dan

- Raweya (Dakirin)

#### - Hatin

**Karên Alîkar**

Karên alîkar ew kar in, ên ku ji bilî erkên xwe yê resen û sereke dikarin bibin alîkarên hinek bêjeyan û hin ji taybetmendiyên xwe (weku bûyer û dem) bi ser wan ve berdin. Şarezayên zimanê Kurdî ne wek hev karên alîkar destnîşan kirine, ne ji hêla jimara wan û ne ji hêla erk û bandora wan ve. Bi hizra min karên alîkar di zimanê me de ev in: (bûn, kirin, dan û hatin). Her yek ji van karan alîkariya xwe li gora erk û taybetiyên xwe dike:

**- Bûn:**

Di zimanê Kurdî de du kar bi teşeya (bûn) hene:

**1 - (Bûn)a ku bi wateya (hebûn, heyîn)**

Wek: - Ev av berf bû (بۆ)

2 - (Bûn)a ku bi wateya (çêbûn)

Wek:- Ev berf bû av (صار)

Ev her du (bûn) jî nederhingêv in û dibin alîkarên hin bêjeyan, wek (kar, nav û hevalnavan) û hinek ji taybetmendiyên xwe bi ser wan ve berdidin.

**1 - Bûn (heyîn, hebûn):**

Ev (bûn) karekî rêzder e (awarte ye), di veguhestina

xwe de kême<sup>43</sup>, anku ne di hemû dem û raweyan de (weku karê asayî) tê veguhestin. Bo vê egerê jî hin zimanzanan (Nûrî Elî Emîn) navê (karê jar) lê kiriye.

alîkariya vê (bûn)a rêzder bi van şêweyan berçav dibe:

a - Digihêje her sê corên karan (xwerû, dariştî û lêkdayî). Di dema borî de têgeha çîrokiya dema borî, ya dûr berdide ser wateyên wan karan:

- Em çûbûn Amedê

- Em daketibûn bazarê

- Me darên xwe avdabûn

b - Binyata dema nuha, ya vê (bûn)ê digihêje karan û bi wan re raweyên daxwazî saz dike:

- Gerek we Amed dîtibe

43 - Em ê vî karî di mijara (karên Rêzder) de bi firehî ronî bikin.

- Eger hûn çûbin Amedê, em ê jî biçin

C - Li pey nav û hevalnavan tê xebitandin, wan dike (pêvebir, pêxistî) û têgeha bûyera xwe, di dema boriya çîrokî de davêje ser wan:

- Ez şagirt bûm
- Tu karmend bûyî
- Dema min tu dîtî zarok piçûk bûn
- Berî nuha gundê me ava bû

Ç- Ev karê awarte, weku karê (Hesten) di zimanê Farisî de, karekî girêdanê ye, ser û berên hevokê bi hev ve girêdide û têgeha hebûna karayê (kiryarê) xwe diçesipîne. Ji bilî vê girêdanê jî, ev (bûn) bûyer û bizavên karên sergihayî bi xwe ve nagire. Bo vê egerê jî, ew bi alîkariya xwe karên lêkdayî saz nake. Ji hêla veguhestinê ve jî, ev (bûn) karekî jar e, ne di hemû dem û raweyên veguhestinê de berçav dibe:

- Em cotyar bûn
- Em cotyar (...) in
- Em ê cotyar bin

## 2 - Bûn (çêbûn):

Ev (bûn) karekî sergihayî (temam)e, bi wateyeke nêzî wateya (çêbûn) bikar tê û di hemû raweyan de tê veguhestin.

- Em bûn cotyar
- Em dibin cotyar
- Em ê bibin cotyar

Lê ev (bûn)a sergihayî, berevajî (bûn)a rêzder, nagihêje karên dîtir, lê digihêje hevalnavan (rengdêran) û bi wan re karinê lêkdayî saz dike:

- Sor + bûn = sorbûn
- Dirêj + bûn = dirêjbûn
- Mezin + bûn = mezinbûn
- HD.....

Rast e, ku her du (bûn) di forma xwe de yeksan in, lê ji hêla wate û erkên xwe ve, her du kar ji hev cuda ne, wek:

1 - (Bûn)a bi wateya (hebûn, heyîn) karekî rêzder e (awarte ye), tenê hebûna karayê (kiryarê) xwe û rewşa wî ya heyî di pêvajoya hevokê de tekûz dike û wan bi hev ve girêdide:

- Şagirt jîr bûn

(Jîrbûna şagirtan hebû)

- Şagirt jîr in

(Jîrbûna şagirtan heye)

- Şagirt ê jîr bin

(Jîrbûna şagirtan ê hebe)

- (Bûn)a bi wateya (çêbûn) karekî sergihayî ye, weku hemû karên asayî tê veguhestin.

2 - (Bûn)a bi wateya (hebûn) di dema nuha de, diyar nabe:

- Em şagirt (...) in

- (Bûn)a bi wateya (çêbûn) di hemû dem û raweyan de tê veguhestin û diyar dibe:

- Ez bûm şagirt, ez dibim şagirt.....

3 - (Bûn)a bi wateya (hebûn) digihêje karan:

- Ez ketibûm

- (Bûn)a bi wateya (çêbûn) nagihêje karan û bi wan re nayê xebitandin.

4 - (Bûn)a bi wateya (hebûn), ji demên borî, di nêzboriya xwerû tenê de bikar tê:

- Em geş bûn

- (Bûn)a bi wateya (çêbûn) di her çar demên borî de bikar tê:

- Em geş bûn, em geş bûne, em geş dibûn, em geş bûbûn

5 - (Bûn)a bi wateya (hebûn) li paş navan bikar tê:

- Hûn heval bûn

- (Bûn)a bi wateya (çêbûn) li pêş navan bikar tê:

- Hûn bûn heval

- **Kirin:**

(Kirin) karekî derhingêv û alîkar e, digihêje hevalnav (rengdêr) û hin cînavên pevxistî, wek (jê, lê, pê, tê) û bi wan re karinî lêkdayî saz dike:

### 1- Bi Hevalnavan Re:

Ev karê alîkar digihêje hevalnavan û karinî lêkdayî pêk tîne:

- Sor + kirin = sorkirin

Ev karê lêkdayî jî wek karê (kirin) di hemû dem û raweyan de tê veguhestin:

**Borî:** - Zîne hêk sor kirin, sor kirine, sor dikirin, sor kiribûn.

**Nuha:** - Zîn hêkan sor dike

**Paşeroj:** - Zîn dê hêkan sor bike

**Raweya daxwazî:**

**Fermanî:** - Hêkan sor bike

- Hêkan sor bikin

### 2- Bi Cînavan Re:

Karê (kirin) digihêje van cînavên pevxistî (jê, lê, pê, tê), wan ji raweya cînavî derdixe û bi wan re karinî lêkdayî saz dike:

**Jê:** - (jê + kirin = jêkirin

- Zîne sêv jêkirin

- Zîn sêvan jêdike

- Zîn dê sêvan jêbike (jêke)

**Lê:** - (Lê + kirin = lêkirin)

- Birayê te dîwar lêkir

- Birayê te dîwêr lêdike

- Birayê te dê dîwêr lêbike (lêke)

**Pê:** - (Pê + kirin = pêkirin)

- Ew pirtûk, te çi pêkir ?

- Ew pirtûk, tu çi pêdikî ?

- Ew pirtûk, tu yê (tê) çi pêbikî ?

**Tê:** - (Di wê / tê + kirin = têkirin)

- (Zevî), te çi kar têkir ? (tê de kir)
- (Zevî), tu çi karî têdikî ? (tê de dikî)
- (Zevî), tu yê (tê) çi karî têbikî ? (tê de bikî ?

**- Dan:**

(Dan) jî karekî alîkar e, digihêje navan û wan bi xwe re dike karinê lêkdayî û derhingêv. Wek:

- Av + dan = avdan
- Ser + dan = serdan
- Rû + dan = rûdan
- Ber + dan = berdan
- Xwê + dan = xwêdan
- HD.....

Ev karên lêkdayî di hemû dem û raweyên veguhestina karê (dan) de tên veguhestin.

WEK: (Av + dan = avdan)

**Borî:** - Min zevî avda

- Min zevî avdaye
- Min zevî avdida
- Min zevî avdabû

**Nuha:** - Ez zeviyê avdidim

**Paşeroj:** - Ez ê zeviyê avbidim

**Fermanî:**- Zeviyê avbide

- Zeviyê avbidin

**- Raweyên daxwazî, yên dîtir:**

- Bila min zevî avbida
- Xwezî min zevî avdaba
- HD.....

**- Raweya (dakirin):**

Ev rawe dide zanîn, ku dema mirovek bixwaze bûyereke yan pîlanekê pêk bîne, lê di heman dem de nexwaze ku ew bi xwe wê bûyerê bike, yan jî nexwaze kiryarê wê bê nasîn, hingê ew pîlan bi destê kesekî nepen tê kirin,

Wek: (Min Temo da revandin).

Li vir, ne min Temo revand, lê min riya revê jê re vekir, yan jî min ew bi destê kesekî nenas revand, anku (Min ew da revandin).Wek:

Borî:

- Temo neyarê xwe da kuştin, daye kuştin, dida kuştin, dabû kuştin.

Nuha: Temo neyarê xwe dide kuştin.

Paşeroj: Temo dê neyarê xwe bide kuştin

Raweyên Daxwazî:

Fermanî: - Neyarê xwe bide kuştin (tu)

- Neyarê xwe bidin kuştin (hûn)

(Daxwaziyên dîtir):

- Bila Temo neyarê xwe bide kuştin

- Gerek Temo neyarê xwe bida kuştin

- Xwezî me jî neyarên xwe dabûna kuştin

- HD.....

Li hindê herêmên Kurdistanê ew mînakên mijara me bi vî şêweyê jêrîn jî tên xebitandin:

Borî: - Temo neyarê xwe bikuştin da

Nuha: - Temo neyarê xwe bikuştin dide

Paşeroj: - Temo dê neyarê xwe bikuştin bide

Fermanî: - Neyarê xwe bikuştin bide, bidin!

Daxwazî: - Xwezî te jî neyarê xwe bikuştin bida

- Belkî wan jî neyarên xwe bikuştin dabana

- HD.....



Hindek ji şarezayên rêzimana Kurdî ev hevoka mijara me, (Temo neyarê xwe daye kuştin), weku hevokek nediyar / tebat (مبني للمجهول) binav kiriye, wilo jî hemû hevokên vê raweyê (44).

Bi hizra min, ev dîtin ne cîgirtî ye, ji ber ku karê (daye), di hevokê de karekî diyar e (penî ye) kara (kiryar) û berkarê wî eşkere ne, her du jî (Temo, neyar) li pey hev in. Di zimanê me de hevoka nediyar ew hevok e, ya ku kara jê hatibe avêtin û berkar cihê wî girtibe. Ev hevoka nediyar bi karê alîkar (hatin) tenê, pêk tê. Wek:

- Temo neyarê xwe kuşt (diyar e)
- Neyarê Temo hat kuştin (nediyar e)

**Hatin:**

Karê (hatin) nederhingêv (têneper) e û sergihayî ye, di hemû dem û raweyan de tê veguhestin. Ji bilî erkên (hatin)ên resen jî, ew dikare bibe karekî alîkar. Taybetmendiya alîkariya (hatin) ew e, ku ew tenê dikare raweya hevokên diyar bike nediyar.

Helbet, hevokên karên derhingêv tenê dibin nediyar

Wek: - Zînê sêv çinîn

- (Sêv hatin çinîn)

Lê hevokên karên nederhingêv nakevin raweya nediyar Wek: - Zîn çû malê

Em dizanin ku hêmanên (regezên) hevoka karê derhingêv, ên bingehîn sê ne. Ew jî ev in: (kara, berkarê raster, kar). Di raweya nediyar de kara tê avêtin û berkar cihê wî digire. Li şûna kar jî jêdera wî bikar tê û karê (hatin) raweya nediyariyê bi xwe re vedugehêze.

**Nimûne:**

**Borî:** - Zînê gotar nivîsî, nivîsiye, dinivîsî, nivîsîbû

- Gotar het nivîsîn, hatiye (hate) nivîsîn, dihat nivîsîn, hatibû nivîsîn

**Nuha:** - Zîn gotarê dinivîse

- Gotar dihê (tê) nivîsîn

**Paşeroj:** - Zîn ê gotarê binivîse

**Daxwazî:** - Gotar ê bihê (bê) nivîsîn

**Fermanî:** - (Di raweya fermanî de kara binav nabe. Bo vê egerê jî, hevoka vê raweyê nabe nediyar)<sup>(45)</sup>

- **Raweyên dîtir:**

- Bila gotar bihata nivîsîn, hatiba nivîsîn, hatibe nivîsîn, hatibûya nivîsîn.
- Xwezî gotar bihata nivîsîn, hatibe nivîsîn, hatibûya nivîsîn.....
- Gerek gotar bihata nivîsîn.....

**Dê bidome.**

---

45 - Di mijara (karên diyar û nediyar) de em ê vê bendê bi firehî şirove bikin.

## TESÎRA LERZÊ LI SER GUHERÎNA DENGAN

**Husein Muhammed**

Gelo em çima dibêjin "dikujin" lê "kuştin" anku di yekê de J lê di ya din de Ş heye? Yan bo çî "nelîzin" lê "nelîstin" yanî di yekê de Z û di ya din de S heye? Ji ber çî em dibêjin "heft" lê "hevde" anku di ya yekem de F û di ya duyem de V heye? Em dizanin ku peyva "pezkûvî" ji peyvên "pez" û "kûvî" lê sebeb çî ye ku di axiftina bilez de ew wek "peskûvî" tê gotin? Di peyivîna bilez de heta "ez tîm" dibe "es-tîm". Li aliyekî din, "qesd" ya erebî di kurdî de di devê xelkê de dibe "qest" yan "qezd" û "isbat" dibe "izbat, îzbat".

Di dengnasyê de mebest ji "lerz"ê lerizîna yan nelerizîna perdeyên dengî ye. Perdeyên dengî<sup>46</sup> hin perde yan beten in ku li serê gewriyê hene û livandina wan alîkariya çêkirina dengan dike. Cih û awayê dengên konsonantan eynî ne, bo nimûne yê dengên "b, p" yan "g, k" lê di dema çêbûna "b" û "g" de perdeyên dengî dilerizin lê di çêkirina "p" yan "k" de perde nayên lerizandin. Konsonantên ku perdeyên dengî dilerizînin bi navê "bilerz" tên nasîn. Konsonantên ku perdeyên dengî nalerizînin jî, "bêlerz" in.

Konsonantên bilerz yê kurdî ev in: b, d, g, z, j, x, v, c û varyantên wan, bo nimûne "b z". Hevberên wan yê bêlerz di kurdî de ev in: "p, t, k, s, ş, x, f, ç" û varyantên wan, bo nimûne "p, t, ç".

### Tabloya bêlerz û bilerzên kurdî<sup>47</sup>

<b>bêlerz</b>	p	t	k	s	ş	f	ç	x
<b>bilerz</b>	b	d	g	z	j	v	c	q, x <sup>48</sup>

<sup>46</sup> , bi anatomî *plica vocalis*. *perdeyên dengî*: lêvên dengî, tîlên dengî, bi inglîzî "vocal folds" yan "vocal cords", tirkî "ses telleri", erebî *أحبال صوتية*, bi farisî *پرده‌های صوتی*.

Varyantên eynî herfê nehatine rêzêkirin, bo nimûne ji "p, p̄, p̂" tenê "p" hatiye nivîsîn.<sup>47</sup>

(xeyn) wek di peyva "axa" (serokeşîr) de. *خ / 48*

Di nav peyvên xwerû de, mirov dikare gelek nimûneyan bide ku du konsonantên li pey hev herdu bêlerz in yan jî herdu bilerz in. Lê mirov nikare gelek nimûneyên wisa bibîne ku ji du konsonantên li pey hev bibîne ku yek jê bêlerz û yek jî bilerz be. Bo nimûne "dest, heft, text" hene ji ber ku T û herfa berî wê herdu bêlerz in. Lê di zimanê me de peyvên wek "\*dezt, \*hevt, \*text" yan "desd, hefd, text" yan jî peyvên din yên bi dengê "-zt, -vt, -xt" yan "-sd, -fd, -xd" nînin yan jî gelek kêr hene ji ber ku dengên lerza wan ne wek hev li hev nakin.

Konsonantên bilerz û yên bêlerz li pey hev li hev nakin. Konsonanta paştir lerza ya pêştir wek xwe lê dike. Heke ya paştir bêlerz be, bilerza berî xwe jî dikeve bêlerz yan jî berevajî. Bo nimûne, rehê nimûneya me ya jor "-lîz-" wek "di-lîz-im, na-lîz-in, bi-lîz-e". Lê di demên borî de T jî li rehê lêkerê tê zêdekirin anku dibe "-lîz-t". Lê ji ber ku T bêlerz e, ew Z-ya bilerz ya berî xwe, hingê T-ya bêlerz Z-ya bilerz jî bêlerz dike anku dike S. Loma "lîz+t → lîst". Bi heman awayî "kuj" (wek "di-kuj-in, ne-kuj-e, na-kuj-î") gava ku T ya rehê dema borî lê zêde dibe, hingê: "kuj+t → kuşt" ji ber ku J bilerz e û berî T-ya bêlerz dibe Ş-ya bêlerz.<sup>49</sup>

Ne tenê konsonantên bilerz berî yên bêlerz dibin bêlerz. Bi heman awayî dengên bêlerz jî berî yên bilerz dibin bilerz: "heft+deh → hevde". Anku F-ya bêlerz berî D-ya bilerz dibe V-ya bilerz (T yan dikeve yan dibe jî dihele nav D). Bi heman awayî "heşt+deh → hejde" anku Ş-ya bêlerz berî D-ya bilerz dibe J-ya bilerz.

Ev guherîn ne tenê di peyvên xwerû de çêdibe. Peyva "dest" di hin ji van peyvên de wek "des-" maye lê di hinan de jî bûye "dez-": "desmal, despêk" lê "dezgeh, dezgir/dezgirtî". Sebebê parastina S di peyva "despêk" de ew e ku P jî wek S bêlerz e loma S naguhere. Lê S di peyvên "dezgeh, dezgir" de bûye Z anku bûye bilerz ji ber ku G jî bilerz e.

Tesîra lertzê li ser gelek peyvên ji erebî wergirtî heye. Di erebî de tesîra lertzê li ser guherîna dengan nîne. Di erebî de cotên bêlerz/bilerz bi qasî kurdî nînin. Bo nimûne, di erebiya standard de "k, ş, f" yên bêlerz hene lê hevberên wan yên bilerz "g, j, v" nînin. Bi heman awayî "b, c" yên bilerz hene lê hevberên wan yên bêlerz "p, ç" nînin.

---

Di eslê van peyvên de dengên bilerz (z, j) hene ku berî T-ya bêlerz bûne bêlerz (s, ş), ne ji ber ketina T-ya bêlerz bûne<sup>49</sup> bilerz. Ketina T-ya bêlerz bêlerzan nake bilerz. Bo nimûne, di "alîstin, ristin" yan soranî "firoştin" de piştî ketina T-ya bêlerz jî dîsa bêlerz (s, ş) dimînin: "di-alîs-in, na-rês-in, bi-firoş-e").

Peyva erebî "hëbs" di kurdî de bûye "hëfs" yan "hëps". Ji ber ku S bêlerz e, wê B-ya bilerz kiriye P yan jî F. Berî ku B bibe F, ew bûye V, wek çawa ku di gelek peyvên din de jî di kurdî de B bûye V. Bide ber kurdî "av, lêv, bav/bab" lê farisî "ab, leb, baba".

### Hevberên bêlerz û bilerzên kurdî di erebiya standard de

<b>bêlerz</b>		t	k	s	ş	f		x
<b>bilerz</b>	b	d		z			c	ç

Loma di erebî de dengên bilerz û bêlerz ji kurdî zêdetir û hêsantir dikevin pey hev. Loma peyvên wek "zebt, qesd, isbat, rizq" di erebî de mimkin in lê ew di kurdî de bûne bêhemdî mirovî jî dibin "zeft/zept, qezd, izbat, risq"<sup>50</sup>.

Ji ber sebebên lerezê, ji hin peyvên ji erebî hatine çend form di kurdî de peyda dibin. Hin ji van peyvan "hëfs, zeft" û formên wan yên cuda ne (hëps, hevs, hebs, zeft, zept, zevt). Lê di wan de herdem herfa dawiyê wek xwe maye, tenê herfa duyem-dawîn anku ya berî ya dawiyê guheriye.

Ev diyardeyeke giştî ye ya tesîra lerezê ye: herfa pêştir hatî li ber ya paştir hatî diguhere, ne berevajî. Lê bi kêmî nimûneyek heye ku li gel vê qeyda giştî li hev nake:

Peyva "qesd" (قصد) di kurdî de bi sê awayan peyda dibe. Gelek kesên erebîzan û ji rehê wê peyvê haydar, wê bi qasî mimkin nêzîkî eslê wê yê erebî anku wek "qesd" dinivîsin. Ev awayê dilsozî rehnasiya wê peyvê be jî, ji peyva di devê xelkê de dûr e. Awayekî din yê nivîsîna wê peyvê "qezd" e ku zêdetir wek awayê gotina wê peyvê û li gor diyardeya giştî ya bilerzbûna dengê bêlerz berî dengê bilerz e anku D-ya bilerz S-ya bêlerz diguherîne û dike Z.

Lê hê jî awayekî din heye ku belkî di nav xelkê de ji herdu awayên behskirî gelek berbelavtir e jî. Ew jî "qest" e, wek di fraza "ji qesta[n]" de. Di wê de ne D-ya bilerz ya dawiyê S-ya bêlerz ya berî xwe kiriye Z lê S-ya bêlerz D-ya bilerz ya piştî xwe kiriye T-ya bilerz. Guherandina bi vî awayî di kurdî de awarte û istisna ye.

<sup>50</sup> Q jî konsonanteke bêlerz e, di kurdî de hevbera wê ya bilerz nîne.

Li aliyekî din, berevajî tirkî, di kurdî de konsonantên bilerz li dawiya peyvê bi otomatîkî nabin bilerz. Bide ber kurdî "kitêb, xîtab, hebîb" lê tirkî "kitap, hitap" ji erebî "kitab, xitab, hebîb", kurdî "reng" lê tirkî "renk" û hwd. Di tirkî de bêlerzbûna li dawiya peyvê di nivîsînê de jî tê diyarkirin ("kitap = kitêb" lê "kitabı = kitêbê"). Heman bêlerzbûn di hin zimanên din de jî heye, bo nimûne di almanî û rûsî de, lê di wan de bêlerzbûn di nivîsînê de nayê diyarkirin (bo nimûne almanî "Tag = roj" û "Täge = rojan" herdu bi G tî nivîsîn tevî ku ya yekem wek "tak" tê gotin.)

Ji nimûneyên "pezkûvî" û "ez tîm" (bi gotina bilez "peskûvî" û "es-tîm") yê li jor dayî diyar dibe ku ev guherîna dengî di peyvên pêkve û heta di du peyvên ji hev cuda lê li pey hev jî çêdibe.

### TESÎRA GUHERÎNA DENGÎ LI SER NIVÎSÎNÊ

Guherîna lerezê (anku bilerzbûna bêlerzan yan bêlerzbûna bilerzan) piirsgirêkeke cidî ya rastnivîsînê bo me peyda dibe. Şarezayên zimanî dizanin ku peyva "kuştin" di rastiye de ji "kuj+tin" pêk tê lê di gotinê de her kes wê wek "kuştin" dibêje. "Dezgeh" helbet ji "dest+geh" tê lê ti kes wê wisa nabêje. "Pezkovî/pezkûvî" û "ez tîm" li gor rehên xwe rast hatine nivîsîn lê em dizanin ku di kirdariyê de kurd wan bi lez wek "peskovî/peskûvî" û "es-tîm" dibêjin.

Anku awayê gotin û rehê gotinê dijî hev e. Piirsgirêk jî ev e: gelo em ê bi gotinê yan jî bi rehên peyvê bikin? Bivê-nevê, em neçar in ku yekê ji herduyan bibijêrin. Ne kurdî tenê, lê gelek zimanên din jî neçar in ku heman biryarê bidin.

Di bijartina yek ji herdu alternatîvan de, mirov dikare li çend rêbaz û rênimayan bifikire: hêsani, beraqilî, pratîka zimanên din, pratîka heyî ya nivîsîna zimanê kurdî.

### Nivîsîna peyvên xwerû

Di mijara hêsaniyê de, mirov dikare bi hêsani bibêje ku divê ziman û nivîsîn li ber kesên ne pisporên zimannasiyê jî hêsani be anku ziman û nivîsîna bi wî ne tenê kar û warê zimannasan e. Hêsani wê rê dide ber mirovî ku mirov peyvan bi qasî mimkin be wek ku tê gotin wisa binivîse jî. Ji ber ku hemû kurmanc dibêjin "kuştin" û ti kes di pratîkê de nabêje "kujtin", nivîsîna peyvê wek "kuştin" ji "kujtin" çêtir e heta heke li gor rehnasiyê "kujtin" rasttir be jî. Forma "kujtin" hem zimanê nivîskî ji zimanê

gotinê dûr dike û hem jî biryardana wê dike imtiyaza zimannasan û qisekerên sade yê zimanê kurdî ji wê bêpar dike ji ber ku kesên ne zimannas bêyî hînbûnê, nizanin ka sebeb çî ye ku peyva "kuştin" ya di devê wan de divê wek "kujtin" bê guherandin.

Pratîka gelek zimanên din jî wek ya kurdî ye anku di peyvên xwerû de rastnivîsîn li gor gotinê ye, ne li gor rehê peyvê ye. Di inglîzî de di demên niha û bîna de peyva "thieve" (dizîn, dizî kirin) û peyva "leave" (çûn; hiştin) bi V ne. Lê di demên borî de, gava ku T dikeve pey peyva V dibe F: "left" (← leave + T). Lêkera "thieve" (dizîn) bi zêdekirina dengê T (û guherandina vokalên nava peyvê) dibe navdêr anku "dizîn" dibe "dizî". Lê ji ber ku T-ya bêlerz tê dûv V-ya bilerz, V dibe F anku "thieve + T → theft". Anku di vê mijarê de inglîzî jî wek kurdî dike: ji rehnasiyê zêdetir nivîsîn xwe dispêre awayê gotinê. Li gor vê rêbazê jî, formên kurdî yê "kuştin, lîstin, axiftin" rast in, ne "kujtin, lîztin, axivtin".

Mirov dikare heman tiştî bo rastnivîsîna zimanê tirkî jî bibêje. Di piraniya formên çemandî de peyva bi maneya "kitêb" ya kurdî "kitab-" e, wek "kitabî" (kitêbê), "kitabîn" (ya/yê/yên kitêbê), "kitaba" (bo kitêbê). Lê dîsa jî forma xwerû "kitap" e anku bi P tevî ku em bi esehî dizanin ku li gor rehnasiyê divê "kitab" bûya ji ber ku ji erebî ye û di erebî de P nîne lê di tirkî de wek "kitap" tê nivîsîn ji ber ku dengnasiya tirkî dengên bêlerz li dawiya peyvê qebûl nake û rastnivîsîn jî guh dide dengnasiyê<sup>51</sup>. Anku tirkî jî wek kurdî li gor di vê mijarê de dengnasî wek bîngê rastnivîsînê bijartîye, ne rehnasî.

Soranî jî wek kurmançî dike: "na-kuj-im, de-kuj-in, bi-ku-je" (nakujim, dikujin, bi-kuj-e) lê "kuştin" (kuştin), ne "kujtin". Herçi farisî ye, wê rehê dema niha jî li gor forma rader (mesder, infinitîv) eyar kiriye: "koştin" (kuştin) û "ne-mî-koşem, mî-koşend, bikoş" (na-kuj-im, ew di-kuj-in, bi-kuj-e). Lê ya giring, ne soranî û ne jî farisî vê peyvên û ti yê din jî wek wan wek bi konsonanteke bilerz û yeke bêlerz li pey hev qebûl nakin, bo nimûne dengên "-vt, -jt-, -zt-" di wan de jî ne mimkin in, wek ku di kurmançî de jî ne gengaz in.

Tevî k uhin kes bi rik û înatê israrê li ser formên wek "lîztin, kujtin, axivtin" dikin jî, dîsa 1) hemû kurd wan wek "lîstin, kuştin, axiftin"<sup>52</sup> dibêjin, 2) kurdî û zimanên din jî li gor dengnasiyê dinivîsin, ne li gor rehnasiyê û 3) ji xwe piraniya mezin ya hemû kurdînivîsan wan bi "-st, -şt, -ft" dinivîse (ne bi "-zt, -jt, -vt) loma divê mirov jî wisa bike.

Di rastnivîsîna tirkî de çend peyvên ku vê qeyda redkirina bilerzan li dawiya peyvê qebûl nakin hene, bo nimûne <sup>51</sup> "ad" (nav) bo cudakirinê ji "at" (hesp).

Yan jî "leyîstin, lehîstin, axaftin" dibêjin lê dîsa jî ne wek "leyîztin, lehîztin, axavtin".<sup>52</sup>

### Nivîsîna peyvên li pey hev û peyvên pêkve

Me li jor diyar kiriye ku mirov di axiftina bilez de gotina "ez tēm" di rastiyê de wek "es-tēm" dibêje. Gelo divê ku em di hevokên wiha de jî li gor dengnasyê biçin û binivîsim "es tēm" madem ku me meseleya "lîz+tin" jî kiriye "lîstin"?

Heke em dîsa rêbaz û rênimayên xwe bînin bîra xwe, ew ev bûn: hêsanî, beraqilî, pratîka zimanên din, pratîka heyî ya nivîsîna zimanê kurdî.

"Ez tēm" ne bi temamî wek "lîstin"ê ye. Tenê di axiftina bilez de "ez tēm" dibe "es-tēm". Lê heke tu ji kurmançaxivekî ne şarezayê reh û rîşên peyva "lîstin"ê daxwaz bikî ku peyva "lîstin" hêdîka bibêje, ew çendî wê hêdî bibêje jî, dîsa dê bibêje "lîs-tin", ne "lîz-tin". Anku S di peyva "lîstin" de cihê xwe girtiye û êdî di Z qet di peyva "lîstin" de nîne. Lê di gotina "ez tēm" de Z heye û di axiftina hêdî de mirov wê dibêje û kesên ne pîsporê rehnasî û etîmolojiya gotina "ez tēm" jî dikarin bi hêsanî ji te re bibêjin ku tê de Z heye, ne S.

Pratîka zimanên din jî wisa ye, anku heke mijar du peyvên li pey hev bin, tesîra lertzê tenê li ser dengkirina bilez heye, ne li ser dengkirina hêdîka û ne li ser nivîsînê. Di inglîzî de di hevoka "Let it be" ("dev jê berde", "guh nediyê") de, di axiftina bilez de T-ya bêlerz ya peyva "it" ji ber B-ya bilerz dibe D-ya bilerz. Anku hevok wek "let-id-be" tê gotin. Lê di axiftina hêdî û di nivîsînê de tesîr li nabe anku mirov dîsa jî bi T dinivîse. Di tirkî de jî mesele wisa ye, hevok "kitab geldi" (kitêb hat) de di rastiyê de di axiftina bilez de ew dibe "kitab-geldi" anku P-ya bêlerz ji ber tesîra G-ya bilerz dibe B-ya bilerz. Lê di tirkî de jî di axiftina hêdî û di nivîsînê de P tê parastin.

Ji xwe di kurdî de jî pratîk ev e: mirov nivîsîna peyvên li pey hev li gor bilerzî yan bêlerziya peyva dût wan naguherîne. Bawer nakim ku dudilî û nelihevkerin di vê meselê de hebe tevî ku hin caran mirov xeletiyên ji ber tesîra lertzê dibîne lê ew ne ji ber biryarekê lê tenê bi şaşîti wisa tê kirin.

Di mijara peyvên pêkve (hevdanî, hevedudanî) anku peyvên ji du yan zêdetir peyvên serbixwe pêkhatî de mesele wek peyvên li pey hev e. Anku erê mirov di axiftina bilez de dibêje "peskovî/peskûvî" lê di axiftina hêdî û di nivîsînê de rehên peyvên tên parastin anku mirov dibêje û dinivîse "pezkovî/pezkûvî".

Zimanên din jî di vê meselê de wek kurdî dikin. Bo nimûne, T-ya bêlerz di peyva inglîzî "football" di axiftina bilez de wek D-ya bilerz tê gotin ji ber ku B-ya pey wê bilerz e. Lê di axiftina hêdî û di nivîsînê



de T tê parastin. Heman peyvê bi awayê "futbol" di kurmancî de cihê xwe girtiye tevî ku di axiftina bilez de di devê xelkê de wek "fudbol" tê gotin jî. Lê kurdî T di nivîsînê de parastiye.

### Nivîsîna peyvên bipaşgir

Ji bilî peyvên xwerû, peyvên pêkve û peyvên li pey hev, di kurdî de gelek peyv hene ku ji yek yan çend peyvên xwerû û yek yan çend paşgirên rêzimanî (paşpirtik, paşbendik, sufîks) pêk hatine. Bo nimûne, ev in jin peyvên wisan in: "dezigir, dezgeh, desmal, des(t)pêk". Ew hemû ji peyva xwerû "dest" pêk hatine lê T jê ketiye daku koma konsonantan bêt sivikkirin. Lê herwiha, wek ku li jor hatiye behskirin, di hin ji wan de ji ber G-ya bilerz S-ya bêlerz jî bûye Z-ya bilerz.

Di mijara peyvên wiha de rêbazeke mitleq ya bijartî nîne. Hin peyv ji mêj ve hene, di gel de bi awayê di bin tesîra lertzê de guherandî cihê xwe girtine û wisa ji devê xelkê derbazî zimanê nivîskî bûne. Heta têtîliya wan ya bi peyva xwerû ya bingehîn ve jî sist bûye yan qet nemaye. Bo nimûne, peyva "dezgeh" bi çend wateyan e ku yek jê "stand, mase, mêze, dikana li ser textekî" dide ku têtîliya wan bi peyva "dest" re yan nîne, nemaye yan jî gelek sist e. Mirov dikare heman tiştê bo peyva "dezigir, dezgirtî" (yar, keça nîşanîkirî) bibêje ku têtîliya wê bi "dest-girtin"ê ve sist bûye<sup>53</sup>. Wisa

Di peyvên wisa de, ku di nav gel de ji mêj ve hebûne û bi awayê xwe yê devkî derbazî zimanê nivîskî bûne, çêtir e ku wisa bimîne, anku wek "dezgeh, dezgir, dezgirtî". Wisa mirov dikare peyvên "dezigir, dezgirtî" yên bi maneya xwe ya taybet (yar, keça nîşanîkirî) ji peyvên "destgir, destgirtî" yên bi wateya konkret (yên ku destan digirin yan destên wan hatine girtin) jî cuda bike.

Lê di peyvên di zimanê nivîskî de çêkirî yan bi rêya zimanê belavbûyî de, baştir e ku rehê peyvên bèn parastin.

---

Li hin deveran, ihtimalen bo rêgirtina li ber têtîliya S-ya bêlerz ya di eslê peyvê de û G-ya bilerz ya paşgirê, ev peyv<sup>53</sup> bi metatezê anku bi veguhastina cihê dangan di peyvê de bûye "dergisti".

## Background information on Kurmanji and Kurdish

*Mehmet Şerif Derince & Ergin Opengin*

### 1. Introduction to Kurmanji Kurdish

Kurdish is the name given to a bundle of closely-related languages and dialects, all belonging to the Iranian branch of the Indo-European language family. Thus Kurdish is distantly related to Swedish, English, French or Spanish, because these are also members of the Indo-European language family. The most important division within Kurdish itself lies between the Northern Group, generally called Kurmanji (or Kurmanci) Kurdish, and the Central Group, generally called Sorani. This course aims solely at teaching Kurmanji Kurdish, but we will have a little more to say on the other varieties of Kurdish below.

Kurmanji is spoken by the majority of Kurds; estimates of the number of speakers vary from 10 to 20 million (reliable figures are not available; much depends on how one defines a Kurdish 'speaker'). Kurmanji speakers have traditionally inhabited most of east and southeastern Turkey, around Lake Urumiye in Iran, in Syria, and in north Iraq around the towns of Dohuk, Amediye and Zakho. There is also a sizable Kurmanji speech community in Arbil (North Iraq). A number of isolated pockets of speakers are also found in Azerbaijan and the ex-Soviet republics of the Caucasus, and in Khorasan province of east Iran. These communities are the remnants of mostly forced re-settlements that occurred over the last centuries. We must also mention the extremely large groups of Kurmanji speakers in the larger cities of Turkey, in particular Istanbul with perhaps as many as three million Kurds, but also Adana, Izmir and Mersin. Finally, there is a very large diaspora community in western Europe (at least 600,000), mostly in Germany, Britain and Sweden. Because there is quite a lot of controversy surrounding the terms like 'Kurdish', we will try to clarify some of the issues in the following points.

### **1.1 The language vs. dialect controversy**

One question that is regularly asked is whether Kurdish is one language, with several different dialects, or whether it is best considered a group of distinct languages. There is no straightforward answer to this question, for the simple reason that the terms 'language' and 'dialect' are not clearly defined in linguistics, or indeed in common usage. One widely-quoted definition is that dialects of a single language should be 'mutually intelligible', that is, speakers of one dialect should be able to understand other dialects of the same language. But in practice, this criterion does not really work. For example, Kurmanji-speaking Kurds from north Iraq can usually understand Sorani, because they have been exposed to it through the media, and often directly through contact with Sorani speakers. But Kurmanji speakers from, for example, Erzurum in Turkey, cannot usually understand Sorani when they hear it for the very first time. Nor can Sorani speakers from Iran (for example, around Kermanshah) readily understand Kurmanji speakers from Turkey, unless they have had considerable exposure to it. Thus mutual intelligibility between Kurmanji and Sorani depends heavily on the background of the speakers involved, and therefore varies a great deal from speaker to speaker. A second serious drawback with the criterion of mutual intelligibility is this: What does it mean 'to understand' something? Does it mean to understand every single word, all the fine nuances, or does it mean to understand just enough to have some idea of what a speaker is saying? There is no reliable and generally accepted means of measuring degree of understanding, and no recognized minimum level that mutual intelligibility must reach.

Generally, any Kurd is able to understand at least something spoken in a different variety of Kurdish. But, for example, she will may also be able to understand at least some of what is said in Persian, a language that is closely related to Kurdish. Conversely, many Persian speakers understand quite a lot of what is said in Kurdish. But few people wish to call Persian a dialect of Kurdish, or vice versa. So we must conclude that the criterion of mutual intelligibility does not provide a practicable means of distinguishing between languages and dialects.

The truth is, linguists do not have a simple solution for how to distinguish languages and dialects, and the whole discussion is, from a purely linguistic point of view, really quite pointless. In fact,

the difference between language and dialect is more generally decided on political or historical grounds. Consider, for example, the Germanic languages of Scandinavia: Danish, Swedish and Norwegian. Many Scandinavians readily understand all three, so on purely linguistic grounds one could probably refer to them as three dialects. But few Swedes would be happy to refer to Swedish as a 'dialect of Norwegian'! Another example are the national languages of India and Pakistan, Hindi and Urdu respectively. Before the creation of the state of Pakistan, Hindi and Urdu were considered to be one language. But with the drawing of a national border separating India and Pakistan, they suddenly became two. These examples could be multiplied at will; the point is, decisions on whether a particular form of speech be considered a language, or a dialect of some superordinate language, is more often a matter of politics than linguistics. In the context of Kurdish, these issues are extremely sensitive, due to the repressive policies against Kurdish pursued by many of the nation states where Kurdish is spoken. Because of the often polemic nature of the discussion, and the difficulties with defining terms like 'dialect' and 'language' outlined above, we will avoid a commitment on this issue. Fortunately, for Kurmanji the degree of differences among speakers from the various parts of the Kurmanji speaking area are not that great, so the problems of variation are comparatively small, though we will be discussing them at various points in the lessons.

## **1.2 The peripheral languages: Zazaki etc.**

